dara baxçî	*dara baxça*
gula çêyî	*gula çêya*
saya layikî	*saya layika*

4- Demo ke namêde makekî ra dime pronom bêro

biza mi	*biza ma*
dara to	*dara şima*
dula dê	*saya dîna*
gula daye	

C) Namê nêr û makekî formê zafmariyê de:

bizê[23] *ma*
darê ma
darê dewa
gulê baxça
karê cenika
layikê cîrana
mixê to
sayê çêneka

Formê Namanê ke Eşkera Niyê

A) Namê Nêrî:
1- Demo ke namêde nêrî ra dime
a) rengdar bêro
b)nê namî formê zafmariyê de

a)	b)
darêde huşk	*tenê/tayê darê huşkî*
karêde giran	*tenê/tayê karê giranî*
layikêde baqil	*tenê/tayê layikê baqilî*
mixêde çewt	*tenê/tayê mixê çewtî*

2- Demo ke namêde nêrî ra dime

a) yew namêde nêrî yo bîn o yewmar bêro
b) namê nêrî yê zafmarî bêrê:

a)	b)
darêde mereke	*darêde mereka*
karêde cênike	*karêde cênika*
layikêde cîrane	*layikêde cîrana*
mixêde dîwarî	*mixêde dîwara*

3- Demo ke namêde nêrî ra dime
a) namêde makekî yo yewmar bêro
b) namê makekî yê zafmarî bêrê:

a)	b)
darêde mereke	*darêde mereka*
karêde cênike	*karêde cênika*
layikêde cîrane	*layikêde cîrana*
mixêde wustine	*mixêde wustina*

4- Demo ke namêde nêrî ra dime pronom bêro:

darêde mi	*darêde ma*
karêde to	*karêde şima*
layikêde dê	*layikêde dîna*
layikêde daye	

B- Namê Makekî
1- Demo ke namêde makekî ra dime rengdar bêro:

bizêde kole
darêde derge
gulêde rinde
sayêde sure

2- Demo ke namêde makekî ra dime

a) yew namêde makekî yo bîn o yewmar bêro
b) namê makekî yê zafmarî bêrê:

a)	b)
bizêde cîrane	*bizêde cîrana*
darêde dewe	*darêde dewa*
gulêde cêneke	*gulêde cêneka*
sayêde dare	*sayêde dara*

3- Demo ke namêde makekî ra dime
a) namêde nêrî yo yewmar bêro
b) namê nêriyê zafmarî bêrê:

a)	b)
bizêde şuyanî	*bizêde şuyana*
darêde baxçî	*darêde baxça*

www.arsivakurdi.org

gulêde koyî *gulêde kowa*
sayêde layikî *sayêde layika*

4- Demo ke namêde makekî ra dime pronom bêro:

bizêde mi *bizêde ma*
darêde to *darêde şima*
gulêde dê *sayêde dîna*
gulêde daye

Formê namanê ke eşkera niye de, formê zafmariyê zê formê namanê eşkera wo.

tanê/tayê bizê mi
tanê/tayê gulê mi

Karardena Herfanê Nêmvenga "y" û "w"yî

Namê Nêrî:
1- Namê ke ebi "a"ye bixelesiye, ha ezafe de ha jî halê "rast" de (casus rectus) û halê wontê (casus obliquus) de na "a"ye nêginena waro. Eke herfa "a"ye bêro dawiya nê nama:

ga / gaya biya / gaa biya[24]
moreba / morebaya ra / morebaa ra
zama / zamaya de / zamaa de

2- Eke herfêde bivenga bariyê bêro dawiya nê namî:

f. yewmariyê f. zafmariyê (casus obliquus)
ga / gayî / gayê mi
moreba / morebayî / morebayê ma
zama / zamayî / zamayê ma

3- Eke herfêde bivenga qalinde bêro dawiya nê namî:

ga / gawo xurt / gawu biya
moreba / morebawo tal / morebawu de niyade
va / vawo serdin / zazawu biçarne ra

Namê Makekî:
4- Eke nê namê herfa "a"ye bicêrê:

doşirma / doşirmaya ma / doşirma ma
çila / çilaya to / çila to

5- Eke herfêde bariya bivenge bêro dawiya nê nama:
doşirma / doşirmayê mi / doşirmê mi
çila / çilayê to / çilê to

6- Namê ke ebi "e" xelesînê:
Namê Nêrî:

kilame / kilameyê ma / kilamê ma
cele / celeyê nonî / celê nonî
derze / derzeya biya / derza biya

7- Eke herfêde qalind a bivenge bêro dawiya namî:

kilame / kilamewo barî / kilamo barî
cele / celewo ke / celo ke
derze / derzewo giran / derzo giran

Namê Makekî:

dare / dareya baxçê / dara baxçî
kilame / kilameya mi / kilama mi

1- Namê nêrî yê ke ebi "ê" xelesînê:

çê / çêya ra / çêa ra
çê / çêyê ma / çêyê ma / çêê ma
çêwo girs

2- Namê ke ebi "i" xelesînê zê "e" wê:
3- Namê nêrî yê ke ebi "î" xelesînê:

pî *piyanê şima*
pî *piyê ma*

4- Namê makekî yê ke ebi "î" xelesînê:

kardî *kardiya tuje*
kardî *kardiyê tujî*

5- Namê ke ebi "o" xelesînê:

ko / koya ser ro / koa ser ro
do / doyî
ko / koyê ma / koê ma
do / dowo tirş / doo tirş
ko / kowo berz / koo berz

6- Namê ke ebi "u" xelesînê:

pu *puyê korî*
pu *puyo kor*

7- Namê ke ebi û xelesînê:

rû *rûyê mêrikî*
rû *rûyê mêrika*

Halo Raşt / Casus Rectus

Nomînatîv de namê ke yew dem de nêvurînê, herfe nêcênê; namê dema pêrînê de ze yewbînî manenê:

www.arsivakurdi.org

A) Namê Nêrî:

formê yewmariye	formê zafmariye
astare vecîno	*astarê vecînê*
celeb şono şevîne	*celebî şonê şevîne*
derze girs o	*derzê girs ê*
kulav germin bî	*kulabî germin bî*
layik berbo	*layikî berbê*
mix beno çewt	*mixî benê çewt*
moreba amo	*morebayî amê*
nêrî bî bî qert	*nêrî bî bî qert*
punc beno huşk	*puncî benê huşk*

B- Namê Makekî:

formê yewmariye	formê zafmariye
bize çerena	*bizî çerenê*
çila vêşena	*çilê vêşenê*
doşirma xêle girs a	*doşirmê xêlê girs ê*
kardî zaf biya tuj	*kardî zaf biyê tuj*
locine dû kena	*locinî dû kenê*
patîla êna potene	*patîlê ênê potene*
saye ginena waro	*sayî ginenê waro*
since biya zuya	*sincî biyê zuya*
şewe bena derg	*şewî benê derg*

Halo wonte / Casus obliquus / Demê Nikayî:

A) Namê Nêrî:

formê yewmariye	formê zafmariye
ez astorî vînena	*ez astora vînena*
ti celebî bena	*ti celeba bena*
A derzî kena berz	*wo derza keno berz*
A kulavî şuna	*A kulava şuna*
ma nêrî çîneme	*ma neriya çîneme*
şima mixî kune cî	*şima mixa kune cî*
ê morebayî pers kenê	*ê morebaya pers kenê / ê morebaa pers kenê*
ti nêrî çînena	*ti neriya çînena*
wo niweşî ano	*wo niweşa ano*

B) Namê Makekî:

formê yewmariye	formê zafmariye
ez bize vînena	*ez biza vînena*
ti çila fîna ta	*ti çila fîna ta*
	ti çilaa fîna ta
wo doşirma cîneno ra	*wo doşirma cîneno ra*
	wo doşirmaa cîneno ra
a kardî kena tuj	*a kardiya kena tuj*
ma locinê keme pak	*ma locina keme pak*
şima patîla pocenê	*şima patîla pocenê*
ê since gozenê ra	*ê sinca gozenê ra*

Demê Verî Yê Bînî

A) Namê Nêrî:

formê yewmariye	formê zafmariye
mi astor dî	*mi astorî dî*
tu celeb berd	*tu celebî berdî*
ê derze kerd berz	*ê derzî kerdî berz*
aye kulav şut	*aye kulavî şutî*
ma nêrî çînit	*ma nêrî çînitî*
şima mix kuya dîwar	*şima mixî kuyayî dîwar*
îna moreba pers kerd	*îna morebayî pers kerdî*

B) Namê Makekî:

formê yewmariye	formê zafmariye
mi bize diye	*mi bizî dî*
to çila fîşte ta	*ti çilê fîştî ta*
ê doşirma çînite ra	*ê doşirmê çînitî ra*
aye kardî kerde tuj	*aye kardî kerdî tuj*
ma locine kerde pak	*ma locinî kerdî pak*
şima patîla pote	*şima patîlê potî*
îna since goşte ra	*îna sincî goştî ra*

Namê formê rengdayene:
Namê nêrî yê yewmarî:

kalo	*xorto*

Namê makekî yê yewmarî:

rindê	*wayê*

Namê nêr û makêkî yê zafmarî:

gelê kala	*gelê xorta*
gelê rinda	*gelê waya*

Cêrenot

(1) Zazakî de xêlê namê nêri wonte ênê vaten û gor diyena mi zaf caya de harfa'e'ya ke dawiya namê nêri de ra, nişanê wontena namî ya.

bare	*no bar o.*
boxe	*no box o.*
cele	*yo cel o.*
derze	*ano derz o.*
gale	*no gal o.*
kilame	*no kilam o.*

(2) Tayê caya de hurêndiya na "e"ye (formê zafmariyê de herfa namanê nêrî yê ke ebi "e" xelesinê) de "i" ênо vaten û nivisnayene.

www.arsivakurdi.org

hurêndiya *boxe*	*boxi*
hurêndiya *cele*	*celi*
hurêndiya *derze*	*derzi*
hurêndiya *kilame*	*kilami*

(3) Tayê cayanê ke tede zazaki êno qesekerdene, hurendiya nê "i" de, vengêde miyanê "i" û "y"e êno vatene û xêlê niviskar jî nê vengi ebi herfa "y"e nivisnenê.

No derheq de huna zelaliye çîna. Ez bawer kena, ganî ser ro xebat bêro kerdene.

(4) Kurmanci û Sorani de namê "casus rectusî" formê zafmariyê de herfêde bîne nêcênê. Yewmarî û zafmariye, mana lêkeri ra êna famkerdene.

astor çereno/hesp diçere / astorî çerenê/hesp diçerin
mordem weno/mirov dixwe / mordemî wenê/mirov dixwin

(5) Tayê caya de no "î" nêno vatene, teyna herfa "y"e êna vatene.

(6) Beno ke, bingê ziwanî de nê namê "î"yêde bine bicêrê û herfade nêmvenge bêro miyanê nê hurdmîn "î"ya.

bûrî	*bûriyî*
çî	*çiyî*
nêrî	*nêriyî*
pî	*piyî*

La belê, nê namê ewro ne niya ênê vatene, ne jî qesekerdene.

(7) Tayê caya de herfa "e"ye (nîşanê makekiyê) nêna vatene.

(8) Waxto ke "î" û "e"ye bêrê têlewê, herfa nêmvengê "y"e êna werte nê hurdmîn herfanê bivengêna. Îta fonksiyonê "y"e çîno. "e"ya nîşana makekiye formê zafmariyê de ginena waro û namê herfa "î"ye cêno. Serbeta ke îta dawiya namî de yew "î"ye esta, namê "î"yêde bîne nêcêno. Yan jî mi se ke cor (5) va, bingê ziwanî de "î"yêde bîn (teba herfa nêmvengê "y"e êno dawiya namî.

(9) Sebeta ke nê namê ebi herfanê bivenga -a(ye), -e(ye), -o(ye)... ûêb. xelesînê, herfa "e"ye (nîşanê makekiyê), ebi herfa nêmvengê "y"e nêna dawiya nama.

(10) Sebeta ke namêde herfa "i"ye çîna, îta waroginayena "e"ye ra dime, herfa "i"ye ya formê zafmariyê êna dawiya namî.

(11) N. = name; n = nêr; h = herfê; f = form; m = makek

(12) Naca kamcî herfa bêvenge bena va bibo, namê formê zafmariyê de herfa "î"ye cêno. La belê gere mordem xo vîra nêkero ke, namê makekî herfa "e"ye, nîşanê makekiyê cenê.

(13) Namê makekiyê ke ebi herfanê bivengêna "e, o, û, u" xelesînê, herfa nîşanê makekiyê "(y)e" cenê. Formê zafmariyê de "y"e bena "yî".

(14) Nê namê, Kurmancî de hem nêr û hem jî makek ze yewbînî ye. Mordem cisnê nê nama wontena dîna ra vecêno. No tayê cayanê ke tede zazakî êno qesekerdene, ze Kurmancî yo. Cisnê tayê nama jî ebi namanê nêr û makek (mê) êno kifş kerden:

her = (hero nêrî), hera makeke
heş = heşa makeke

(15) Namê tayê dawariyê nêr û makekî ze yewbînî niyo, nê Kurmancî de tayîna zêde wê.

(16) Nê namê teyna yewmar ê. Mana çiya tayîna kenê pê. Kemer-kûç vareno.

(17) Tayê kesî hurêndiya herfa nîşanê cisnê "e"ye de "i" nivisnenê. Yanê gor dîna herfa nîşanê makekiyê herfa "i"ye. La belê gor baweriya mi "e"ye rast a.

başi, bomi, gêji, guli, kemeri, rindi, şevi ûêb.

(18) Tayê cayanê ke tede zazakî êno qesekerdene, rengdar hurêndiya "tiyê" de teyna ebi "iyê" êno name kerdene.

(19) Lêkerê ke ebi "iş" û "îş" xelesînê, makek niyê; nêrî yê. La belê gor baweriya mi nê pirtikî ebi "iş" û "îş" rast niyê. Derheqê nîna de dolimê de bîne nivisnene.

(20) Ez îta wazena çiyê vacê. Xêlê nasê mi waxto ke welat ra newe amêybî, ma gêganê yewbînî re telefon kerdenê. Dawiyê de nîna mi ra pers kerdenê, vatenê "vatenade to esta?" Dem derbas bî, waxt vêrd ra, nê nasanê mi dest bi ci mi ra hurêndiya "vatenade to esta?" de "vatişê to estê?" va. Yanê vatena welatî îta biye vatiş/vatîş. No hal xêlê interesant o, ganî mordem ser ro bifikiro.

(21) Tayê caya de hurêndiya na "e"ye de "ey" êno vatene.

darey bonî	*darey bona*
karey mêrikî	*karey mêrika*

(22) Zef caya de herfa "n"a ke formê zafmariyê de êna dawiya persa, gina waro. Herçiqas ke no "n" gino waro jî, ganê bêro cayê xo. Rastiya xo jî na wa.

darê bonan
karê mêrikan
karê cêniyan
mixê dîwaran

Tenê caya de jî, hurêndiya herfa "a"ye de herfa "o"ye "u" an jî "û"ye êna vatene.

darê bono/bonu/bonû	*mixê dîwaro/dîwarû*
karê mêriko/mêriku	*vergê kowo/kowu/kowû*

(23) Îta jî herfa "n"ya ke formê zafmariyê de êna dawiya persê, gelê caya gina waro, rastiya xo ebi herfa "n" ya.

bizên ma
darên dewan
gulên baxçan
karên cenikan
layikên cîranan
mixên to
sayên çênekan

(24) Qesekerdena rojaniyê de nê namê niya êne vatene. Mana nê di herfa îta awa ke, nê herfê dergî ênê vatene. No nêno a mana ke, niviskar Kurdî de herfanê bivenga piya/têlewe de binivisno.

3 BIRÎNA DILÊ MIN

ŞERVAN

Min li hundirê şikeftê nêrî ku mezel bi mezel e. Min fêm kir ku vira ji wextê filehan maye. Bavê min digot, dema musulman hatin û fermana fillehan rakirin û hemû dan ber şûra, hinek daketin newala Hespistê û di bin erdê de teht kolan û ji xwe re xaniyên dizî çêkirin. Ji ber ku newal hemû kevande bû, leşkerên musulmanan, bi hespan nikaribûn daketana binê newalê. Filehan bi salan xwe di wir de veşartin ku mirov zanibiwa ew cih li kuderê ne me dê pêş hevalan bikrana ku xwe tê de veşêrin.

Ez qederê du saetan li cem hevalan mam. Hevalên qîz tev li dora min kom bûn û ji min re behsa jiyana gerillatiyê kirin. Dema min pirs kir, min got, "qey hûn jî weke min û Zero dil ketiyên hevdû ne ji ber wê hûn bi hevdû re digerin?" Hevalên keçik tev bi min keniyan û gotin: em ne dilketiyê hevdû, lê em hemû dil ketiyên welatê xwe ne. Em bi hev re ji xwişk û biran nêzîktir in. Rast e, em hevdû pirr hez dikin û pirr hurmeta me ji hev re heye. Lê heta em welatê xwe ji bin destê dijmin dernexînin, me evîna dilan û zewac li xwe heram kiriye."

Ez careke din li ber xwe ketim û min serê xwe da ber xwe. Wê demê hevalekî qîz serê min rakir û got, "heval, fedî meke. Em jî dema li mala bavê xwe bûn, weke te bûn. Me tiştek nizanibû. Me li dayika xwe dinêrî û digot, qey jin ji bo zewacê ne û ji bo zilaman nin ku bêhna xwe li wana vekin. Lê bi naskirina hevalan me fêm kir, ku jin jî, weke mêran karin ji bo welatê xwe kar û şer bikin. Ji bo vê, me evîna dilê xwe temirand û evîna welatê xwe geş kir."

Dema ku min xatir ji wana xwest, Zero bi min re derket derve û got, "cihê ku em lê dimînin, divê tu kes nebîne. Ji bo vê yekê divê em ji vira herin. Ji xwe van rojan



em dikin biçin çiyayên Botan, hêla zozanan. Dibe ku careke din em hevdû nebînin û dibe ku em hevdû bibînin. Divê tu zanibî ku min jî, ji te gelekî hez kir û evîna te agir berda dilê min . Lê heta ku welatê me binyika min bi min ket, qeremê wê şikestin û got, "lawo te xêr e, xwîn li wechê te nemaye, qey tu nexweş î?"

Min jê re tu tişt negot. Ez ketim nava livînan û bi dizî min hêsrên çavan barandin. Ez nema zanim bê li

min çawa bû sibê. Bi derketina tavê re, min dewar dan pêşiya xwe û ez bi çolê ketim. Ez hatim newalê cihê ku min hevalan lê dîtine, ji bo ku ez dîsa wana û Zeroyê xwe bibînim. Ez li ser tehtê dîsa rûniştim û min sitrana Zero got. Dîsa kes derneket. Ez rabûm li zinêr zivirîm û min xwe bera şikeftê da. Lê min dît ku hundirê wê vala ye. Di cih de xwîna min miçiqî. Min got hevalan ji rûyê min cihê xwe terk kirine. Ez li cihê wan rûniştim û min yek bi yek heval tev anîn ber çavên xwe. Ji nişke ve min dît ku teqînek hat guhê min. Ez ji xeyalan veciniqîm û bi lez derketim derve. Min dît ku ji binê newalê dengê fişengan tê. Tirs kete dilê min, min hişê xwe winda kir û xwe rast berda binê newalê. Her ku min nêzîkayî li deng dikir, deng bilindtir û geştir dibû. Dema ez gihîştim binê newalê, min dît ku kêleka çemî tijî leşkerên dijmin in. Dema ku ez dîtim, yekî ji wana bazda û ber bi min ve hat. Bi Tirkî axavt, lê dît ku ez fêm nakim, qulipand Kurdî û got, "tu li vira çi dikî?" Min got, "ez hatime ber dewaran." Got, "kanî dewarên te?" Min destê xwe bi jor ve kir û got, "li binya pêtî ne, min dengê fişengan bihîst, min xwe bera xwarê da. Min got gelo çi diqewime ez binêrim." Min dît leşkerê Tirk bi çepilê min girt û got, "were ezê te bibim cem qomutanê xwe?" Min çiqasî got ez nayêm, min bi pey xwe re kişkişand û bir nava leşkeran. Zilamê ku jê re digotin 'qomutan', çend pirs ji min kir û ew leşkerê ku Kurmancî zanibû, pirsên wî wergerandin Kurdî û bersivên min qulpandin Tirkî. Qomutan digot, "tu cihê terorîstan nas dikî? Tu ji wan re xwarinê dibî? Qey tu hatî wan bibînî?" Min ji van bersivan teva re got "na". Bi rastî jî, min navê terorîstan hîn nû dibihîst. Lê min ji xwe re digot, li gor ku terorîst li dijî leşkerên Tirkan in û leşkerên Tirkan weha ji wan aciz in, ew jî weke hevalan dost in. Piştre qomutanê wan got, 'me çar terorîst di şikeftekê de zept kirine û em bi wan re şer dikin, te divê li vira bimîne û laşê wan ê mirî bi çavên xwe bibîne'. Min got, "ez terorîstan nas nakim û dixwazim biçim ber dewarên xwe". Piştre leşkerê ku bi Kurdî dizanibû got, "qomutan dibêje 'pê re here ku bi rastî dewarên wê li wir bin wê berde, ya na, wê dîsa bîne vir'". Min qebûl kir û em bi jor ketin. Dema ku leşkerê Tirk dît ku dewarên min li wir in, got, "baweriya min li te rûnişt, lê heta ez te maç nekim, ez ji qomutan re nabêjim dewarê wê li vira bûn. Wê demê qomutan dê te bibe zindanê û li te bixe". Leşkerê Tirk ber bi min ve hat ku dest bavêje min. Min ji ber bazda. Min dît ku wê bighê min û çavên wî li xerabiyê ye. Min rahişt kevirekî û min got, "ku tu ber bi min de bê, ezê li te xim." Wî jî tifinga xwe ji milê xwe vekir û got: "Tu kevir navêjî erdê, ezê te bikujim, ezê bêjim ji ber min reviya."

Min got: "Tu ji bavê xwe bê minnet î. Tu min bikujî ezê bi şerefa xwe bimrim, ez kengî xwe dixim nav destên bênamûsê wekî te", û min devê xwe tijî tif kir û avêt ser çavên wî. Min wisa bi hêrs tif kiribû, ew tif hemû çû li nava rûyê wî belav bû. Lê wek ku ne xema wî bû. Tif ji ser rûyê xwe paqij kir û weke keran keniya, got, "ez qurbana tifa te bim"; êdî hişê min ji serê min çû û min kevirê di destê xwe de heta ji min hat rakir jor û avêt serê wî. Leşkerê Tirk ewqasî ji ser xwe çûbû, bawer nedikir ku ezê kevir bavêjimê. Çawa kevir ji destê min derket, li nîvê serê wî ket û borînî jê hat û min dît hew xwe li ser tehtê girt û gindirî xwarê. Bi ketina wî re ber (kevir) jî pê re gindirîn û ji bo ku newal kevande bû ez dibêm heta binê newalê gindirî. Lê ez li hêviyê nemam, min dewarên xwe li vir hiştin û bi bazdan riya malê girt. Heta ez gihiştim malê, ji xwêhdanê ez bûm weke çiravê. Dema gundiyan dît ku ez bi bazdan têm, pey min ve hatin û pirsîn bê çi qewimiye. Min ji wan re çîroka xwe got. Dema ku gundiyan bihîstin leşkerên Tirkan li wir in, kesî cesaret nekir ku biçin dewaran bînin. Lê piştre xortên gund yên heval xwe dan hevdû û gotin, "emê biçin ji dûr ve binêrin ku li ber dewaran leşker tunebin, emê dewaran bidin ber xwe û bînin".

Em li derxaneya gund rûniştin û li hêviya vegera xortan man. Hîn nebibû êvar, xortên ku bi dewaran vegeriyan û xeber anîn ku şer rawestiyaye.

Adinî rojê (dorarojê) bavê min nehişt ku ez dewaran bibim çolê an ez ji malê derkevim. Tirs ketibû dilên gundiyan. Digotin, "te serê leşkerê wan şikandiye, wê bên gund fermana me rakin". Lê em heta êvarî man, tu kesî negirt ser gund. Nîvê şevê bi lêdana deriyê me, em ji xewê veciniqîn. Diya min got, "Wele mala me xera bû. Min negot, wê dijmin bigre ser me". Bi tirs rabû û pirs kir. Dema yên li derî dan gotin, "em heval in", wek ku tu zerikek ava hênik berdî nava dilê me, em wisa dilşad bûn. Ez berî dayika xwe ji nav livînan firiyam û min derî vekir. Min dît ku vaye birek heval li ber derî ne. Me ew derbasî hundir kirin û çira pêxist. Gelek ji wan hevalên ku min ew di şikeftê de dîtibûn û hevalên qîz jî tev bi wan re bûn. Me kir û nekir rûneniştin. Hevalek qîz ez birim hêwanê û ji min re weha got: "Tu zanî ku dema em ketin ser vê rêkê, me her tişt dabû ber çavê xwe û di vê rêkê de şehîdbûn ji me tevan re şerefek pir mezin û serbilindiyek e."

Min got, erê, ez wana dizanim.

Hevalê qîz got: "Me mêrxasiya te ya îro li hember leşkerê Tirk, bihîst. Îro em bi dijmin re ketibûn şer. Ji bo ku ji te bêtir kesî me li newalê nedîtibû, me got qey te dijmin aniye newalê, lê dema em hatin û mę ji gundiyan pirs kir, tiştên bi serê te de hatine û te çawa leşkerê Tirkan ji kevandê bi beran (kevir) gêr kiriye, ji me re gotin û em bi te serbilind bûn û baweriya me rûniştku te giliya me nekiriye."

Min got, "heval, tu çawa van tiştan dibêjî? Ma mirov giliya hevalên

xwe li ber dijmin dike?" Û piştre min serê xwe rakir û peyva ku di şikeftê de ji min re gotibû, min lê vegerand û min got: "Tê bîra te, te di-



got me evîna dilê xwe temirand û evîna welatê xwe geş kir. Ez jî dibêjim, ez giliya evîna xwe dikim, lê giliya hevalên xwe nakim."

Dema min wisa got, hevala qîz ez himbêz kirim û rûyê min maç kir. Min dît ku ji çavên wê hêsir tê. Ji min re got, ezê xeberekî bidim te, lê divê tu dilqewîn bî. Û piştre got: "Bila serê te sax be. Di şerê îroyîn, de me hevalê te Zero di riya welat de şehîd da. Bi rastî pirr bi egîdî û mêrxasî şer kir. Xwe ji hevalan re canfeda kir. Xwe gorî hevalan kir, yana (nexwe) xelasiya me tunebû..."

Gotinên wê êdî hew digihîştin guhê min. Min nizanibû bê ez çi bikim û min bawerî nedianî ku Zero-

yê min î weke tayek rihanê bi gulleyên dijmin bimire. Ez hêdî ji nava destê wê herikîm erdê û wisa bêhiş rûniştim. Ew jî, bi min re rûnişt û got: "Heval, şehîdbûn li ser rêka me teva ye. Bê candayîn welat rizgar nabe. Divê tu jî qewîn bî. Tu wisa bi grîn û nalîn bî, wê kêfa dijminan bê."

Lê çi digot, deng nedikete serê min. Ez ji ser hişê xwe çûbûm û lal û ker mabûm. Nema tê hişê min, bê ez çawa rakirim, çawa birim nava livînan û çawa ji mal derketin û çûn. Cîran tev li ser serê me kom bûn. Tu kesî nizanibû ku evîna dilê min ne ji min re, lê ji xaka welat re bûye evîndar...

Ez çend rojan weha di nava livînan de mam. Dayika min roj bi roj dihat ber serê min û digot: "Qîza min, çi hewala te ye? Tu roj bi roj dihelî. Welle derdekî te heye." Lê zimanê min nedigeriya ku ez derdê xwe jê re bêjim. Agirek ji yê evîna Zero şewattir ketibû nava min. Ew leşkerên ku min li binê newalê dîtin dihatin ber çavê min û ez hêrs dibûm, diranên min diqirçinîn û xerez û kîna dilê min bilind dibû. Dawî min sûnd li xwe da ku ez tola (heyfa) şehîdê xwe li cem dijmin nehêlim.

Roja sisêyan an çaran bû ez ji nava livînan derketim. Heta wê demê xwarin di qirka min re neçûbû xwarê. Dema ez ji nava livînan rabûm, kêfa dê û bavê min hat. Dayika min rabû, ji min re xwarin çêkir, çû avê germ bike ku ez serê xwe bişom. Min hinek xurek xwar û ji bavê xwe re got: "Yabo ev çend roj in ez di nava livînan de me, ez qerimî me. Ezê hebekî derkevim nava gund, bêhna xwe berdim." Bavê min îzna min da û ez derketim nava gund.

Ez rast çûm mala Çeto, ji ber ku Çeto ji kevin de ji hevalan re mîlîstî dikir. Ku heval li wan nêzîka bûna wê xebera wî jê hebiwa. Min ew derxist derve û pirsa hevalan jê kir. Çeto got: "Wele ji dema ku şer derketiye, pêjn ji wan nayê. Ez bawer im derbasî hêla Botanê bûne."

Min ji Çeto peyman (soz) girt ku dema saloxekê ji hevalan bistîne, bigihîne min û bi dilek şikestî ez vegeriyam malê. Lê baweriya min li Çeto rûneniştibû, ji ber ku Çeto tu caran ,heta ji hevalan pirs nekira an hevalan xeber nedanê ji tu kesî re nedigot heval li van deran nin. Min zanibû ku dê here ji wan bipirse û ji min re bêje heval li van derdora ne.

Dema ez gihîştim malê, min dît ku reşayiyek li ber deriyê me ye. Dilê min kire qurpe-qurp û bi lez ez ber bi reşayiyê ve meşiyam. Min dît

ku bavê min e. Dema ku çav li min ket, got: "Ew hevalên cara yekem hatin mala me, dîsa hatine li hundir in." Gava min ew bihîst, ji kêfan hindik mabû ez bifiriyama. Ji ber ku ji wê rojê ve min ew heval nedîtibûn. Ez çûm hundir û min bixêrhatin da hevalan. Dîsa her sê hevalên berê bûn. Dema çav li min ketin, rabûn ser xwe û destê min hejandin, xêrhatina min vegerandin. Bi destê xwe cih li kêleka xwe nîşan dan û xwestin ku ez rûnim. Lê min got: "Na welle, ezê li pêşberî we rûnim ku têr li we binêrim."

Min weke xwe kir û ez li pêşberî hevalan rûniştim. Hevalê ku berê ez ji nav destê dê û bavê min derxistibû, keniya û got: "Tu wer zîq zîq li çavên me dinêrî, em ji te ditirsin." Û hevalên din jî tev bi vê tevzê keniyan. Dayika min ji wan re xwarin anî û ji wan re got ku ev çar roj in ez di nava livînan de bûm. Dema hevalan ev bihîstin awirên xwe tûj kirin û ji dayika min pirsîn, gelo dîsa li min da ne? Şûna dayika xwe min bersiv da û ji roja ew hatine mala me û heta wê şevê çi bi serê min hatibû min hemû ji wan re got. Çîroka min wisa bi wan xweş hat ku her sê heval jî, dev ji xwarina xwe berdan û li min guhdar kirin.

Piştî ku serpêhatina min xelas bû, xwarina xwe bi lez xwarin û gotin: "Li me bû dereng, divê îşev em xwe bighînin gundekî din. Hebekî karê me heye. Emê piştre bên û bi te re biaxivin." Ji ber ku dayika min rûniştibû min cesaret nekir ku ez daxwaza dilê xwe bêjim. Ji ber vê yekê ez bi wan re derketim derve. Dema xatir ji me xwestin û ji dayik û bavê min hebekî dûr ketin, wek ku min tiştek ji bîr kiribe min deng li hevalan kir û bi ber wan ve leziyam. Ez gihîştim wan û bi hevalê piştgîrê xwe re axivîm, min got: "Heval, êdî jiyana malê li min heram bûye, ku hûn, min jî, bi xwe re nebin, ezê xwe bikujim."

Hevalê piştgîrê min destê xwe danî ser milê min û got," Ger tu xwe bikujî dê leşkerekî me kêm bibe û kêfa dijmin bê. Xwe çend rojan ragire, emê piştre bi te re biaxivin." Û li hêviya bersiva min nesekinî, careke din xatir xwest û bi rê ket. Lê bi peyva xwe ya ku got "tu dê leşkerekî me kêm bikî", hêviyekê mezin xist dilê min. Ez pirr kêfxweş bûm û vegeriyam malê.

Ji wê saetê pê de, êdî çavê min li hêviya hevalan ma. Lê xwedê ji berê ve siûd nedabû min. Bextê min wisa reş bû, min xwe li çi bigirta, xwedê ew xera dikir. Pênc an şeş roj derbas nebû ku heval ji mala me çûbûn, dîsa li Newala Hespistê şer derket. Ez êvarê bi lez çûm mala Çeto û min pirsa şer kir. Min dît ku kêf li Çeto nemaye, ku te bi pozê wî bigirta wê ruh ji canê wî derketa. Min dît ji bêrîka xwe parçek kaxez derxist û ji min re xwend, got: "Hevalên ku hatibûn mala we, doh ev kaxez ji min re rêkiribûn ku ez te bibim cem wana, lê îro li cihê wan şer derket û her sê heval şehîd ketin."

Dema min ev xeber bihîst, pêşî min bawer nekir û min bi hêrs destê xwe xist qirika Çeto û min got, "tu derewa dikî. Wê şevê jî te got ez cihê hevalan nizanim û ez çûm malê, min dît ku heval li mala me ne. Tu ji qestî ve wisa dibêjî ku ez dernekevim çiyê."

Çeto destê min ji qirika xwe vekir û bi dengekî kelegirî got: "Xwezî min ji qestî ve bigota. Xwezî ew her sê hevalên delal şehîd neketibana û bila sed şervan li mala xwe bimana."

Min dîsa jê bawer nekir û min got: "ezê sibehê biçim newalê bi çavên xwe binêrim ku te derew kiribe, dema ez derketim çiyê berî dijmin ezê te bikujim", û ez bi lez derketim derve û hatim malê. Min tiştek ji dê û bavê xwe re negot û ez rast ketim nava livînan. Lê heta sibehê xew nekete çavê min û xeyala her sê hevalan ji ber çavê min neçû. Dilekî min digot Çeto rast dibêje û dilekî min digot ew her sê hevalên wek sê kelehan tu caran şehîd nakevin.

Berî sibehê çavê min bê hemdî min çûbûn ser hev. Bi bangkirina dayika min ez rabûm ku xumxuma baranê ye. Bi lez min livîn kom kirin û ez derketim derve. Diya min qîr kir û got: "tu dê di vê baran û şiliyê de biçî kîderê, qey tu dîn bûyî?" Min got: "erê, ez dîn bûme", û ez li wê derê nesekinîm, min berê xwe da newalê û ez meşiyam. Diya min di pey min re derket, lê, kir-nekir ez nesekinîm. Bi dengê wê hinek gundî jî derketin der û li dora wê kom bûn. Ez ji gund dûr ketim, pişt re min dît ku yek li pey min baz dide. Ez lê zivirîm, min dît ku Çeto ye. Dema gihîşte min, qet dengê xwe nekir û ew jî bi min re meşiya. Baran wisa gellek dibariya ku em herdû jî, di nava avê de mabûn, lê dîsa jî xema me ne bû.

Heta em gihîştin serê pêtiyê newalê, em ji hal de ketin. Hingî Çeto nûh axavt û got: "ka em têkevin şikeftekê, hebekî em xwe germ bikin û piştre herin. Bi rastî gellek kêfa min ji Çeto re hatibû ku bi min re bi rê ket û hebekî baweriya min lê rûniştîbû ku di derheqê hevalan de ji min re rast gotibû, lê dîsa jî, min nedixwest ku ez baweriya xwe bi şehîdbûna hevalan bînim. Min bi ya Çeto kir û em ketin şikeftekê. Di hundirê şikeftê de hinek çiloyê pez hebû. Gundiyan havînî birîbûn ku zivistanî bidin pezê xwe. Me katên hişkbûyî jê jêkirin û Çeto bi agirgê (çeqmaqê) xwe yê muxtaran agirek dada. Agirê me zû geş bû û hilm ji cilên me bilind bû. Ez wer bawer dikim ku me xwe germ nekiribaya emê ji serma biqefilîna.

Heta ku me xwe germ kir û cilên me hebekî ziwa bûn, baran jî sekinî, lê bayê kur dest pê kir. Çeto çakêtê xwe ji xwe kir û got: "divê tu li xwe kî". Min kir-nekir bi zorê li min kir û em ji şikeftê derketin. Heta ku em gihîştin binê newalê, bayê kur poz û guhên me ji rûyên me xistin. Em herdû jî ,weke pelên çilo dihejiyan. Lê dema em gihîştin binê newalê, tesîra bayê newalê kêm bû û laşê me hebekî ji recifandinê dûr

ket. Xumxuma çemê Hespistê di felekan re derdiket û pelên avê bilind bibûn, digihîştin nîvê darên bîhan. Ji bo ku baran zêde bariyabû av, wek xwîna sor diherikî.

Cihê ku şer lê derketibû, hebekî li jêrî newalê bû. Heta me xwe gihande wir, em di nava çiravê de man. Ji bo ku newal gelekî teng bû û cih bi cih av bi ser rê ketibû, em pêwist diman ku xwe bidin jor, lê zinarên kevandeyî rê nedidan û wê demê em bi lapûşkan bi zinara ve hildikşiyan û em tev di nava heriyê de diman. Dema ku me nêzîkayî li cihê şerê derketî kir, me dît ku waye sê-çar gundiyên din li wira ne. Dema me gundî dîtin, bêhna me derket.

Me silav li gundiyan kir û em ber bi wan ve çûn. Wan silava me li me vegerandin û gotin: "Ieşkeran gotiye bila kesek nêzîkî vir nebe. Ji şevê din ve em li vir danîne. Wê îro bihatana operasyona xwe berdewam bikrana, lê em jî nizanin bê çima dereng ketin. Dema ku bên, we li vir bibînin, wê bi me re jî û bi were jî bixeyidin."

Bi vê gotina gundiyan em gelekî aciz bûn û Çeto ji wan pirs kir, bê ji kîjan gundî ne. Me dît ku mirovên gundê çeteyan in. Ez pir qehirîm û min got, "ma hûn ji xwe û bavê xwe fedî nakin ku vê sermayê û qilxanê hûn cêrdevanî û nokeriya dijmin dikin. Eyb û şerm e ji we re. Xortên me ji bo we, şehîd dibin, lê hûn di firaxa dijmin de av vedixwin."

Dema min wisa got, yek ji wan hat ber bi min ve û got, "em ji bo zarowên xwe vî karî dikin. Ku ne ji pereyên dewletê be emê çi bixwin? Em tev birçî ne."

Min got, "hûn ji birçîbûnê bimrin, ji nokeriya dijmin çêtir e."

Wî got, "Wele tu rast dibêjî. Pêşî me got qey emê li mala xwe rûnin û meaşê xwe bistînin. Lê piştre me nêrî ku li kî derê şer derdikeve, me dajon ser wan û leşkerê xwe didin paş. Bi rastî em di devê tifingê de ne. Em jî, poşman bûne, lê em carek ketine navê."

Çeto got, "yê ku xwe xistibe navê, dikare xwe ji navê derxe jî. Ku dilê mirov bixwaze, ne xulamtiya neyaran, mirov dijminatiya neyaran dike."



Çeteyan serên xwe, ber xwe de berdan û deng dernexistin. Min pirs kir, bê dema şer li vir bûn an na. Ji wan yê bi emir (tewan) got: "Piştî ku şer dest pê kir, ez gihîştim vira. Şer gellekî dirêj dom kir û ev xwîna ku li derveyî şikeftê tu dibînî tev ya leşkeran e. Tu wer lê nenêre ku hindik e, hemû li ber baranê çû." Min li erdê nêrî ku bi rastî xaka bixwînbûyî ji ya din sor tir dike û wek ku tu çend peza li ser hevdû serjê bikî, wisa xwîn fireh gol bibû û ne li cihekî li sê-çar cihan hebû. Wî axaftina xwe domand û got: "Min hîn mêrxasên wisa nedîtibûn. Sê mirov bûn, lê wek sê artêşan şer dikirin. Ji xwe belkî we hundirê şikeftê dîtibe, hûn dizanin ku sê çar mal in û bi qulan bi hev re tên girêdan. Yek ji wan li malika jêrî bû. Leşkeran digot qey kes li wir tuneye. Xwe didan ber devê malikê û dixwestin gullan berdin yên din. Wê demê wî xortî gellek leşker li wir kuştin. Ji ber ku devê malikê, di bin erdê de ye, leşkeran nas nedikir û nedidît..."

Min baş bala xwe da cihê dibêje û min dît ku bi rastî heta mirov xwe li erdê dirêj neke, devê deriyê şikeftê xuya nake. Li gor dirêjbûna newalê bû malika jorî, lê ji bo şikeft du tebeqe bû, digotin malika jêrî. Min pirs kir ka dijmin çawa ew şehîd xistin. Bersiv dan û gotin, "bi gullan zora gerîllan nebirin û nikaribûn bibrana, ji ber ku kêsa leşkeran li devê şikeftê nedihat û gulleyan kar nedikir. Dema dîtin ku gulle pere nakin û gellek leşker hatin kuştin û hîn jî, wê gellek bên kuştin, xwe dan wî aliyê çemê û ji wir şikeft dan ber roketan (destê xwe ber bi jor vekir û kulekek nîşan da). Di dîwarê şikeftê de bi roketan ev kulek vekirin û bi roketan kuştin..."

Min êdî hew xwe girt. Ez ji cem wana diqetiyam û min baz da hundirê şikeftê. Çeteyan pey min re qîr kirin ku ketina hundir qedexe ye, lê min guh neda wan û ez di devê şikeftê re ketim hundir. Dema çavên min hînî reşayiyê bû, min dît ku qulek ber bi jor ve diçe. Ez di wê qulê re bi jor ketim û min li dora xwe nê-

rî. Binê şikeftê hîn bi xwîn bû. Dilê min hew girt û ez li wir rûniştim. Zilamên li derve jî, pey min re ketibûn hundir. Hatin ku min derxînin, lê Çeto ket pêşiya wan û nehişt. Dema dîtin ku çare tuneye, min dît li hundir geriyan û du parçe hesinê grover anîn şanî min kirin û gotin: " Tu dibînî van? Ev parçeyên roketan in. Gerîllan bi van perçan kuştin. Çavê min negirt ku ez lê û ez ji cihê xwe rabûm û min bi lez xwe bera jêr da û ez bi derve ve reviyam. Ez nizanim bê min çiqasî baz da, lê tê bîra min ku ez li ser zinarekî hilpekiyam û ketim erdê; êdî hişê min ji serê min çûbû. Çeto tê digihê min û min dibe şikeftekê û agirekî dadide, heta ku hişê min tê serê min.

Dema ku hişê min hate serê min, min çavê xwe vekir ku agir geş bûye û Çeto li ber serê min rûniştiye û çavên wî bi kelegirî ne. Min pirs kir ku çi bi min hatiye. Çeto got, "tu ji zinar de ketibû, lê Xwedê te sitirand ku tu negindirî xwarê. Kirasê te di pîjikek tehtê de aliqîbû û tu li wir sekinîbû. Ku tu biketayî xwarê, êdî te bi çavên saxî cihan nedidît..."



Min got, "xwedê ez nekuştim ji bo ku ez tola van şêregîdan hilînim." Min bi destê Çeto girt û ez li ber geriyam û min got, "hevalê Çeto, ez ketime bextê te, zû û ne dereng divê tu min bigihînî hevalan. Av û xwarina malê, êdi li min heram be, heta ku ez tola hevalan ji dijmin ranekim."

Çeto ew hêsrên çavên xwe girtin û soz da ku demeke nêzîk de min bigihîne hevalan. Pirr dilê min rehet bû û ez bi ser hişê xwe ve hatim. Em rabûn ji şikeftê derketin û ber bi gund ve meşiyan.

Dema ku me nêzîkayî li gund kir, me dît ku dengê qar-warekê bilind dibe. Çeto got, "ez ditirsim ku leşkeran girtibe ser gund". Me kir ku em rêka xwe ji ser gund biguherînin, lê hew fersend çêbû û me dît ji nişke ve leşkeran dora me girtin û pirs kirin ku em ji kî derê tên. Çeto bi Tirkî dizanibû û bersiva wan da ku em ji wî gundî ne. Dema ku leşkeran navê gundê çeteyan bihîst, bi hevdû re axaftin û ji me re gotin, divê ku em vegerin gundê xwe û careke din em ber bi van gundan ve neyên, ji ber ku ev gund trorîst in. Me got ser çavan, û em bi lez ji wir dûr ketin. Bi rastî em pirr bi erzanî ji destên leşkeran derketibûn.

Ji aliyekî ve min digot, xwezî em biçûna gund, dibe ku niha îşkenceyê li gundiyan dikin, me dê piştgiriyna wan bikira û ji aliyekî din min digot, hatine pirsyara min dikin, ji bo ku min leşkerê wan birîndar kiriye. Baş bû ku ji qomutanê wan û leşkerê ku min kevir li serê wî da. Bêtir tu leşker ez nas nedikirim. Çeto jî wekê min difikirî û got, "em pirr bi erzanî ji destê dijmin xelas bûn. Bi rastî ku me bigota 'em ji gund in', wê em bigirtana û dibe ku hatibin pirsyara te bikin. Wê demê êdi hew çavê te li hevalan diket."

Em weha dil bi tirs ji wir dûr ketin û me dîsa berê xwe da newalê. Em wê şevê li newala Hespistê, di şikeftekê veşartî de man. Sibehê Çeto got, "em nikarin careke din wek kora herin xwe têxin nava kommiza leşkeran. Tu li vir bimîne, ezê herim binêrim ku gundî an şivan hebin, pirs kim ku dijmin heye yan tuneye."

Min qebûl kir û Çeto çû ku pirsyar bike. Piştî sê an çar saetê din vegeriya. Bi rastî min pirr meraqa wî kiribû û hindik mabû ku ez jî derketama derve. Dema ket hundirê şikeftê, min dît ku xwarin jî bi xwe re aniye. Tûrikê xwarinê li ber min danî û got, "Xwedê kir ku doh me xwe bi hêsanî ji nava lepên dijmin derxist. Ku em têketana nava lepên dijmin, êdî berdan û xelasbûna me tunebû. Leşker li gundê me kon vegirtine û gundî tev hêsîr girtine. Qomutanê wan dibêje heta ku ew qîzika leşkerê me bi keviran kuştiye, teslîm nebe, em ji gund dernakevin û

www.kurdishvanu.org

emê vî gundî bişewitînin. Lê baş e ku gundiyan gotiye em qîzikê nas nakin û ne ji gundê me ye. Lê qomutanê dijmin gotiye, "hûn ev qîzikê vedişêrin, ger hûn ev qîzikê neyinin teslîm nekin, emê we tev bibin siqîyonetimê, ji we re se roj muhlet, hûn ji kîderê tînin bînin." Bavê te xeber rêkeriye gundê Hespistê û gotiye ku hûn Çeto bibînin jê re bêjin bila neyên gund."

Ez çîroka xwe êdî dûvedirêj nakim. Biryara min êdî tam rûniştku jiyana malê nema ji min re dibe. Dema bû êvar, ez û Çeto em derketin derve. Çeto çû li nava zinaran geriya û ji cihê veşartî çekek tevî rextan derxist û em bi rê ketin. Wê şevê heta nîvê şewê em meşiyan. Piştre em gihîştin gundekî. Li gund me pirsyara hevalan kir. Ji ber ku Çeto nas dikirin, cihê hevalan ji me re gotin û em çûn gundekî nêzîkî wir û me dît ku vaye komek heval li wir. Min ew heval tu caran nedîtibûn. Lê dema çav li Çeto ketin, pirr kêfxweş bûn û serekê gerîllan û Çeto hevdû xalî kirin çûn derve. Zêdeyî saetekê li derve bi hev re axaftin. Em jî li hundir bi hev re li ser şerê li newala Hespistê derketî û leşkerê girtiye ser gundê me axaftin. Dema hevalan bihîst ku ez dixwazim derkevim serê çiyê, pirr kêfa wan hat û pirsyar kirin ku ez hevalan nas dikim an na. Ew hevalên şehîdketî û çend hevalên din min anîn ser zimên, lê devê min negeriya ku ez behsa Zeroyê xwe bikim. Dema ku navê Zero hate ser zimanê min, wek ku tu şîşeke sorkirî, di dilê min re bikî wisa nava min êşiya û gotina wê hevalê hate bîra min û min navê Zeroyê xwe ji ser zimanê xwe vegerand hundir û min di dilê xwe de veşart û min qet qala wî nekir. Min ji xwe re got bila ev birînek be û di dilê min de bikewe. Heta ku ez tola her sê hevalên weke şêran ji dijmin nestînim ez birîna xwe der nakim.

Dema ku xwarin amade bû, Çeto û serokê hevalan jî hatin hundir. Min dît ku kêfa Çeto li cî ye. Ji min re got. "êdî ev xwarina min û te ya dawî ye. Piştî vê xwarinê tu jî, ji welatê xwe re dibî şervanek. Bi xêr ku te egîtima xwe dît û tu bi çek û rext bûyî, pişt re ku tu bi van deran ve hatî, tu me ji bîr nekî û riya xwe bi aliyê me ve bixî.

Bi vê xeberê ez wisa dilşad bûm, hêsran xwe berda qiraxê çavên min û hew xwarin di qirika min de çû xwarê. Ji bo qebûlkirina min ya nava ARGKê min gellek spasî ji Çeto û ji hevalan kir. Dema ku em ji malê derketin, Çeto destê min hejand û keleşa xwe ji milê xwe vekir û da min, got, "bila ev yadîgara gundê me be, ji ber ku ji gundê me ev cara yekemîn e ku şervanek derdikeve. Te navê me pak kir û rûyê me li hember Partiyê sipî kir. Serê me bi te pirr serbilind e û divê tu tola şehîdan ji dijmin hildî û weke şêran bî."

Min soz û peyman dayê ku ez gundî, gel û hevalan tu carî fedîkar dernexînim û tola şehîdan li cem dijmin nehêlim. Dema em ji mal derketin, ez jî ketim nava rêza hevalan û me berê xwe da Çemê Mezin. Ezman ji stêrkan diçiriskî û bayekî hênik, wisa xweş û nermîn, hêdî hêdî dihat. Em qederekî mêşiyan, paşî xwehdanek wisa germîn bi laşê min ket û wisa min xwe sivik bihîst ku ez dikaribûm bifiriyama. Her ku em dimeşiyan, min bi xwe fêhm dikir ku ez dikevim nava jiyaneke pirr xweş û azad, ji ber ku ew bayê hênik wek bayê azadiyê bêhnxweş bû û di nav hevalan û di nav min de tu tirsa dijmin nemabû û min digot ku ne leşkerekî dijmin, arteşên dijmin derkevin pêşiya me, em rêka xwe ji ser wan venagerînin û em yekî ji wana sax nahêlin...

Wê şevê me bi kelekan (qayix) Çemê Mezin derbas kir û me xwe dan nava zinarên çiyayekî mezin û bilind. Wê rojê em li wir man. Piştre em bi çiyayên Botanê ketin. Em gihîştin cem hevalan. Heta ku zivistan derbas bû, min li qampê egîtim dît. Min hevaltî nas kir û welatê xwe ji nû ve nas kir.

Niha ev sê sal in ez ji qampê derketime û li herêma Botanê, di nav yekîtiyeke ARGKê de ez şer dikim. Min gellek şer dîtin û ez li gellek deverên Kurdistanê geriyam. Min gellek leşker û çeteyên dijmin bi hevalan re kuştin û min şehîdbûna hevalan jî, gellek caran dît. Lê her roj baweriya min hîn xurttir bû ku em roj bi roj ber bi azadiyê ve dimeşin. Bi rastî, jiyana ku em tê de ne, jiyaneke gellek sipehî ye. Ez bi jiyana xwe ya çûyî poşman bûme û ez dibêjim: xwezî roja ez ji diya xwe de çêbûm, ez li nav hevalan bûma û çek li milê min, min li hember dijmin şer bikira ku ev xaka delal me zû rizgar bikira. Min nizanibû Kurdistan ev qasî mezin, fireh û xweş e.

Bi rastî em çiqasî şer û xebatê bikin, em nikarin deynê Partiyê ku li me ye bidinê, ji ber ku bi Partiyê em ji nû ve bûn mirov û me jiyaneke pirr bi rûmetî nas kir. Gerîllatî tiştekî gellek xweş e û hevaltî jî hîn xweştir e.

Ku hûn pirs bikin, ez hîn venegeriyame gundê xwe. Di nav şer de min fêhm kir ku Kurdistan ne gundê min tenê ye û gelê Kurd jî, ne gundiyên me tenê ne. Ji ber vê yekê, ez li kîderê Kurdistanê bim, ji min re ferq nake û hemû mirovên Kurd dayik û bavikên min in.

Ez dizanim hûn li hêviyê ne ku ez bêjim, bê çi bi birîna dilê min hat. Bi rastî, berê birînek di dilê min de hebû, lê niha bi hezaran birîn di dilê min de hene. Her ku hevalek şehîd dikeve, birînek ji ya yekemîn xeddartir di dilê min de vedibe. Lê min baş fêhm kir ku dermanê hemû birînên dilan, azadkirina gel û derkirina dijmin e. Lê tu bikî-nekî Zero birîna min a yekemîn e û cihê wî heta dawî di dilê min de heye. Û tiştekî din jî, ez ji we re bêjim ku ew çeka Çeto ya hêja ku yadigarê min kiribû, min hîn jî milê xwe nedaniye û heta ku ez sax bim jî, danaynim û ez li ser soz û peymana xwe me, ku heta ruh di laşê min de hebe, ez dê tola şehîdan ji dijmin hilînim û hevalan her dem ser bilind derxînim.

ROMANA KURDÎ
1935 - 1987
ZARAVAYÊ KURMANCIYA JORÎN

AMED

Romana Kurdî gellek paşde maye. Ji ber ku di demeke dirêj de qedexe maye. Tesîra bişavtinê li ser gelê Kurd gellek mezin e, ji bo vê yekê gellek wêjevanên Kurd, ji bo wêjeya gelên serdest xizmet kirine [1].

Ji vê nêrînê, em dikarin bêjin ku rewşa wêjeya Kurdî, weke rewşa gelê Kurd a erdnasî, zimannasî, siyasî û hwd. e.

Vêca, tevî ev mercên (şert) malkambax ku di ser Kurdan re derbas bûne, rengên wêjeyî yên Kurdî, hinek gavên pêşketî avêtine. Di salên 1920'an de, Kurdên Kurdistana Başur hinek mafên xwendin û nivîsandinê bi zimanê Kurdî sitendine. Piştî wê, di destpêka salên 1970'an de, rejîma Iraqê bêgav û bêçare ma û otonomiya Kurdistana Başur qebûl kir.

Çend sal piştî damezirandina dewleta Bolşevîk a li Rûsiyayê, hinek ji Kurdên Sovyetîstanê ku li Gurcistanê û li Ermenistanê rûdiniştin, gihiştine hinek mafên xwe yên çandî. Wekî dinê para pirrtir ku li Azerbaycanê diman, di salên 1930'an de ji hêla Stalîn ve, ber bi komarên Piştqafqaz û Asya Navîn ve hatin koçbar kirin. Romana Kurdî, ji nav Kurdên Sovyetistanê ku em hejmara wan a durist nizanin, derket. Baştir e em gotara ku di *Nûçeyên Mosko,* (hejmar 23, Hezîran 1989), bi sernivîsa "Kurd welatekî dixwazin" de belav bû, bidin nîşandan. Belkî hinekî ronahiyê bide ser rastiya Kurdên Sovêtistanê:

"Çend roj in Kurdên Sovyetistanê, li meydana ku li rûberî redaksiyona me ye, civîn çêdikir. Kurdèn ku hatine Mosko encamên (rêsultat) malkambax ên siyaseta Rusyayê protesto dikin. Gelê Kurd ê ku li ser axa Azerbaycanê, Ermenistanê û Gurcistanê dijiya, di dawiya salên 1930'an de hatin koçbar kirin û li Asya Navîn hatin belavkirin. Îro, zimanê wan û çanda wan li ber xeterê ye ku winda bibe. Nûnerê grupa însiyatîva Kurd, Mamêdov, çûye Kongreya Niwenêrên Gel, da ku Kurdên ku hejmara wan digihêje du milyon [2], erdek ji wan re were dayîn ku tê de bikarin li gor berg û adetên xwe yên netewî bijîn. L. M."

Kurdên li Bakur û Başurê-Rojava, ji hemû mafên xwe yên netewî hatine bêpar kirin. Tenha di heyama manda Frensizî de li Başurê-Rojavayê Kurdistanê (Sûriyê, 1920-1946), di salên 1930 û 1940'an de, du kovar, *Hawar (1932-1943)* û *Ronahî (1943-1945)* û çend pirtûkên din bi Kurdî li Şamê derketin. Ji xwe li Bakur (Tirkiyê) rewş tim mîna xwe ya berê ye. Herçiqas li Rojhilatê Kurdistanê di van salên dawî de, bi Kurdî *(Sirwê)* li Ormiyayê kovarek derdikeve jî, dîsa mirov nikare bêje çanda Kurdî li vir serbest e. Vêca, ev rewş encamine xirab gihandine paşeroja wêjeya Kurdî, bi taybetî ya romana Kurdî. Mijara ku em dixwazin di vê gotarê de bi qasî ku em karin li ser bisekinin, romana Kurdî ye.

Romana Kurdî ya yekê, bi zaravayê Kurmancî bû, di nava Kurdên Ermenistanê de, li nîva salên 1930'an, hate nivîsandin [3]. Nivîskarê wê Erebê Şemo ye. Erebê Şemo, Kurdekî Bolşevîk e. Ew weke bavê romana Kurdî li Kurdistanê tê naskirin. Erebê Şemo ji malbateke Şêxên Ezdî, ji hoza (eşîra) Hesenî ku li navçeya Surmaliyê, li Rewanê rûdiniştî, di sala 1898'an de hate dinê. Navê romana wî ya yekemîn *"Şivanê Kurd"* e [4]. Ev romana wî, gellek caran bi zimanê Rûsî, Ermenî, Azerbaycanî, Tirkî û Frensizî hatiye wergerandin û çap kirin. Çapên ku di destê me de hene, emê di kronolojiyê de binivisînin. Nivîskar, di *"Şivanê Kurd"* de, çêla jînenîgeriya xwe û ceribînên (tecrube) xwe yên têkoşînê di Partiya Bolşevîk de, li di-

www.KurdiaKurdi.org

jî desthilatdariya derebegên Kurd, Partiya Taşnaq a Ermenî û Hukmeta Qeyserî dike. Di romana xwe ya *"Kurdên Elegezê"* de, Erebê Şemo rola xwe, jiyana xwe ya di xeteriyê de nîşan dide. Di *"Şivanê Kurd"* de, ew Erebê Şemo ye. Lê di romana xwe ya diwemîn de, em wî di bin navê "Misto" de dibînin.

Rejîma Stalîn wî di dawiya salên 1930'an de sirgûnê Sibîriya dike û li wir demeke dirêj dimîne. Erebê Şemo dîsa vedigere pênûsa xwe û dest bi nivîsandina romanê dike. Di sala 1958'an de, romana wî ya sêwemîn, *"Berbang,"* ku tê de dîsa jînenîgariya xwe hewal dide, belav bû. Romana çaremîn, *"Jîna Bextewar"*, di sala 1959'an de çap bû. Ev roman gellek dirêj e, li ser êlekî Kurd e; êl ji aliyê desthilatdarên Osmanî de û bi alîkariya derebegên Kurd, tên perçiqandin; êl neçar dibe, di dawiya Cenga Cîhanê ya Yekemîn de, bar dike û berê xwe dide Ermenistan û Gurcistanê. Pey re nivîskar, li ser guhastinên ku di jiyana vê êlê de dibîne, diaxêve. Bi gotineke dinê, Erebê Şemo dixwaze nimûnekê ji Kurdên ku ji aliyê Osmaniyan û Kemalîstan ve ber bi Rûsiyayê ve hatine, nîşan bide.

Romana *"Dimdimê"*, ya Ereb Şemo, romana wî ya çêtirîn, di sala 1966'an de çap bûye. Erebê Şemo naveroka vê romanê ji destana Kurdî ya *"Dimdimê"*, girtiye. Destana *"Dimdimê"* "dabaşa Kela Dimdimê ya di sedsala 16'an de, ku ji aliyê leşkerên Şah Ebasê Sefewî ve tê dorpêç kirin û berxwedana mêranî ya Kurdan û serdarê Kurdan" [5] Xanoyê Çengzêrîn dike. Romana *"Dimdimê"*, bi gelemperî, mercên perçekirina Kurdistanê ya yekemîn li gorî peymana 1639 ku di navbera Şahê Îranê û Sultanê Osmanî de çêbû diyar dike. Weke dinê, nivîskar rexne li derebegên Kurdan yên ku di nav lepên Şahên Îranê û Sultanan de dibûn destik, digire.

Şayanê gotinê ye ku li gorî pirtûka Celîlê Celîl ya bi navê *"Kurdên Ermenîstana Sovêtiyê (Bîbliyografiya (1920-1980))"* helbestvan Nûrî Hîzanî (Hovakîm Markariyan), ji gundê Xakêvêyê, li Ermenistanê, romaneke biçûk bi navê *"Şewqa Sibê"*, di sala 1934'an de belav kir; anku, salek berî romana *"Şivanê Kurd"* ya Erebê Şemo. Ev roman 63 rûpel in. Bi nêrîna me, berhemekî çîrokî ye [6]. Hingî ku em dizanin, Nûrî Hîzanî, karê xwe di warê helbestan de berdewam kir, ne di warê romanan de.

Ji bilî Erebê Şemo, hinek romannivîsên din jî, li Ermenistana Sovêtî diyar bûn, wekî Heciyê Cindî, Eliyê Evdilrehman, Seîdê Îbo û Mîroyê Esed. Li gorî pirtûka bîbliyografî ya jorîn, ku ji bilî vê di destê me de sereçavî nîne. Van romannivîsan pirr kêm roman nivîsîn. Divêt neyê ji bîr kirin ku navên pirr pirtûkan, di vê bîbliyografyayê de cih negirtiye. Mîroyê Esed, serekredaktorê *"Riya Teze"*, ku di sala 1919'an de hatiye dinê, romanek bi navê *"Sîsê"*, di sala 1961'an de belav kir. Di romana xwe de, Mîroyê Esed zarotiya xwe û berberiya du çînan (classe, tebeqe) diyar dike. Gundî û karkerên ku kolxozan ava dikin û diparêzin û derebegên ku dixwazin wan biroxînin (hilweşînin) dike.

Heciyê Cindî, mezintirînê folklorîstê Kurd ê Sovêtî, ku li gundê Ermençayirê, li Qersê, li Bakurê Kurdistanê, ku di sala 1908'an de ji diya xwe bûye, romana xwe ya bi navê *"Hewarî"* nivîsî û di sala 1967'an de belav kir. Ev roman behsa bicihbûna koçerên Kurd ên li bajaran dike. Tê de, romannivîs li ser Kurdên Qersê jî, ku hîngî di nav sînorên împaratoriya Qeyser de bûn û paşê di heyama Cenga Cîhanê ya Yekemîn de ber bi Tirkiyê ve çûn, radiweste.

Eliyê Evdilrehman ê ku em wî romannivîsê diwemîn piştî Erebê Şemo dibînin, di sala 1920'an de hatiye dinê. Romana wî ya yekemîn, *"Gundê Mêrxasan"*, di sala 1968'an de hatiye çap kirin. Nivîskar xwestiye ku bûyerên raperîna (serîhildana) Şêx Seîd (1925) diyar bike, û qetlîamên ku Mustefa Kemal Paşa, li ser Kurdên azadîxwaz kirine, nîşan bide. Ji ber vê sitema hanê, gellek êlên (hoz) Kurdan bêgav man û sînorê derbas kirin û berê xwe dane Kurdistana Rojhilat. Li wir jî, şahê Îranê êrîş bire Rûsiyayê. Eliyê Evdilrehman romaneke din jî nivîsiye. Lê mixabin ew ne ketiye destê me.

Romannivîseke din, Seîdê Îbo ye. Seîdê Îbo, bijîşkê zarokan e. Ew li Rewanê, li gundê Qarxûna Jêrîn (niha Cirarat) di sala 1924'an de, ji diya xwe dibe. Romana wî ya yekemîn *"Kurdê Rêwî"*, di sala 1979'an de çap bû. Ev romaneke jînenîgarî ye. Ew ji sêwîtiya xwe ya neh salî de dest pê dike, derbasî jiyana xwe ya belengazî dibe, ta ku jê re lê tê û dest bi xwendinê dike. Divê em bêjin ku Seîdê Îbo gellek cihekî bilind di civaka Sovêtî de girtiye.

Divê em bibînin ku tevî hejmareke biçûk Kurdên Sovêtî, li gorî 20-25 milyon Kurdên li Başurê Kurdistanê, roleke pirr hêja di pêşxistina wêjeya Kurdî de, bi taybetî di warê Kurdnasiyê de, lîstine. Em dikarin bêjin ku rola wan ji ya Kurdên Kurmancîaxêv ên li her çar perçeyên Kurdistanê, di warê wêjeyî de, bi nîşantir bûye.

Divêt em çend gotinan di derbarê zimanê wan ê nivîsandinê de bêjin. Lê berî wê, çêtir e ku em li ser elfabeya wan rawestin. Di sala 1921'an de, Hagop Gazariyan, endamê Partiya Hincaq a Ermenî, elfabeyek bi tîpên Ermenî, di pirtûkeke xwe de, ku sernivîsa wê *"Şems"* e, li Eçmiyadzînê li Ermenistanê belav kir. Pirr neçû, elfabeyeke din, bi tîpên Latînî, ku ji 37 tîpan pêkdihat, ji aliyê Erebê Şemo û O. Î. Marogulov de (...) di dawiya salên 1920 û di destpêka salên 1930 de hate çap kirin. Paşê, di dawiya salên 1930'an de, ev elfabeya Latînî hate rakirin û li şona wê, elfabeyek bi tîpên Kîrilî ku heta niha bi kar tê, çê kirin" [7].

Divê em rastiyeke din jî bibînin, zimanê Kurdî ku îro li Sovêtîstanê bi kar tê, seranser guhartineke tay-

betî tê de çê bûye. Ji aliyê rêzimanî ve pirr qels e û di bin tesîra zimanên biyaniyan de maye. Sedemên van encamên xirab gellek in. Her wekî Yekîtiya Sovêtî, li gor berjewendên xwe, hebûna gelê Kurd, nemaze li navçeya Laçînê, Kelbajarê û Nexçivanê ku berê koçerên nexwenda bûn, tune kir. Vêca, bi vê yekê, zimanê Kurdî, bere bere pişivî û qels ket. A din jî, di dema Stalîn de Kurd, li Komarên Sovêtî hatin belav kirin. Bi taybetî Kurd, li Turkistan, Kirgîziya û Kezexistanê hatin bicih kirin. Ev Kurdên han, di nav miletên din de pişivîn. Her wekî piraniya Kurdan, li wir negihîştine mafên xwe yên çandinî, hînkirina zimanê Kurdî, di çend dibistanên ku hebûn de tu berhem neda. Tenha yên ku ji berê de ziman dizanibûn, an xwe hîn kiribûn, karibûn zarokên xwe hînê xwendinê bikin û ji lêkolînên Kurdî re amade bikin. Em ji bîr nekin ku ev hindikahiya Kurd, di civaka Sovêtî de nikare xwe ji têkarkirinên çandî û zimanên gelên din ên pirrane, reha bike.

Em vegerine ser romana Kurdî ya li ba Kurdên Bakur û Rojavayê Başurê Kurdistanê. Eger em Kurdên Dimilî jê derxînin, ên din tev, bi zaravayê Kurmanciya Jorîn dipeyivin. Ji xwe Kurdên Rojhilat û Başur bi zaravayê Kurmanciya Jêrîn dinivîsin. Kurmancîaxêv, nekarîn di merc û rewşên weha xirab de meraq û armancên xwe yên wêjeyî geş bikin. Çewsandin û zordariya rejîmên dagîrker, li Kurdistanê li dijî Kurdên azadîxwaz ku doza nasîna zanavê netewî û çandî dikin, neçar hiştin ku ji welatê xwe derkevin, penaberiya Ewrûpa Rojava bikin û li wir diyasporeke girîng çê bikin. Ji nav vê diyaspora hanê em ê bibînin ku hin rewşenbîrên xort wê rabin romanan binivisînin. Şayanê gotinê ye ku ji van 20 milyon Kurmancîaxêvan tenha ev diyaspora dikare serbest bi zimanê dê binivisîne.

Berî ku em li ser romannivîsên ji vê diyasporê derketine bipeyivin, divê em bala xwe bikşînine ser du xalan. Yek, ji van romannivîsên ciwan ku temenê jiyana wan a nivîskariyê deh-panzde sal in, nikarin xwe bigihînine pileya pêşketina hunerî ya Kurdên Sovêtîstanê. Romanên ku hatine nivîsandin mirov wan wekî destpêka romanê dibîne. Ji bo ku em nêrîna xwe bêtir zelal û şirove bikin, divê em çend xalan diyar bikin:

1) Romannivîsên vê diyasporê, bê bingeheke wêjeyî ya Kurdî ne. Kurdiya ku pê diaxivin û pê dinivisînin, Kurdiya ku ji mal û derdorên



xwe hîn bûne ew e. Bi pirranî li derveyî welêt xwe hînî nivîsandina Kurdî kirine.

2) Ew ji çanda xwe ya netewî ya pak hatine bêpar kirin, ketine bin bandûra çandeka pirrnetewî.

3) Kurdiya zaravayê Kurmanciya Jêrîn ku bi elfabeya Erebî tê nivîsandin, ji wan re gelşeke (problem) mezin çê kiriye, ji wan kêm kes dikarin bi tîpên Erebî û bi vî zaravayî bixwînin, ev zaravayê ku niha roleke girîng di warê çanda Kurdî de dilîze.

4) Ji welat dûr ketin, kêmbûna weşanên Kurdî, giranbihabûna çapkirinê, tunebûna bazareke kirrin û firotanê, hwd.

Vêca, ji vê diyaspora ku di dawiya salên 1970'an de li Ewrûpa çê bûye, tenê çend romannivîs jê derketine. Hejmara wan ji tiliyê destekî derbas nabe. A dinê, naveroka romanên wan, bi gelemperî, azmûdeyên wan ên kesane diyar dike. Em navên wan romannivîsan xuya kin: Mehmûd Baksî, Ş. Bekirê Sorekî, Mehmet Uzun û Birîndar.

Birîndar, ji Bakurê Kurdistanê ye û li Almanya dijî, em tiştek li ser jînenîgariya wî nizanin. Romana xwe ya yekêmîn, *"Keça Kurd Xanê"*, di sala 1982'an de belav kir.

"Ev romana ku bêtir dirûvê kurteçîrokek pê dikeve, di nexweşxanê de hatiye nivîsandin. Afirandina pêşîn a vî nivîskarê can e. Qala şerê Xanê, keça axayekî, ji bo rizgariyê dike. Ewê here serê çiyayê Kurdistanê, tevî şerê Pêşmergan bibe" [8]. Romana wî ya diwemîn *"Soro"* ye, di 1983'an de hate belav kirin. *"Xelîl û Xezalê, du gundiyên reben, kurrekî wan heye, navê wî Soro ye. Çeto, dostê wan e, keçeke wî heye, navê wê Leyla ye. Soro û Leyla bi hev re diçine dibistanê. Mamostê wan, Cemîl, Tirkekî pêşverû ye, him dîroka wan, him marksîzm-lenînîzmê, hînê wan dike. Soro weha dibe şoreşger û jiyana xwe terxanî rizgarkirina gelê xwe dike. Hezkirineke pirr germ di navbera Soro û Leylayê de çê dibe"* [9].

Mehmûd Baksî bi zimanê Kurdî, Tirkî û Swêdî dinivîse. Romana xwe ya yekemîn bi navê *"Hêlîn"* bi Swêdî, di sala 1983'an de, belav kir û Kurdiya wê jî di sala 1984'an de hate çap kirin. Ev romaneke jînenîgarî ya nivîskar e, ji zarotî û xortaniya wî

de dest pê dike heta destpêka salên 1970, gava ku ew naçar dibe sînoran derbas dike û diçe Rojavayê Başurê Kurdistanê. Pê re, ji wir diçe Libnanê û paşê penaberiya Siwêdê dike. Romana wî ya diwemîn çap bûye wekî dinê ne ketiye destê me.

Li ser wan herdu nivîskarên dinê, Mehmet Uzun û Ş. Bekir Sorekîî, serçavk di destê me de hene ku em li ser jînenîgariya wan rawestin. Mehmet Uzun li Siwêrekê, ji Bakurê Kurdistanê, di sala 1953'an de hatiye dinê. Xwendina xwe li Amedê qedandiye. Di sala 1972'an de hate girtin û heyşt sal ceza girt. Piştî du salan, ew bi efûya gelemperî di sala 1974'an de hate berdan. Bi hin hevalên xwe re kovara *"Rizgarî"* deranîn; ev bû sedemê girtina wî. Dîsa heşt meh radize. Paşê, ew jî, diçe penaberiya Siwêdê dike. Ji wir pê ve, di kovarên Kurdî de wekî *"Berbang, Rizgariya Kurdistan û Hêvî"* carcarina dixebite. Romana wî ya yekemîn, *Tu,* di sala 1984'an de belav bû. Ev berhema *"çîrokeke dirêj e, bi awayê romana nû hatiye nivîsandin. (...) Di vê romana xwe de, nivîskar bi kesên xeyalî re deng dike"* [10]. Romana wî ya diwemîn, *"Mirina Kalekî Rind"*, di sala 1987'an de, belav bû. Di vê romanê de, nivîskar dixwaze du beran nîşan bide û beramberî hev bike: berê ku di destpêka sedsala XX'an de bûye û berê ku di nîvê sedsala XX'an de bûye. Rastî, nivîskar çêla azmûdeyên xwe yên pirr kesane dike û giraniya xwe bêtir daye ser çêkirina hevokine baş ên bi Kurdî!

Nivîskarê dinê Ş. Bekir Sorekîî, ji Rojavayê Başurê Kurdistanê ye. Di sala 1946'an de hatiye dinyayê. Bekeloriyayê (lise) li Helebê, xwendiye. Piştre, ji welêt derdikeve û çend sal li zanîngeha Viyênayê dixwîne. Ji sala 1968'an ve li Avustraliya dijî. Romana xwe ya yekemîn di sala 1987'an de belav kir. Navê romanê *"Wendabûn"* e. Sernivîsa romanê naveroka wê baş dide xuyan. Ew nimûneyek e, ji nivîşkarên diyaspora Kurdên li Ewrûpa. Niviskar nekariye xwe bi rewşa gelê xwe ve nêzik bike, ji lewre ew diyaspora *"Wendabûnê"* ye. Li şûna wê, nivîskar, çand û kelepûrên gelê dinê dizane û tev tê de bi cih kiriye. Bi gotineke din, ev roman wêneya Kurdekî penaber ku bîriya welatê xwe kiriye, nîşan dide.

Wisa, em dibînin ku cudabûneke fireh û dûr di navbera ronakbîrên diyaspora Kurdên li derveyî welêt û yên li welêt de, çêbûye. Ronakbîr yê derveyî welêt, em bixwazin-nexwazin pirr ji milet dûr e, nikare xwe nêzîkî gelê xwe bike û rewşa gelê xwe di pirtûkên xwe de xuya bike.

Divê em gotina xwe ya dawî li ser zimanê Kurdî ku van nivîskaran di xebatên xwe de bi kar anîne bêjin. Ev nivîskar nekarîne xwe ji bikaranîna zaravên deverîn xelas bikin, ji ber ku zimanê me ta roja îro ne zimanekî standard e. Ji aliyekî din ve, ji zarotî û xortaniya xwe de çanda Kurdî hilnegirtine, hemû di romanên xwe de nimandinên perçeperçeyî dane, destxistinên wan di karên xwe de eşkere diyar e. Bi gotineke dinê, nivîskar rolên sereke dide xwe, carina jî, ew bi xwe di romanê de kesê girîng e. Di derbarê rêzimanê de, ne mîna romannivîsên Kurdên Sovêtî, wan bala xwe pirr daye vî warî. Herwekî me li pêş got ku zimanê me nebûye zimanekî standard, em di xwe de nabînin ku li ser vê xalê an li ser wê xalê, nêrîna xwe bidin, ji lewre heryek ji me nêrînekê wî heye û dibe ku ev ji hev cuda bin.

KRONOLOJIYA ROMANA KURDÎ
(Zaravayê Kurmanciya Jorîn)

Erebê Şemo:

Kurdiskî Pastûx *(bi Rûsî), Lêningrad, weşanên Moloday Grandya, 1931, 64 rûpel.*

Kurdên Elegezê, *Rewan, 1932, 56 rûpel.*

Şivanê Kurd, *Rewan, weş. Dewletê, 1935, 155 r.*

Kurdiskî Pastûx, *Kurdî Elegûza, bi rûsî, (Şivanê Kurd û Kurdên Elegezê), Tiflîs, weş. Haypethrat, 1935, 143 r.*

Berbang, *weş. Heypethrat, Rewan, 1959, 280 r.*

Jîna Bextewar, *bi Ermenî, Rewan, çapa yekêmîn, 1961, 359 r.; çapa dudiyê 1964, 335 r.*

Dorogo Sçosiyo, *bi Rûsî, (Jîna Bextewar) wergerine Rûsî ji aliyê nivîskêr û m. Demikovoy û M. Çaçanovskogo, weş. Sevenskî Pîsatel, Rewan, çapa yekî 1965, 464 r.; çapa dudiyê 1971, 454 r.*

Dimdim, *weş. Heypethrat, Rewan, 1969, 572 r.*

Krêpost Dimdim, *bi Rûsî, (Kela Dimdimê), wergêr: nivîskar û N. Gorskay, weş. Sovêtiskî Pîsatêl, Mosko, 1969, 207 r.*

Kurdiskî Pastûx, *bi Rûsî, wergêr: nivîskar û I. Ostogorskay, weş. Detskay Lîteratûra, Mosko, çapa yekêmîn 1972, çapa diwemîn 1976, 208 r.*

Krêpost Dimdim, *bi Rûsî, (Kela Dimdimê), wergêr: nivîskar û N. Gorskay, weş. Destskay Lîteratûra, Mosko, 1974, 208 r.*

Dimdim, *bi Ermenî, Rewan, 1978, 218 r.*

Dimdim, *bi tîpên Latînî, weş Roja Nû, Stockholm, 1984.*

Dimdim, *bi zaravayê Kurmanciya Jêrîn, wergêr: Şukur Mustefa, weş. Korî Zanyarî Kurd, Bexdad, çapa dudiyê 1984, 316 r.*

Mîroyê Esed:

Sîsê, *weş. Haypethrat, Rewan, 1961, 123 r.*

Heciyê Cindî:

Hewarî, *weş. Hayastan, Rewan, 1967, 385 r.*

Eliyê Evdilrehman:

Gundê Mêrxasan, *weş. Hayastan, Rewan, 1968, 217 r.*

Seîdê Îbo:

Kurdê Rêwî, *weş. Sovêtakan, Rewan, 1979, 190 r.*

Birîndar:

Keça Kurd, Xanê, *wêş. ?, Almanya, 1982.*

Soro, *wêş. ?, Almanya, 1983, 179 r.*

Mehmûd Baksî:

Hêlîn, *wêş. Invandiar örlaget, Siwêd, 1984, 118 r.*

Mehmet Uzun:

Tu, *wêş. Dengê Komal, Siwêd, 1984, 220 r.*

Mirina Kalekî Rind, *wêş. Orfeus, 1987, 135 r.*

Ş. Bekir Soreklî:

Wendabûn, *wês. Verlag für Kultur und Wissenschaft, 1987, 118 r.*

Jêrenot:

(1) Em navê çend nivîskarên Kurd ên ku bi zimanê biyanî berhemên xwe nivîsandine nîşan bidin: Mihemed Elî Kurd; Yaşar Kemal; Mehmûd Teymûr û xûşka wî Ayşê; Selîm Berekat; Ebas Mehmûd el Eqad; Ebdul Basêt Ebdul Semed.

(2) Hejmara du milyon ne rast e. Herwekî Kurd pirr jê hatine pişivandin, em jî nikarin hejmareke rast bidin. Statîstîkên ku hene, tev bi nêzîkayî digihîne 300 000 Kurd.

(3) Vegerine M. J. (Amed). *Vie et oeuvre romanesque de Erebê Şemo* (Jiyan û berhemên Erebê Şemo), D. R. E. A., INALCO, Paris, 1988, 158 r.

(4) Tîpa (ç) ya elfabeya Latînî ya Kurdên Sovêtistanê di salên 1930 de di elfabeya Hawarê de (c) tê lêv kirin. Ji bo nimûne, çan=can, Çemal=Cemal, çûre=cure, hwd.

(5) Joyce Blau, *Studia Kurdica,* Kovara Enstituya Kurdî ya Parîsê, Hej. 1-5, Paris, 1988, r. 162 binêrin.

(6) Di pêşgotina pirtûka *(Hub û Xebar, wêş. Dewletê, Rewan, 1962)* de E. Bekoyêva jî diyar dike ku *Şewqa Sibê* kurteçîrok e.

(7) M. J. (Amed), *Vie et oeuvre romanesque de Erebê Şemo,* (Jiyan û Berhemên Erebê Şebo), D. R. E. A., INALCO, Parîs, r. 4, binêrin.

(8) Joyce Blau, Hêvî, kovara EKP, hej, 3, Parîs, r 88, binêrin.

(9) Joyce Blau, *Studia Kurdica,* Kovara Enstituya Kurdî ya Parîsê, Hej. 1-5, Paris, 1988, r. 162 binêrin.

(10) Serçavka jorîn, rûpel 163.

KIRÎVO

Kirîvo ez nabêjim
Ji te re, ez çi bibêjim?
Gellek tişt hene, gellek û gellek
Lê, çi bikim devê min nagere
Girêdabûn zimanê min kirîvo

Girêdabûn
Bi qeydan
bi lelan
û bi merbendan.

Lê şikandin keç û lawên camêran
Bi hêvî û baweriya xwe.
Rê vekirin kirîvo, rê,
Çirandin tariyan, ronî kirin
Tiştên veşartî û nixamtî.

Baş zanim êdî em namînin tî
Qenc dizanim kirîvo ev meş
Dest pê kiriye ji bo rojên xweş
Di şevên tarî û reş de.
Bizanibe kirîvo, êdî kes
Nikare bibêje ez meşiyabûm
Ser kedxwaran
Bi tilîliyan
Bi halanan.
Lewre îroj herkes dimeşe.
Ew gelê ketandî, yê ku
Hişê wî tê aza kirin,
Bi tilîliyan
Bi keviran
Bi doran
û bi nav têdan
Dimeşe ser wan bêbavan.
Kirîvo, zarok tên kirîvo, zarok
Bi hêvî û ramana pêşerojê ve ku
Tên gihandin,
Li welatê bihar lê hatiye.
Lê, ne bi tenê li çiyayên wî
Li gund û bajarên wî jî,
Ku her yek ji wan
Bi tu rumetek nayê pîvan
Kirîvo nayê pîvan...

Zana Farqînî

www.arsivakurd.org

ZMAN Û RASTNIVİS

F. Huseyn SAGNIÇ

Dı cihanêda çqas zman hene, jı du hêmanan têne hmat (hol) ê: Xezina peyvan û teknıka zmên. Ev her du hêman ji, hevdu temam dıkın û yek bê yeka dın nayê hzırin (melheze krın). Ev her du çawan bê hevdu nabın û bı heve grêdayine, wsan bê rastnıvis (imla) ji nabin û şday bı rastnıvisêve ji grêdayine. Ezê qasek lı ser van rawestım, dahûrınım, ditin û hzrinên xwe jı xwendevanên xwera bınıminım (zahır kım).

Xwendevanên hêja! Divê rasti û çewtiya peyvek jı xezina peyvan, gorê kesek, gundek û herêmek neyê hzırin û rasti û çewtiyên qaydek jı qaydên teknıka zmên ji welêye. Lı ser van dabaşan bı hajdari rawestana her kesek peywıstıye. Zman ne malê kesek, gundek bajarek û herêmeke. Zman malê gel hemiye. Gava lı ser rasti û çewtiyek bête rawestan, dı wê mjarêda, dıvê peyıvina hemi herêman ango ya gel hemi hıldıne ber çavan, paşi bıryar bête dan. Heger wlo neyê krın, dı zanina mında çewtiyê çewtitır dıke. Ev ji ne mafê camêrane. Divê bête zanin ku rasti û çewtiya peyvan û qaydan, ne mina lista rasti û çewtiya pirtûkan be.

Gava peyvek an ji qaydek jı ali herêmekve hate bıkaranin û dı çewtiya wanda xwışiş (teredud) hebıt, dıvê pêşi lı teknıka zmên bête nêrin. Heker vajiyê teknıkê bıt, her kes jêra "ev çewte" dıkare bıbêje. Heker vajiyê teknıki têde nin be, hınga jı bo gotına "ew çewte" bête gotın, an referanduma gel dıvê an ji bıryara aqademiyê. Dıvê em xwe qenc bınasin ku kesek jı me, ne gel hemiye û ne ji aqedemiye. Nexwe destboriya (selahiyeta) me tune ku derbarê çewti û rastiyên peyv û qaydên herêman bıryar bıdin. Qasek hewi (sebır) ji mera dıxwaze.

Dıvê vê yekê ji bızanin ku kesek dıkare karek teni pêkbine. Hê dıkarım bêjım, jı karekra kesek teni hındıke ji. Jı xwiyê cvatên bındestın ku kesek lı gelek karan xweyi derdıkeve û lı krına wan ji dıxebıte. An ji bı finfonekan (palavran) nişa mrovan dıde, hemi karan ji lı nav hev têxe û dıherıfine.

Em ji jı netewê paşvemayi û bındestin. Hemıne xwiyê me ji jı xwiye wane. Lê dıvê em hêdi hêdi xwiyê xwe bıguherinin. Heger ne, em nagıhine tu deverê. Ev krın ji hemıne bı hêsani pêknayê. Lê dıvê rewşenbir jı hêzên xwe zêdetır zor bıdın xwe, heker hındık ji be, pçûk be ji xwiyên xwe bı ali şehrezaya irove bıguherinın. Dı zanin û ditına mında ev gaveki gelek pêşe.

Pışti vê şrovekırına jorin em dıkarin bêne lı ser mjara xwe ya iro jı bo me mebest (mexsed) e.

Lı ser elfaba Kurdi, ango alfaba Celadet Bedırxan gelek munaqêşe hene. Dı hınde deveranda ji jı munaqşê dervazê nvisandınê bûne. Dıvê dı du rewşande lı ser elfabê rawestin: 1 Drûva tipan, 2 Deng.

1 **Drûva Tipan**, zêde nayê munaqêşe krın. Teni muneqêşa "ı, i"yê heye. Bı sedemek ku ez nızanım, mirê mezın mir Celadet Bedırxan lı ser "ı"yê nuqte û lı ser "i"yê ji serpoş daniye. Ango her du tip (ı,i) ji hatıne hêma (işaret) krın. Belkê deqtilo û tipên çapê yên dı destê mir Celadet Bedırxan'da wlo bın. Lê iro çra wlo tê bıkaranin nızanım. Dıvê neyê jı bir krın ku çawan rêzıkên her kari heye, wsan rêzıka elfabeyê ji heye. Ew ji dı vê mjara mede ewe ku du tipên mina hevdu yek jê tête hêma (işaret) krın. Heker sê tipên mina hev hebın dudu jê têne hêma krın. Xwezayi (tabii) dı wê drûvêda du tipên me hene, dıvê yek teni bête hêma krın. Şxwe dı tipên dında (cç, eê, sş, uû) em yeki teni hêma dıkin. Heker dı elfaba Kurdida du tipên mina hevdu hêma bıxwazın, dıvê "c, e, s, u" ji her yek bı ewaki bêne hêma krın. Heker ne, gunehê "ı"yê çıye ku nuqtek datinın ser. Şxwe dı elfaba meda sê dengdêrên kurt hene: "e, ı, u"yın. "e, u" bê hêmayın. Disa çra "ı" jı van her du hevalan hatıye veqetandın nızanım. Dıbe ku dı

hşê hındekanda bı nuqte danina lı ser "ı"yê elfaba Kurdi jı ya Tırki cuda dıke hebıt ji, ev kareki çewtê şaşe û dıvê em xweyiti lı van ditınan nekin. Nexwe lı ser "ı"yê nuqte danin, bê wece (bê fayde)ye.

Dıxwazım qasek ji lı ser "y"yê rawestım. Dı "y"yêda drêjayi heye dıbêjın. Gorê wê ditınê, gava "i" bıkeve pêşi "y"yê, "i" dıbe "ı", "y" drêjaya wê hıldıde lı ser xwe. Bêweku çiya dıbe çıya, giya dıbe gıya, jiyan dıbe jıyan û êd... Heker dı "y"yêda drêji hebıt û tipa drêjê beri xwe kurt bıke û (çawan lı jorin dıxweyê) drêjiya wê hılde ser xwe. Dıvê tipên drêjên dın ji welê bıke. Bêweku çûyin bıbe çuyin, dûyê dûkêşê bıbe duyê dûkêşê, tûya reş bıbe tuya reş û êd... Bı vê ji dıvê raneweste. Dıvê tipên drêjên lı dû xwe ji bıfetiline tipên kurt û drêjaya wan ji hılde lı ser xwe. Bêweku rındayi bıbe rındayı, sorayi bıbe sorayı, şêrinayi bıbe şêrinayı û êd... Heker ev qeyde dızmanê biyaniyanda hebe ji (ez nızanım) dı zmanê Kurdida pêkhatınek welê nine û nabe ji. Tu gavê û bı tu ewayê tipa "y"yê dengdêra beri xwe an ji dû xwe, ne dıkare kurt bıke û ne dıkare drêj bıke. Lı ser tipa "y"yê ez gelek xebıtim. Mın hêç taybetiyek welê têda nedit. Dıbe ku taybetiyek jı tipa "y"yêra dızmanên biyanida hebıt û debe dı hınde zmanên Hind Avropa'da ji hebın. Lê gava dı zmanê Kurdida tunebe, em nıkarin bı destê zorê bêxnê.

İdxalat û ixracata xezina peyvan heye. Lê idxalat û ixracata teknıka zmanan tune. Ew zmanên jı malbateki tên, çqas jı hev dûr ketıbın ji disa hınde qaydên wan yên teknıkiyên zmên, nêzikê hev an ji mina hev hene. Lê ev qayde jı hev ne standıne. Her yek dı bınya xwede tekûs bûne.

Dı vê nuqta lı ser "ı"yê û drêjiya tipa "y"yêda heger razek (srek) hebıt û bı mın ji bı dın zanin gelek dılxweş û bextiyar dıbım. Heger razek welê dı wanda nin be (ku nine, tune) demek zûtır dev jê berdan, mın dılxweş û bextiyar dıke.

Ev her du mjar ji jı teknıka zmênra vaji dıkevın. Bı tu ewayi bê kêmasi lı teknıka zmên nayên.

2 **Deng:** İro dı devê gelê Kurda gelek deng hene. Gelek qenc dızanım ku ev dengên dı devên meda dıxwyên hemi ne dengên me pxwene. Beşek jê yên biyaniyanın. Jı ali her kesêve tê zanin ku netewê Kurd domekek pır drêje ku bındeste û bındestên dewletên mjokerên çlûzın (bexilın). Mjoker ji ne yek teniye. Dı mêjoya kevında ji pır bûn, nha ji gelek mjokerên Kurdan hene. Van mjokeran, çawan dı serê mede tovê neqenciyê û tovê derewan çandıne. Wsan ji her yek jı wan mjokerên stemkar dı devên meda tovên dengên xwe çandıne û rûwıkine ne ji (hêşin ji bûne). Dı devê meda ew dengên biyani û dengên me pxwe, tevlêhev bûne û jı hev veqetandına wan gelek iza û zore. Hnek jı wan dengên biyani, wsan ketıne devê me, ne em dıkarin tam bıkarbinin, ne ji dıkarin şemırinin û bı kotek ji be çare jı wanra nayê ditın. Mina; "hê, eyn, xeyn"a Erebi.

Dı nav dengên meda, hındek ji nivdeng hene. Gelê me, nemaze beşa xortan zêde lı ser van nivdengan radıwestın. Jı wanra pêşniyara (teklifa) çareditınê tının û çareditın jı wan nivdenganra gelek koteke. Belkê ji bê çare bıt. Dı dema mirê mezın mir Celadet Bedirxan'da ji ev dabaş hebû û wi ji ne karibû tu çarek bıbine. Paşi Mir Celadet, bıryara xwe daye ku jı van denganra tip, an ji hêma (işaret) naxwazın. (Ev bıryar dı cidaye).

Ew nivdengên em jê dabaş dıkin evın: Dı navber "b p"yêda mina "p"ya par, payiz, pêr, pêrar û êd... Dı navber "c ç"yêda mina "ç"ya çêlek, çal, çar, çav û êd... Dı navber "d t"yêda mina "t"ya têkda, tiremar, têrijın, têve û êd...

Dıxwazım qasek ji lı ser dengên stûr û zrav rawestım. Lı ser beşek jı dengên stûr û zrav ji gelek minaqêşe hene. Qasi heya nha hati tesbit krın, dı nav dengên meda sê dengên stûr hene. Yek jı wan "s"ye. Mina; "s"ya se, sevi, sebır, selık û êd... Ya dudan "l" ye. Mina; "l"ya palas, fle, paldım, plıng û êd... Ya sisêyan "r"ye. Mina; "r"ya ber (kılim), pır (zehf), per (perê teyran), reş (siyah) û êd...

Mir Celadet Bedirxan lı ser van dengên stûr ji gelek rawestaye û tu peywıstiyek têde ne ditıye ku guhertınek bêxê. Dı van salên paşida, hınde nviskaran, her weki ku rêyek qenc jı dengê "r"ya stûra ditıne. Ew ji, ew "r"yên ku têne dawiya peyvan dubare dıkın. Ango du "r"yan dınıvisın. Mina; berr (kılim), pirr(zehf), porr (pora seriyan), kurr (heriya zêde) û êd... Wan nviskaran hêç hzırina wan "r"yên stûr ku têne serê peyvan ne krıne. Mina "r"ya reben, "r"ya reş, "r"ya raketın û êd.

Rêzımanıvis û elfabenıvisên me Mir Celadet Bedirxan ji dı navda û mın ji, peywıstiya tu rêyê jı wan deng û tipên stûra ne ditiye. Ango deng çı stûr bıt û çı zrav, bı eyni tipê tê nvisandın. Gava deng stûr bıt, stûr û zrav bıt zrev tê xwendın.

Yek ji dubare tip nvisandın, vajiyê teknıka zmanê Kurdiye. Lewra dı zmanê Kurdida dubare ango "şede" tip tune. Gava peyvên bı dubare tip jı zmanên biyani bêne zmanê Kurdi, tipek jê dıkeve. Mina ku Şeddad dıbe Şedad, Ellah dıbe Elah, beqqal dıbe beqal û êd...

Tu gavê Kurd tipa dubare nıkarın bıkarbinın. Tu lı vê sosretê bınêr. Gava peyvên bı dubare tip jı zmanên biyani têne zmanê me, em tipek jê tavêjin paşi dıkarin bıkarbinin û dı peyvên xwe pxweda dubare tip bı kotek ci dıkin.

Hınde dengên dın ji dı devê meda hene. Dı vırda lı ser rawestan naxwaze.

Xwendevanên hêja! Dı van her heft deng û tipanda, tu tengasiyên me dı nvisandın û xwendına wanda tune. Xayet rehet têne nvisandın û xwendın ji. Jı ber vê yekê jı van her heft deng û tipanra, ne tip çêkırın, ne hêma (işaret) krın, ne lı dû "Ç,K,P,T," yê danina tipa "h"û ne ji tipa dubare dıxwaze.

Ew mnaqêşe û tengasiyên dı van derbaranda têne krın û dıxwıyên sûbjektifın. Lewma eyni mrov, gava jı nû dest bı xwendın û nvisandınê dıke, gelek zêde l: ser van dengan radıweste. Her . u çarek jı van deng û tipanra neye ditın zmanê Kurdi ne tê nvisandın û ne ji xwendın. Lê gava qesek nvisi, an ji xwend, êdi zêde lı ser vê dabaşê ranaweste û dema tekûs hinê nvisandın û xwendınê bû, dev jê berdıde.

Baş bal bıdınê dı gelek zmanên biyanida, nemaze dı zmanên Hınd Avropa'da, dı gelek ciyanda nvisandın û xwendın ne mina heve. Minak; "c" tê nvisandın, gorê têgıhê, dı hınde ciyanda bı dengê "k" û dı hınde ciyanda bı dengê "s" û êd. tê xwendın. Ev bûyer "jı wan zmananra taybetiyeke" tê gotın. Maqay ya me ji "pır" bête nvisandın, gorê mjarê "pra" bı têgıha "zehf" û "pra" lı ser avan û rêyan, bête xwendin û zanin, dê çra taybetiya zmanê me nebıt? Şxwe gava "pır mrov hatın" û "lı ser çem pır çêkırın" bête gotın. Tu tengasi û tevlêheviya têgıhê naxwiyê. Disa gava "kew" bête nvisandın, bı hêsani tê zanin ka ew kew "kewa" teyre, an "kewa brinane. Ev ji jı mjar û herıkina hevokê tê zanin. Dema "brinê kew girt" û "tajiyê kew girt" bête gotın, hêç tevlêheviya têgıhê çênabe. Şxwe dı nvisandın û xwendına zmananda graniya têgıh û mjare heye. Lewra dı tu elfabayanda qasi dengan, tip an ji hêma ninın û nabın ji.

Dı derbarê denganda, tip û hêmayên elfaba me tekûse. Hêç zêdekırın naxweze. Şxwe elfaba me, hêmaya (işareta) lı ser tipa "ı" ne têda gorê rêzıka teknıka elfaban hatiye çêkırın. Têra zmanê me dıke û tevdan naxwaze.

Her dem jımala Mir Celadet Bedirxan'ra berêzkarım. Nemaze jı Mir Celadet Bedirxan'ra. Bı rûmet û berêz canê Mir Celadet Bedirxan şad dıkım û, dı kesiya wida malbata Bedirxan'an hemi piroz dıkım.

Dıxwazım qesek ji lı ser hokar (meslek) an rawestım. Tê zanin dı dnêda tu hokar tune ku bê emek, bı tekûs çara hinbûna wi hebıt. Ew ji an dê pxwe xwe bıgıhine ku ev gelek koteke. An ji dê lı nık hostan û dıbıstananda bıgıhin. Ewên pxwe xwe dıgıhinın, hejmarên wan hındıkın, yê dın lı nık hostan an ji dı dbıstananda derdıkevın. Hinbûna hokaran demek drej û emekek gran dıxwaze. Minak; jı bo şagrtek lı nık hosta bıbe terzi, hesınker û xerad (marangoz) bı hındıkayi deh sal emek dıxwaze. Jı bo qutabiyek dı dbıstananda bixwine bıb endazyar, parêzer, rojnamenıvis û bjijk, bı hındıkayi panzdeh bist sal xwendın û emek jêra divê. Divê bête zanin ku hinbûna teknıka zmanek û hinbûna rêzıka tekniki ya elfabayan jı wan zêdetır nebe ji ne kêmtıre. Nexwe jı mera pır xebat dıxwaze. Bımının xweş.

Têbını

Têbını 1. Dı nvisara bêde wê dabaşa rastnıvisê bête domandın.

Têbını 2. Kovara me hejmar 5, rûpel 46, 47 dı nvisara F. Huseyn Sağnıç'da, du çewtiyên çapê hene. Em rast dıkin. Jı xwendevanan bexışandına xwe dıxwazin. 1 Rûpel 46 paragraf 3 rêze 17 dı navber peyva malbat têvelda. Temame. Ango kêmayan dı xweda dıgıre. Hınde zmanzan ji "Banto malbatekê.

2 Rûpel 47, paragraf 9, rêze 15 dı navber peyva gotın hekerda. Angoxwediyê du zaravan dıkarın bı hevra bipeyıvın, hev serwext bıkın, derdên hev hin bıbın û pırtûkên hev bıxwinın. Lê ne tevayi. Ango dı wê hevra peyıvin, hev serwext krın. Derdê hev zanin û pırtûkên hev xwedınêda hındek kêmasiyên ne gring bımının.

Balkêş: Ev beşa rûpel 47 an gelek tip û peyvek çewtbû me hemi guhert.

WELATÊ ME

Welatê me Hêkarî
Ji wira heta Agrî
Agir ser me de barî

Em ji wir werne Gelî
Kuştin bûka rû bi xêlî
Li sungiyan dan zarê çilî

Geliyê Zîla bi gedûk
Tev kuştin zava û bûk
Em kuştin mezin biçûk

Geliyê Zîla bi ribês
Em girêdan bi werîs
Emir da reis, got bira li van xin
milîs

Emê ji wir herne Dêrsimê
Hûn bibhîsin zilma Romê
Laşên me man ber germê

Da ser me êvara sar
Rom bû wekî gurê har
Em temam kuştin bi dar

Li Dêrsimê bû gazî
Em tev kirin rût û tazî
Em kuştin bi darê mazî

Dêrsim ji me gellek dûr
Kula me jî gellek hûr
Em temam kuştin bi şûr

Welatê me ye Qers,
Li me da Romê teres
Got "bikujin Kurdên bê kes"

Welatê me ye Bedlîs
Em tev kuştin Romê pîs
Li Şêx Mehmûd da Înglîs.

Welatê me ye Muş,
Em tev kírne nava pûş
Agir da me "başçavuş."

Kezebkûlê Elcewazî

www.arsivakurd.org

hevpeyvîn

Bi Jan Dost re



Hozanê ciwan, nivîskarê destana nemira **Kela Dimdimê** Jan Dost, di wan rojên borî de hate ser lêdana kovara me. **Kela Dimdimê** dîrok e, nivîsandina vê destanê tişteke hêsan nîne. Ji bo destaneke weha ku mirov kare binivîse, divê berî her tiştî, dîrokê baş zanibe û zimanê Kurdî zanibe bikarbîne.

Jan DOST di peşgotina pirtûka xwe de weha dibêje; "Dîroka gelê Kurdistanê, ji berê ve berxwedan e. Ji Kawayê hesinkar ta bigihêje Kawayê hemdem Mazlum DOĞAN wilo ye. Ji bona ku ez vê rastiyê bidim ber çavan, ez pirr sekinîm, ta ku rojekê çavên min, di pirtûka M.E. Zeki de (Diroka Kurd û Kurdistan) li Kela Dimdimê ket. Min serpêhatiya vê kelê xwend û gelek serbilindî tê de dît.

Destana Kela Dimdimê, rûpeleke ronî ye di nav rûpelên diroka Kurdistanê de ew destana mêrxasiyê, destana berxwedan û serbilindiyê ye. Destana kesên ku serê xwe ji dijmin re danaxin. Û destana kesên eniya wan li rojê ye. Kela Dimdimê, ne bes ku kelehekeke şer kir û çû. Ne bes serkêşiya mîrekî bû û çû. Ne bes mêrxasiya çend sed siwarî bû û çû.

Kela Dimdimê şanî me dide, riya ku divê millete Kurd, seranser bide ser, Riya berxwedan û serfiraziyê ye. Ne riya bindestî û koletiya dijmin e. Kurdistan vaye dîsa ketiye riya berxwedanê, ala berxwedanê bilind û bilind dikin. Ji ber vê milletê Kurd bawer e, wê biser keve û bê guman, wê Kurdistana serbixwe û azad ava bibe."

Jan DOST, pirtûka xwe diyarî Mazlum DOĞAN, şehîdên serxwebûnê, girtiyên azadiyê, pêşmergeyan û hemû welatparêzên Kurdistanê dike. Em jî, vê hevpeyvîna ku me bi Jan DOST re kiriye, diyarî xwendevanên xwe dikin.

REWŞEN: *Tu ji Kurdistana Sûriyê tê, têkoşîna azadî ya li Kurdistana Bakur, bandoreke (tesirek) çawa li ser çanda Kurdên Surî, Iraq û Îranê dihêle, an jî, tu têkoşîna rizgariya neteweyî a li Kurdistana Bakur çawa dibînî?*

J.DOST: Guhertinên mezin çêbûn, partî (PKK) piştî 12'ê Îlonê di cem me re derbaz bû. Ne ji bona revê. Ji bona ku guhertinên mezin di civaka me de çebikin. Bi hatina wan, em hînî gellek tiştan bûn. Me tiştek nizanibû. Şoreşgerên ku me bi çavên biçûk li wan dinêrî, her yek ji wan, wekî çiyayekî, zane, jîr û jêhatî bûn. Li cem me eşirkî hebû, eşîran li hev dixistin, wê partî têkatana navbera wan, ew li hev bianîna. Tiştên ku millet jê hez nedikir, dianîn zimên û li ser disekinîn. Di nava gel de, tevgirêdan çedikirin. Ji alî dinê ve, tona me ji berê ve li ser serxwebûn û azadiyê bû. Milletê Kurd, hingî bindest maye, êş û teede dîtiye, toreya wî tim azadî û serxwebûn xwestiye. Di gel vê rastiyê, yên li ser evîn û dilovaniyê jî, hene. Min bi xwe klasîkî nivîsiye. Ristevanên nû, serbest dinivisînin, ev jî, bi bandora partiyê ye. Mejiyê gelê Kurd ne zelal bû, em diçûn û dihatin, lê me nizanibû em çi dixwazin, mejiyê me bi saya partiyê zelal bû.

REWŞEN: *Li Kurdistana Bakur, pêşengî bi gel re bûye yek. Bi vê rastiyê, rewşenbîrên Kurd jî, hêdî hêdî baweriya wan tê. Di rewşeke weha de rewşenbîr, hunermend, nivîskar û êd. divê bi çi awayî bixebitin?*

J.DOST: Girêdana hunermend û nivîskar, ji xwe bi şoreşê ve girêdayî ye. Mirovê nivîskar ku bi şoreşê re bijî, wê nivîsandinên wî, zêdetir bi millet ve giredayî be, bi rûmettir be û wê êşa millet hîn bêhtir xweşik bîne ziman. Ger êşa millet bêje, wê millet, lê guhdarî bike û millet bi xêra wî gaveke din wê pêş ve here. Ger li gorî kêfa xwe û dûrî rewşa gelê xwe hozanvanî û nivîskarî bi-

ke, millet lê guhdarî nake. Gotineke Ereban heye, dibêjin, "ger li welatê me xwîna şehîdan birije û ez jî, li ser gul-û dilovaniyê helbestan binivîsim, kes ji min xayintir tune". Ez jî, weha dibêjim; nivîskarên welatê me, hêviya min ew e ku, bi nivîsandinên xwe, cihekî di şoreşê de bigirin. Di tekoşîna gel de alîkar bin û di riya azadî û serxwebûnê de gavên xurt bavêjin. Ku bi milletî, di nava milletên cihanê de, cihê xwe yê bi rûmet bigrin.

REWŞEN: *Rewşenbîrên Tirk, ji rewşenbîrên din, hin bêhtir nêzîkî me ne. Lê em li wan û ramanên wan dinêrin, heta ji destê wan tê, xwe dûrî têkoşîna gelê Kurd digirin. Tu dikarî çi ji xwendevanên me re, di dermafê rewşenbîrên Tirk û tore ya Tirkî bêjî?*

J.DOST: Min bi pirranî helbestên N. HİKMET xwendine. N. HİKMET li ba me gelekî bi qîmet bû. N. HİKMET mirovekî ji xwe re digot ez sosyalist im. Vî morovî, li ser Efrîqa, Berlîn, Lenîngrad û hwd. peyiviye û helbest çêkirine. Li rex wî, milletê Kurd hebû. Ji bo çi li ser vî milletî tiştek neanî zimên? Derd û êşên wî, pirsên wî, xwestinên wî... Hima di helbesteke xwe de navê wî bianîna ziman... Ev çawa hozanvanî ye? Ev çawa nivîskarî ye? Hozan, dilê wî berî her kesî gerek li ser mirovan bişewite. Gerek berî her kesî, bûyerên dora xwe bibihîse. Çawa Kurd-Kurdistan di bin guhê wî de ye, ne dibihîse û ne dibîne? Ne tenê N. HİKMET; E. ÖZ, A. ARİF, Y. KEMAL, A. NESÎN û hwd. hene. Bes bi pirranî, ya li ser pirsên Kurdî nenivîsîne, yan jî, pirr bi tirs, bi çend gotinan wilo bê meedî xwe anînin ziman. Nizanim newêr in, an şexsiyeta wan tuneye? Herhal fikra kemalîzmê di mejiyê wan de bûye hestî? Pirsên Kurdî ji xwe re pêwîst nedîtinin.

N. Hikmet, berê li ber çavên me, mezin bû, min helbestên wî gişt xwendine, gava ku min, di helbestên wî de pirsên Kurdî nedîtin, li ber çavên min, berê çiqasî mezin bû, niha jî, hewqasî biçûk e. Em gazin ji Lorca, Nerûda, Mayakowsky û êd. nakin. Lewre ew ji gelê Kurd dûr bûn, belkî gelê Kurd nebihîstine û nehatibe bîra wan jî. Lê Nazim û rewşenbîrên Tirk, di nav gelê Kurd de ne û wan ji nêzî ve dibînin. Ji ber vê yekê em ji wan di gizinin, em destbiraktiya wan dixwazin ku em van gazinan dikin. Bi rastî gerek berê mirov li xwe binêre. Rewşenbîrên Kurd yê bizdonek ka li ku ne? Heta kengî wê xwe di bin cilê de veşêrin?

Dibêjin, "ger li welatê me xwîna şehîdan birije û ez jî, li ser gul û dilovaniyê helbestan binivîsim, kes ji min xayintir tune." Ez jî, weha dibêjim; nivîskarên welatê me, hêviya min ew e ku bi nivîsandinên xwe cihekî di şoreşê de bigirin. Di têkoşîna gel de alîkar bin û di riya azadî û serxwebûnê de gavên xurt bavêjin. Ku bi milletî, di navê milletên cîhanê de cihê xwe yê bi rûmet bigrin.

Têkoşîna rizgariya netewî, ji rewşenbîrên Kurd gellek tişt dixwaze, lê dîsa gellek rewşenbîrên Kurd hene tu çiqasî rastiyê şanî wan bidî, hewqasî direvin.

REWŞEN: *Hewcedariya têkişînê, bi rewşenbîrên ku bi gelê xwe re dimeşe heye. Bi hatina te em pirr kêfxweş bûn. Gelê Kurd di rojên dijwar de dijî. Di van rojên dijwar de divê rewşenbîr, çi bike?*

J.DOST: Xizmet tenê ne bi qelem e. Dibe ku em şehîd jî bibin. Pirr şair di şoreşan de şehîd bûne. Şoreşa gelên bindest gelêrî ye. Rewşenbîr, hunermend, şaîr û hwd. Jî, parçeyek in ji gel.

Ez dixwazim ji xwendevanên REWŞENê re silavên xwe yên germîn pêşkêş bikim. Zor spas, ji bo ku we vê îmkanê ji min re vekir.

Ji İsmail Beşikçi re

BES E

Bes e
Kêr giha hestî
Bes e
Dijmin av vexwar ji hestî
Min winda kir, min kuşt
Ev şexsiyeta koleperestî
Ev şexsiyeta kevneperestî
Bi bera sorî agir girtî

Binêr
Difetiqînim nava zinaran
wek xerdela buhara
Dinivîsim navê xwe
li nav pelê daran
li ber serê ava
Bi xwîn û keda hevalan

Hêviya min
Hesreta min î sed hezar sal
himbêz kiriye
Evîna dilê min zeft kiriye
Biruskê êşa azadiyê girtiye
Neqeba herdu polê min
Çirûskê wekheviyê
yê şirîkatiyê
û yê biratiyê girtine
Her çar aliyê welatê min
Bera ehda min be ji we re
Wê winda bibe li welatê me
Mêtingerî û nijadperestî
Wê bimeşin ber bi rojê ve
karker û gundî

Binêr
Pel li hevdû dikevin
Xumxum li av ketiye
Xişxişa pelê daran
ramûsan girtiye
Gel ji dil fêm kiriye
Bê ev çi dilgermî ye
ji ku parzinî ye

Binêr
Dihezîn e şoreş
Binax, serax dihezîn e
Bila ehd be dîsa
Ku emê bikenin
Em hemû bi hev re

Dara Azadî DILGERM

www.anfnewsurf.org

WÊJEYÊN ÎRANÎ YÊN KEVIN

Pierre LECOQ
Wergêr : AMED

Li gorî ku navê wan di nav tevgera mezin a koçbarkirinê ya Hînd-Ewrûpî de diyar bûye, rêça Îraniyan, bi xwe, di destpêka hezara yekê beriya zayînî de, di aliyê Transoksiyaniyê (1) de û di aliyê Kokazê re bû. Ji vê gavê ve, hingûra bajarvaniyeke gewre li ser xakeke pêş-dîrokî ku berê gelekî dewlemend bû, pertav da. Van Îraniyan nikaribûn ji aliyê Transoksiyaniyê re derbasî Pencabê bûna. Di wê demê de Pencab, ji aliyê Hindiyan ve hatibû dagîrkirin, Hindî ji aliyê çandî de birayên Pencabiyan in. Îranî ji wir rabûn û ber bi deşta Îranê ve ku îro navê wî lê bûye, koçbar kirin. Li aliyê Rojava, eşîra Îranî bi bakur ve bi dirêjayiya Çiyayê Zagrosê re dilivin, rastê dewletên xurt ên Mezopotamî tên û li her derê ku xak ji wan re lê tê, rûdinin. 700 sal berî Zayînê, yek ji wan êlan ku navê wê Paris (2) e, li navçê bi cî dibe û paşê navê xwe jî lê dike. Bicihbûna van êlên Îranî, di riya dan-sitandina wan de bi bajarvaniyên kevnar re zanavekî diafirîne. Ji vê jî, yekîtiyên siyasî yên cûrecûre çêdibin û ji van yekîtiyan jî, zarav derdikevin. Ev zaravine tev ku ji koma Îranî an Arî (*Aryana* bi zimanê Avîsta) tên, li navçeyên erdnasî yên diyar tên belav kirin. Erdnasiya zaravan, wekî erdnasiya êlan, li ser xakeke mezin dirêj dibe. Bi giştî, ji Bakur-Rojhilat û Başur-Rojavayê Îranê dest pêdike, di Rojhilatê Transoksiyaniyê re derbas dibe digihêje Girava Parisî. Bi vî awayî, em têdigihêjin ku zimanê Parisan zaravek bû ji zaravên Îranî; yê Medan jî wilo bû, yê Parthan jî wilo bû. Zimanê Farisî (an ku Farisiya Nû) ji Farisiya Navîn (dema Sasaniyan) hatiye; Parisiya Navîn, bi xwe jî, ji ya Kevin, zimanê Parisan, hatiye. Di pêvajoyê de hin zaravên Îranî dibin zimanên çandî; bi wan wêjeyên pêşketî tên nivîsandin. Wekî çawa Fransizî ji zaravê Firengan bû ziman, ji van zimanan, zimanê Farisî belav dibe û di nava salan de fireh dibe; êdi zimanê Farisî xwedî bext derdikeve û pê tê nivîsandin; li Bakur-Rojhilat, ev bextewariya hanê digihêje zaravine dinê yên Îranî jî, ku nivîskarên **Avista** û Zerdeşt bi xwe pê dinivîsin û bikartînin. Lê, di demên dîrokî yên pirr kevin de, tevayiya wêje devkî bû. Ji dewlemendiya wêjeya Îranî ya kevnar, tenê çend tişt mane, ew jî, li ser kevir û zinarên mezin hatine nivîsandin. Ji xwe zanîna me li ser wêjeyên Îranî yên kevnar tenê ji wan de tê.

Ji Medan (3) koknivîsarek nîne; lê dibe ku arşîvên wan bi zimanê dewletekî cîran hatibin nivîsandin, wekî çawa arşîvên Hexamenîşiyan jî, bi zimanekî dinê hatiye nivîsandin. Dadxwazên Medî *"yên ku doza xwe bi niviskî dikirin"* (Herodot) û

www.sivakurdi.org

didane paşayê xwe Deyokês (Dêiocês), bê guman bi zimanên biyanî kirine. Lê, Mac, şêxên Mediyan li eywana Parisan, hebe-nebe "bendên ola" (Herodot) xwe bi zimanê Medî digotin; em ji Dînon jî, dizanin ku helbestvanên eywana Medan di sedsala VI'an de (berî Zayînî) hebûn. Ev tiştên han jî, dide nîşan ku wêjeya Îranî ya kevin di sê waran de bikardihat: Di qada olî, helbesta eywanî û qada birêvebirinê de. Em dizanin ku qralê Medan Keyaksar, şagirt dişîne nav koçerên Sakan, [4] da ku *"fêrî zimanê wan û tîravêtinê bibin"* (Heredot). Destana Rustemê Zalê bi nav û deng, ji destanên Sakan hatiye, lê ji piyê Rojhilatê Îranê. Bi van tradîsyonên Sakayî, em rastî yek ji dewlemendtirîn nîşanên wêjeya Îranî ya kevin tên; pirraniya wê, wêjeyeke devkî ye, bi rengê destan û efsanan e.

Wêje Bi Farisiya Kevin

Di dema Koreş (559 - 530) de, Paris, dibin serdarên konfederasiyona êlên Îranî. Girêdana wan a siyasî bi Medan re ye. Birêvebirina Medan weke xwe ma. Zimanê Aramî, bû zimanê namevaniya Hexamenîşiyan. (Ji vî zimanî sêzdeh tîpên ku li ser çermên dewaran di sedsala V'an de hatine nivîsandin, li satrapa Parisî ya Misrê hatine dîtin û parastin), zimanê Elamît jî, bi tîpên mixî [5] hatibûn nivîsandin. Ji xwe zimanê Farisî yê wêjeyî (ku em jê re dibêjin Farisiya Kevin) ji Dariyosê Yekemîn (522 - 486) de tê zanîn. Nivîsara wî ya navdar li çiyayê Bîstûn û di sala 519'an de hatiye nivîsandin. Ev jî, bi tîpên mîxî û Aramî ne. Piştî Dariyos ev hat teqlîd kirin. Parisiya Kevin, pirranî devkî bû, lewra em ji Strabon dizanin ku xortên Paris ji mamosteyên xwe fêrî efsanan dibûn. Ji xwe ev efsaneyên han dibin mijara *Şehnamê* [6] Parisiya Kevin bûye zimanê dibistanan jî, li gor ku Zênofon (*Cyropêdie, 1, 2*) diyar dike. Wekî dinê, derveyî nivîsarên bi tîpên mîxî yên çend qralên Hexamenîşiyan, tiştekî dinê yî diyar bi Parisiya Kevin nîne. Çend gotinên bi Parisiya Kevin û bi Parisiya Navîn ku di nav nivîsarên bi zimanê Elamît, Aramî û Grekî de têne dîtin, dihêle mirov hinek tiştan bizane.

Nivîsarên Hexamenîşiyan gellek girîng in, ji ber ku ev nivîsar bi tîpên mîxî, parçeyên kîtkî û bi sî û şeş tîpan hatine nivîsandin. Ev nivîsar bi hostatiyeke bê kêmanî, di sala 1837'an de bi temamî ji aliyê Rawlinson ve hate xwendin. Ev nivîsar ji yên ku em di Avista de dibînin, gellekî dûr e. Ew nivîsar tev ji qralan mane, nemaze ji Dariosê Gewre de mane, dibe ku ji her sê pêşiyên wî de jî mabin û ji Kserkses (Xerxês) ji Artekserksesê (Artaxerxes) 1, ji Daryosê II û ji Artakserksesê de mabin. Hemû deqên ku bi rûdaw in, çêla serketina lehengan dikin, li ser zinaran, li ser stûnên qesran, li ser ceran, li ser lalikan hatine nivîsandin. Tevayiya wan li kavilên Sûzê (Sûsê) û Persepolîsê hatine dîtin. Li dora Hemedanê û bi taybetî li Bîstûn, li Misrê û li peravên gola Wanê. Nivîsarên giranbiha ku li ser çiyayê Bîstûn hatine dîtin, hinek ji wan bi zimanê Babîlyon û Elamît in, 414 rêz in, li ser stûnan hatine nivîsandin. Di van nivîsaran de, Dariyos, bûyerên mezin ên destpêka hûkmê xwe hewal dike. Naveroka van nivîsaran ji dîroknasan re gellekî balkêş e. Çend ramanên olî û moral ên qralên Hexamenîşiyan tê de têne dîtin. Stîla wan a qralî û bi paye ji aliyê Dariyos ve hatine nivîsandin û redaksiyona wan nivîsaran ji aliyê qralên pê wî re hatine teqlîd kirin. Deqên wan nivîsaran bi pêşgotinek dest pê dikin, tê de qral bi rewatiya xwe diçespîne, kesaniya xwe dinitirîne. Nivîsareke Dariyos li Sûzê weha dest pê dike:

" Ahura Mezda [7] Xwedayê Mezin e, wî ev erdê ava kiriye, wî ev ezmanê bilind ava kiriye, wî mirov afirandine, wî xweşî daye mirov, wî Dariyos kire qral, qralê tenha ji nav qralan tevan, şahê tenha ji nav şahan tevan." (Wergerandina Sharp [8].)

Li Nexşê Rustem, Dariyos II ser xwe û kirinên xwe: *"...ez hevalê qanûnê me. Ez ne hevalê şer im. Ne xwesteka min e, kesê qels ji aliyê kesên xurt de tên êşandin. Her tiştekî ku heq e, daxwaza min e. Ez ne hevalê kesê derewker im"*, dibêje. Paşê deqê din ê xwedî bûyer tê, deqê Dariyos ku li Misrê hatiye dîtin: "ez Paris im, Ra ji Pêrsê [9] de, min Misir dagîrt. Min ferman da ku vî kanalê ji çemê Nîl ta deryayê Pêrsê bikolin..." Deq bi bangîna ji bo Ahura Mezda kuta dibin. Bi zimanekî germ û bi zimanekî pirralî hatiye gotin ku qral dizane desthilatdariya xwe ya olî xwedî bike, lê kok şopeke ronî nîne ku bihêle mirov bawer bike ku qralên Hexamenîşî Zerdeştî bûn. Wekî dinê Mezdîtiya wan pirr diyar e.

Avista

Îca di demeke diyar de, dema ku mirov pê diaxive, Parisiya kevin hate nivîsandin. Zimanê Avista bi carekî tiştekî din e. Ka em hin tiştên gelemperî yên neçespandî diyar kin da ku em paşê rast bikin. Zerdeşt, Avista nivîsandiye, berhema wêjeyî ya herî mezin ku ji ola wî de maye. Avista, bikaranîna du zaravên Bakur-Rojhilatê Îranê (Xwarezm û Sogdiyan) nîşan dide ku yek a taybetî (gathî) [10] ye. Ya dinê va gelempêrî ye. Hezar sal piştî Zerdeşt ev zaravine bikarhatin, bikaranîna wan jî, tewr li navçeya dinê, li Pêrsê bû. Kesaniya Zerdeşt, wekî ku di Avista de bi rengekî efsaneyî hatiye zimên, gellek muşkul e were nas kirin. Pirtûka ku bi wî tê navkirin, bi xwe, berhevokeke ku her çend deqên wê yên demekê ne.

Avista, wisa xuya dibe ku pirtûkeke wisa ye ku di hemû waran de hevûdû nagire. Bermaya tradîsyona temendirêj ên devkî ye ku ji gellek heyaman de hatiye, neynika tiştên oldar ku ji hev direvin e. Avista dîsa pirtûkeke wisa ye ku dema redaksiyona wê hatiye kirin, li gor daxwaz û baweriyên dewleta Sasa-

niyan hatiye guhertin. Dewlemendiya nivîsarê ya elfabeyî ya Avista hewaldana tradîsyoneke devkî bi hûrgilî bi tîpine li ser bingeha tîpên Aramî hatine. Lê niha em ne li wê ne ku em herin beranberkirinekî di navbera wê û nivîsarên din de bikin, da ku em bikarin Parisiya Kevin bixwînin. Her çi naveroka wê divê em nîşan bidin ku hevgirtineke temam di pirsên ku diyar dike de nîne, ev jî, "di dîroka olan de nimuneyeke tenha ye" (J. de Menasce). Niha ev tiştên gelempêrî yên neçespandî ku me li jor diyar kirine, ev in. Teqes, dem di ser re gellek buhuriye. Dema ku Anquetil Duperron li Hindê di sala 1762'an de destnivîsa Avista peyda kir û wergerandina wê di sala 1771'ê da belav kir, êrîşên xurt ji aliyê ensîklopêdînasên Fransiz û rojhilatnasên Alman û Înglîs li ser kêşa rastbûna destnivîsê xwarin. Ya rast şirovekirinên wî hiştibûn ku xwendevan nevehesî bimînin. Wekî dinê îro riyeke dirêj maye ku mirov gav bavêje, da ku van nivîsaran bikole, van tradisyonên devkî yên rengîn ku bingehên Avista ne, şirove û rohnî bike.

Avista, Farisiya vê gotinê ji gotina Farisiya Navîn *Epestak* (11) hatiye. Epestak, ji "deqê bingehîn" yê ola Zerdeştî ya heyama Sasaniyan re dihate gotin. Gotina "Avista" di sedsaliya çaran de cihê xwe girt. Gotin rengeola (12) Ahura Mezda nîşan dide. Beramberî adet û merasîmên wê em dikarin bibêjin ku ev gotin rûyê çîrokbêjî nîşan dide. Lewre rengeola Zerdeştî ya ortodoks ku di heyama Sasaniyan ji sedsala sisiyan de pêk dihat, bi kêlk (feyde) bû. Perestgehên xwe yên êgir hebûn. Cejnên bi qurban û hin merasîmên rengîn tê de bikardihatin. Ev rengeoleya ha, îro jî, ji aliyê Farisên Hindî û Zerdeştiyên Îranî ve tê pîroz kirin.

Avista, ne teqesekî nîşan dide, wekî din tiştên nenas ên navdar bi awayekî rengeolî hewal dide. Bi vê yekê, Avista cihana mejî û giyanî ya Îranê piştî ola Zerdeştî û kartêkirina wê li ser Îranê bi me dide zanîn. Ji ber vê yekê, em tê digihêjin ku parastina wan merasîman ji ewqas sedsalan ve di bîra millet de gotinên ku li şunê mane ku ciyê xwe hê di Avista de dibînin. Ya girîng ev e, hevgirtina matane di navbera tiştên ku em di deqên Avista de dixwînin û tiştên ku nivîskarên Grekan ên kevin li ser doktrîn û dezgehên Macan nivîsandine. Îro sirûdên ku diyar e ji aliyê Zerdeşt bi xwe de di sedsala heftan de (b.Z) hatine honandin û bi zaravê wî yê Îranî (Bakur-Rojhilat) hê têne gotin. Tiştên ku tên xwestin, deqên Avista yên ku hatine parastin giş bi careke tu girêdana wan bi rengolê re nîne. Dîdariyeke sererast li ba me heye, nîşan dide ku şopên Avista di sedsala nehan de baş hebûn. Divê deqên wê Avistayê sêcarkî bin, lê yên Avista îro ku di destên me de ne, kevintirîn deqên Avista yên sala 1278'an e. Avista divê koka zanîna Îranî ya demeke pirr kevnare be. Tevî vê pêwist e mirov tiştên bermayî bikole da ku paşê bikare li ser çend pirsên wêjeyî yê di Avista de raweste. Avista îro çawa tê nîşan dan?

Yasne li ser qurbana gelemperî ku ji bo Ahura Mazda û kesên ezmanî yên ku hawîr wî digrin tê pêşkêş kirin, diaxive; bê çawa qurbana *Hoama* (13) tê amade kirin, wekî çawa *Soma* di rengeola *Vêdî* de tê amade kirin; di ber merasîmên qurbanê re, heftê û du "Ha" (14) têne gotin, "Ha" nimêjina dirêj in, bi stîlekî gellek pirrcarkî tê de heye, nîşanên cîhana oldar a Mazdîtiyê tê de tijî ne, pirraniya xwedêtiyên wê, zîrekên wê, cejnên wê, moralên wê, bîr û baweriyên wê. Di nav hayên wê de, deqên kevintirîn ên Avista deqên gathî ne. *Gatha* ji sirûdêk e ku ji zaravê Bakur-Rojhilat re tê gotin. Ji hemû deqên Avista honrawî û yên pêxşanî re ku ji vî zaravî hatine, **gathî** tê gotin. Tim hatiye diyar kirin ku ev zarava zaravê Zerdeşt bûye, ev jî, baş kevnahî û yekîtiya naveroka deqan diçespîne. Piştî Avista pirtûkeke pîroz heye jê re dibêjin *Vendîded* (bi Hûrî, *Vîd*êvdat, "Qanûn li dijî dêwan"), pirtûka (an nesk) nozdemîn e ji bîst û yek pirtûkên heyama Sasaniyan; anku, tevahiya wêjeya pîroz a Zerdeştî ye. Gellek ji van neskan ku em kurtiya naveroka wan dizanin, îro winda bûne. Lê Vendîded a ku mayî bi tevahiya xwe maye, çima ku ew beşek e ji koda olê û, bi taybetî, li ser dûrxistina dêwan ji derên ku genî kirin re ye; ev tev rengeolekê çêdikin. Em di wê baweriyê de ne ku ew piştî ketina împaratoriya Hexamenîşî hatine nivîsandin. Zimanê wê Avistî ye, lê şikestî ye. Dibe ku komek ji Mediyan ên ku xwe avêtine penahiya Rojhilata Îranê, ew nivîsandibin. Qanûnên paqijkirinê ku Vendîded nîşan dide, dihêle mirov tê de jiyana rojane ya Îrana kevin bi hûrgilî bizane. Pirtûk bi xwe bîst û du beş in (an fergerd), destpêka wê çêle damezrandina herêman a ji aliyê Ahura Mezda ve (li Îranê) dike, paşê diçe ser qanûnên ku ji mirovan re hatine. Beşê 19 çêla xapandina (15) Zerdeşt dike, pê re qewîtiyên wî li ser "ola çak" ku Ahura Mezda diyar kiriye tê; dawiya pirtûkê li ser bijîşkê ye. Perçê sêwemîn ê Avista pirtûkeke li ser nimêjan e, navê wê Sîroza (Sî Roj), nimêjên ku di sî rojên mehê de têne gotin. Her rojek xwediyê taybetiyek bû; destpêka pirtûkê bi "sî rojên biçûk" vedibe. Ji xwe lîsteke biçûk ji navên van xwedêtiyan (16), ji navên alîkarên wan û ji çend rewşên wan ên taybetî pêk tê. "Sî rojên mezin" dibe ku kêm-hindik hatibin guhartin û li ser sî xwedêtiyên serekî hatibin amade kirin. Dimîne 18 deq ku jê re dibêjin *yeşt*. *Yeşt* ji sirûda pîrozkirina cejna olî re tê gotin.

Ciyê yeştan hem di efsannasî û hem jî di destanên Îranî de bilind e. Bi zimanekî Avistî yî rast hatiye nivîsandin. Diyar e ew di dawiya dema Hexamenîşî de hatiye nivîsandin. Hatina xwedêtiyan di wê de tijî tradîsyonên devkî, olî û destaniyên wê heyamê ne. Ev nêrînên ku em pêşkêş dikin ne hêsan in werin têgihiş-

tin. Eger mirov naveroka efsanî û lehengî ya Avista û ya destana Farisî ya Firdewsî (sedsala XI'an ê Zayînî) bide berhev, mirov vê yekê baş tê derdixe. Sirûdên ku bi xwedêtiyan hatine bi aheng in, kêşana wan a sertkî ye, di her rêzeke heyşt kîtkî (birrgeyî) de sê sertik tê de hene. Ev kêşana hanê ji ya *Vêdî* hatiye. Di warê naveroka Sîroza de, naverokeke wê ya cuda heye. Em beşekî ji yeşta 5 nîşan didin. Yeşta 5 sirûdek in, ji Xweda yê mezin Avan, Enahîta, Xwedêyê pak, re hatiye nivîsandin. Enahîta kaniyek e, li deşta stêrkan e, li serê çiyayê Hukariya ye, hemû çemên ku li ser erdê hene ji wê kaniyê dizên. Yeşt bi pesinandina Enahîta dest pê dike, paşê çi lehengên ku ji Enahîta re bûne qurban têne hewaldan. Yek ji wan lehengan Yîma ye. Yîma, "Cêwî", di efsaneyên Hindiyan de nas e; afirîna mirov ji cêwiyê wê, Yamî de hatiye; guneh û mirin jî, ji xwe, ji wî de hatine zanîn; bîranîna şaşiya wî di Şahnama Firdewsî de diyar e; payebilindiya wî bûbû sedemê hatina sitemkarê xwînxwar, Zehak. Perçê ku em pêşkêş dikin wê nêrînek li ser stîla deqên ku Avista pê tijî bûye, bide. Ew ji aliyê *J. Darmesteter* ve hatiye wergerandin. Li ser vê wergerandinê, *E. Benveniste* dibêje ku tevî kêmaniyên wê nemaze di warê şirovekirina gathan de, li "hemberî wê tu zimanên din nîne":

"Yîma Xşayête, şivanê çê, li ser çiyayê Hukariya, ji wê re hate qurban kirin: şivên sed hespên nêr, hezar ga û deh hezar pez diyarî wê kirin. Li ber wê digeriya û digot: "vê razîbûnê bide, Xudayê çêyiyê û xêrê, Erdvî Sûra Enahîta! bila ez emperetoriya mezin li ser hemû welatan, li ser dêwan, li ser mirovan, li ser Yatusan û Pairîkasan, li ser sitemkaran, li ser koran û kerran, ava bikim; bila ez ji destê dêwan dewlemendiyê û xêrê, keskayiyê û dewaran, geşî û bilindahiyê bikşînim". Erdvî Sûra Enahîta razîbûna xwe da, ew jî, jê re vexwarin [17] û qurban dianî, li şona wê razîbûnê."

Di Avista de pirr perçeyên din hene ku pirraniya wan nimêj in, di hin demên rojê, salê û rûdawan de têne gotin. Herweha, perçeyê pêncemîn, *Gah,* di her pênc demên rojê de têne gotin.

Bi tevayî, naveroka Avista li ser du rengdeqan tê beş kirin: yek bi zaravê Gathî ku yekîtiyeke stûr a doktrînî nîşan dide: Ev jî, baweriya bi xwedayekî tenha, bi Ahura Mezda û bi Duruvên wî, û baweriya bi du moralên xuya ne; naveroka wê ya olî bêtir tevlîhev e. Nivîskarên Avista, navê welatê xwe Aryana Vayêjah danîne. Li gorî agahdariyên li vir û li wir, ew welatê *Korazm* [18] e, welatê ku Kawîsan di navbera sedsaliya VII'an û VI'an de tê de serdarî kirine. Kawîs malbatek e, ji Sîstanê [19] bûn. Qralê dawî yê vê malbatê ku navê wî di Avista de hatiye diyar kirin, *Vîştaspe* ye, qralê ku Zerdeşt anîbû ser ola xwe.

Jêrenota Wergêr

1) Ji herêma ku di navbera Pamîrê û Semerqendê de ye re tê gotin.

2) Faris tiştek e, Paris jî tiştekî din e. Paris (Perse) ji Medan û Farisan herduyan re tê gotin. Zimanê Parisî jî, li gorî Îrannasan, zimanek e ku ji Mêdî û Farisî çêbûye.

3) Med an Mad ji Emperetoriya Mêdiya re tê gotin.

4) Saka (Scythe), wekî Kurdan, miletekî Îranî ye, bapîrên Osêtên ku îro li Gurcistanê dijîne ye.

5) Tîpên mixî ji aliyê Madan, Parisan û Aşoran ve jî bi kar dihat.

6) Pirtûka Fîrdewsî.

7) Di Mezdîtiyê de, ola Îraniyên pêşîn, Ahura Mezda Xwedayê çêyiyê ye, Ehrîmen Xwedayê şêr e. Wata wê bi zimanê Avista "Xwedayê hişiyar" e. Pê re, Zerdeşt tê vê olê hinekî diguherîne, "Ahura Mezda" dibe "Hurmiz". Di Mezdîtiyê de, herdu cêwî Ahura Mezda û Ehrîmen kurrên Zurvan in, Xwedayê Demê.

8) Mebest ê ku ji deqê yekê wergerandî.

9) Anku navça ku Paris lê dimanî.

10) Li ser tîpan "th" di gotina "gatha" de, ev tîp tenê di zaravatê Hewramanan de maye. Hemberê wê di Înglîzî de heye: di navbera "th" a "that" (ku, wê) û "th" ya "three" (sê) de. Di vê barê de, Giyan-buhuşt Hejar digot: "Peyva 'gatha' (deq an "stran"ên ku di Avista de hatinî) îro bûye "gazî".

11) Em dixwazin li ser peyva "Zend-Avista" rawestin. Avista, bi zimanê Farisiya Navîn hatibû şirove kirin, jê re digotin "Epestak û Zend"; anku "Avista û Zanîn". Bi gotineke dinê, deqên Avista hatibû tefsîr kirin. Niha, di lêkolînên li ser Avista de, gotina "Zend-Avista" rabûye, tenê "Avista" bi kar tê. .

12) Em bala xwendevanan dikşînin ku me gotina Firansizî "culte" bi "rengeolê" wergerandin.

13) "Hoama" ya Avista û "Homa" (Xwedê) ya Zazakî pirr ji hev ne dûr in.

14) "Ha" bi zimanê Avista şapîtr (beş) e.

15) Anku ji aliyê yên ne çê de: dêw, cin, pêrî, hwd. Wisa diyar dibe kêşa Şeytanê Fileyan û Musulmanan çi ye.

16) Me gotina Fransizî "divinité" bi "xwedêtî" wergerand. Jixwe gotina "divin" û "Dieu" a Fransizî û "dêw" a Kurdî nêzîkî hev in, wekî dinê wateyên wan ên niha ji hev dûr ketine. Sedema vê yekê wekî Îrannas hewal didin ev e: berberî di navbera miletên Hind û Ewrûpî de çê bûbû, xwedêyên Ewrûpiyan li ba Îraniyan hatibûn pîs kirin. Ji ber vê "Dieu" (xwedê) li ba Îraniyan bû "dêw".

17) Mebest ji vexwarinê ew e ku berê di ber qurbanan re di olên kevnar de vexwarin hebû. .

18) Korazm niha li başûrê derya Aralê dikeve.

19) Sîstan ji derdorên Kermanê -Niha bajarekî Îranî ye- re dihate gotin.

HALKIN AYDINI HALKIN SAVAŞÇISIDIR (2)

Savaş başlamıştır.

Erzincan, Erzurum kolorduları dahilinde Diyarbakır'daki askeri havaalanı Elazığ'a kaydırılmış, olağan hal ilan edilerek terhis olanlar (askerliğini bitirenler) tekrar silah altına alınmışlardır. Bir taraftan savunmasız ova köyleri bombalanırken, diğer yandan Dersim'in bütün ormanları ateşe verilmiştir. Savaşın hedefi Seyit Rıza, Alpdoğan'a haber gönderilir, "savunmasız, silahsız sivil halka zarar verilmemesi kaydıyla tüm rehinelerin serbest bırakılacağı" belirtilir. Bütün girişimler sonuçsuz kalmıştır. Saldırı bütün şiddetiyle devam etmektedir. Dersim etrafındaki küçük aşiretler büyük kayıplar vermiş, geri kalan kısım Seyit Rıza'nın birliklerine katılmıştır. Dersim karadan tank ve toplarla, havadan uçaklarla bombalanmaktadır. Seyit Rıza'nın üstlendiği Halvori, Vank Bölgesi sürekli bombalanmış, bu bombalanma sonucu birçok Kürt silahlı güçleri şehit olmuştur. Seyit Rıza'nın oğlu Resık Hüseyin de ağır yaralanmıştır. Bu olayı duyan Türk istihbaratı bir komployla tedavi edilmek amacıyla Hüseyin'i Elazığ'a getirtmiş ve işkenceye almıştı. Amaç bölgeydeki Kürt silahlı güçlerinin durumu konusunda bilgi edinmekti. Eli silah tutan herkes dağlara çıkarken, kadın çocuk ve ihtiyarlar da mağaralara yerleştirilmişti. İlerleyen Türk güçleri ilk olarak mağaraları kuşatıyor, saatlerce mağaraları top ateşine tutuyorlardı. Bazı mağaraların kapısı betonla örülerek insanlar ölüme terk ediliyordu. Özellikle Tujik dağının eteklerindeki silahsız, savunmasız kadın ve çocukların dolu olduğu bu mağaraların ağızları betonla sıvanmıştır. Bazı aşiretler bu barbarlık karşısında teslim olmayı seçmişlerdir. Teslim olanlar da anında kurşuna dizilmişlerdir. Genç kızlar ve kadınlar Türk askerinin eline geçmemek için, kendilerini Kürdistan'ın yüce dağlarından engin ovalarına atıyorlardı. Güzel Munzur'un özgür derinlikleri koruyordu Kürt kadınlarının iffetini, şerefini.

Kış erken başladı Dersim'de, eylülle birlikte başladı kuru soğuklar. Türk ordusunun kış mevsiminde Dersim Bölgesinde kalması ve savaşı sürdürmesi imkansızdı. O zaman yeni komplo hazırlanmalıydı. İlk olarak sahte bir ateşkes emri verildi, arkasından Seyit Rıza'ya "Dersim'lilerin bütün isteklerinin kabul edildiği" bildirilerek, Seyit Rıza ve diğer önderlerin Elazığ'a gelmeleri istendi. Seyit Rıza ve gidenlerin hepsi 5 Eylül 1937 tarihinde tutuklandılar. Sonraları, Seyit Rıza mahkeme salonundan çıkarken "şerefsiz ve yalancı hükümet " diye bağırdı. Erzincan'dan Elazığ'a İstiklal Mahkemesine sevkedilen Seyit Rıza, İstiklal Mahkemesi'nce yargılanmaya başlandı. Mahkemede verdiği ifadede, "milli amaç için mücadele ettiğini, hürriyet için savaştıklarını, 70 yaşını geçmiş olmasına rağmen bu savaşımı milli bir borç olarak gördüğünü, bu milli borç için ölmenin doğal olduğunu, hiç bir dış güce alet olmadıklarını, yüzyıllardan beri bu amaç uğruna çalışıldığını fakat muaffak olunamadığını" kısaca belirtmiştir. Batı kartını Moskova'ya karşı kullanarak, Moskova'yla birlikte Ağrı isyanını bastıran TC, bu kez Moskova kartını batıya karşı uyguladı. Seyit Rıza'ya yöneltilen en önemli sorulardan birisi de, "himayesinde Rus kurmay subaylarının olup olmadığı, Ruslardan muhimmat, silah, cephane ve para yardımı alıp almadığı"dır. Oysa Moskova, büyük devlet çıkarı için yakın komşusu mazlum Kürdistan halkının vahşice ve barbarca boğazlanmasını görmemek için kör, duymaması için sağır olmuştur. Hatta zaman zaman bu katliamlara maddi ve manevi katkılar sunmuştur. Gerekçesi açık: ona göre bu isyanlar, gerici ve emperyalist oyunudur. TC de, Kürdistan ulusal kurtuluş ve bağımsızlık mücadelesinin köklerini hep dışarıda aramıştır. Oysa Kürdistan'ın aslan parçasını TC'ye hediye eden İngiliz ve Fransız emperyalistleridir. Kökü dışarıda arama anlayışının altında yatan asıl neden, Kürdistan ulusal kurtuluş mücadelesini dünya demokratik kamuoyundan ve tecrit etme isteğidir. Bu tecrit etme planı Türk devletinin sömürgeci statüsünün devamından yana olan ve yüzüne demokrat maskesini geçiren, Bülent Ecevit ve Uğur Mumcu gibi kafatasçı fosiller tarafından zaman zaman dile getirilmiştir.

Kürdistan İşçi Partisi (PKK) anti emperyalist, anti feodal ve her türlü gericiliğe karşı mücadeleyi amaç edinmiş, İsrail siyonizmine karşı Filistin halkıyla birlikte savaşmış ve bu uğurda bir çok şehit vermiştir. Faşist Saddam ile emperyalist sistem arasındaki son savaşta, kararlı ve devrimci bir tutum takınmıştır. Bu gerici savaşı şiddetle lanetlemiş, faşist Saddam gericiliğini ve emperyalist sistemin Ortadoğudaki yayılmacı emellerini deşifre etmiş, bu gerici güçlere karşı halkların ortak silahlı mücadelesini savunmuştur. Bülent Ecevit ve Uğur Mumcu gibi resmi ideolojinin kör savunucuları, Kürdistan ulusal kurtuluş hareketi için "emperyalist sistemin kışkırtması" tezini öne sürerken, faşist ideologlar ise özgürlük hareketinin Ruslar tarafından kışkırtıldığını (Kars ve Ardahan olaylarında olduğu gibi), Rusların Anadolu topraklarında gözü olduğunu her vesileyle dile getirmişlerdir. Türk devletinin bilinçli olarak pazara sürdüğü bu görüşlerin amacını yukarıda belirtmiştik. Tekrar konumuza dönüyoruz.

Seyit Rıza ve arkadaşlarının mahkemesi uzun sürmedi. 10 Kasım 1937 tarihinde 11 Kürt savaşçısı için idam kararı verilmişti. Bunlar arasında Seyit Rıza'nın yaralı küçük oğlu Resık Hüseyin de vardı. Karar 18 Kasım 1937 tarihinde Elazığ'ın Buğday Meydanında infaz edildi. Seyit Rıza son konuşmasında, "75 yaşındayım, şehit oluyorum! Kürdistan şehitlerine katılıyorum. Dersim mağlup oluyor, fakat Kürtlük ve Kürdistan yaşayacaktır. Kürt halkı intikam alacaktır. Kahrolsun zalimler! Kahrolsun kahpeler ve yalancılar!" demiştir. Küçük oğlu Resık Hüseyin'in son sözleri de "Kürdistan sağ olsun!" olmuştur. İnfazdan sonra cesetler halka teşhir edilmiş ve sonra yakılmışlardır.

Bextê Romî Çîno



Bir Kürt ananın, af yasasına inanarak teslim olup öldürülen oğlu için yaktığı ağıtta şunlar söylenmektedir. (Dimillî)

Meso Xido, Xido meso,
Gos ro min e, li min meso
Na hûkûmat to xapneno
To kiseno bol tereso
Wayê wayê, li min li min, Xidirê min

(Gitme Hıdır, Hıdır gitme
Dinle beni sakın gitme
Bu devlet seni kandırır
Seni öldürür, sakın gitme
Eyvah, eyvah bana
Bana, bana, Hıdır'ım

Dönemin Türk-solu, Kürdistan ulusal kurtuluş hareketinin batıdan destek aldığını, İngiliz-Fransız yanlısı olduğunu ve Batı tarafından yönetildiğini her vesileyle gündeme getirmiştir.

"Dersim'de her ağacın altında bir Seyit Rıza vardı, onlar hangi Seyit Rıza'yı soruyorlardı." Dersim teslim olmayacaktı, Dersim son kurşununa ve kanının son damlasına kadar savaşacağına and içmişti. Şehitlerin ardından gözyaşı dökmek yoktu. Onlar, şehitlerini, düşmana vuracakları her darbede yaşatacaklardı. İsmet İnönü, Seyit Rıza ve arkadaşlarının asılmasından sonra mecliste yaptığı konuşmada, *"bölgeye askeri valinin tayin edildiğini ve sıkıyönetimin devam ettiğini, Dersim meselesinin bittiğini"* vurguluyordu. Celal Bayar'ın yaptığı açıklama, İnönü'yü yalanlamakla birlikte, Dersim'e büyük bir jenosidin uygulanacağı konusunda ipuçları vermekteydi. Bayar Mecliste şöyle bir açıklama yapıyordu: *"Ey Dersim halkı, eğer silahlarınızı terk ederseniz sizin için kollarımızı açmaya hazırız. Merhametimiz büyüktür, fakat gazabımız daha da büyüktür. Dilediğinizi seçmek sizin elinizdedir."* Sömürgeci faşist TC'nin merhamet dediği şey, sivil ve savunmasız çocuk ve kadınları katletmektir. Mağaralara sığınan Dersim halkını, yaşlı, kadın ve çocukları diri diri yakmaktır, mağaraların ağzını betonlayarak ölüme terk etmektir. Savunmasız kadın ve kızların ırzına geçmektir. "Merhametlerine" sığınanları alçakça yalan ve hilelerle kandırıp, idam sehpalarında sallandırmaktır. İşte faşist TC'nin merhameti budur.

Teslim olan Karabal, Ferhat, Pilvank aşiretleri toptan imha edilmişlerdir. Kadın, çocuk ve ihtiyar samanlıklara doldurularak yakılmışlardır. Dersim çembere alınmış, dünya ve çevresiyle tüm ilişkileri kesilerek, tecrit edilmiştir. Şeyh Sait'in kardeşi Şeyh Abdullah, Suriye'den bir grup savaşçıyla birlikte Dersim isyanına katılmak üzere yola çıkmış, ancak Diyarbakır yakınlarında düştüğü pusuda kurularak katledilmiştir.

-Sürecek-

FELSEFE Û ZIMAN

Şemsettin RONAHÎ

Di jiyana mirovan de helwest û livîn, kar û xebat, rewişt (exlaq), têkoşîna jiyanê, rabûn û rûniştin û têkilî bi mirovên din re rasthatî nîne. Ev giştangora bîr û baweriyên gelêrî ne. Dîtina mirov di dermafê xweza (tabîat), jiyan û ramanê de çi be, helwesta karvanî jî, li gora wê pêktê.

Ji bo vê qasî ev herdu tişt, bi hev re di destpêka jiyanê de derketine holê. Ji vê dîtina gelemperî ya dinyayê re tê gotin "felsefe". Felsefe çiqeke zanyarî ya herî kevn e. Di dîrokê de ku jiyana mirovan hêsan bûye û zanyarî geş nebûye, zanyariya felsefê jî, hêsan bûye. Li gora pêşveçûna jiyan û zanyariyê felsefe jî pêş ketiye û gihîştiye. Çawan felsefe di jiyana mirov de pêwistiyek be, di jiyana civatan de jî, pêwistiyek e.

Divê em di warê hişmendî û ramanî de baş bizanibin û bala xwe bidinê ku mirov, di pêvajoyek dîrokî de, ji ponîjîna nêrbaran derbasî ponîjîna nenêrbaran bûye. Bi vê raperîna han, mirovatî gihîştiye gehîneke gellek bilind. Lewma, mirov êdî kariye di mêjiyê xwe de li ser dinya û gerdûnê, li ser bûyeran û li ser bernameyên ji bo dema bê, biponije. Di mêjî de dinyayeke sîmgan çêbûye. Ev sîmge bi her awayî bi hev re pêwendî datînin. Bêje, biwêj û têgeyên nû diafirîn. Ev têtewê wateyê ku navgîna ponijandin û şirovekirinê xurt û dewlemend dibe. Belê ev navgîna girîng, ziman e.

Jixwe, pêwendiyeke diyelektîkî di navbera felsefe, jiyana karvanî û ziman de heye. Ev bi hev re hev zexim û xurt dikin, dixemlînin û pêşve dibin. Felsefe bi zimanekî jar û xizan geş nabe û pêşve naçe. Pêwendiya zanyarî ya felsefî bi giş zanyariyên din re, bi jiyana aborî re û bi pêşveçûna teknolojîkî re heye. Felsefe, li ser van xîmên jorîn ava dibe û vedijene.

Bi awayekî din jî, pêşketina zanyarî ya felsefî bandor li ser hemî zanyariyên din, teknolojî û jiyana aborî dike. Wan fireh, zexim û xurt dike. Ev pêwendiya diyalektîkî di navbera van pêşketinan de bi pergala zimên dinîme (çêdibe).

Bîr û bawerî û bîrdozek ku di civatek de hêşîn bû û derkete holê, êdî ew jiyana xwe didomîne, rengê xwe dide karaktera wê civatê. Ev jî, di nav çanda wê civatê de têtexuyan. Çand jî, bi pergala zimên têtefade kirin. Mirov dikare bêje ku bîrdozî dikeve nav zimên û bîrdoziya civatekê di nav zimanê wê civatê de dineqişe û kifş dibe.

Weka her tiştê, civat jî guherbar e. Di dîrokê de civatek ava dibe, geş û xurt dibe û jiyana xwe didomîne. Di vê demê de ev civat, tovê civatekê din di nav xwe de himbêz dike. Ev tov digihîje, hêşîn û xurt dibe. Di gel vê, civat jî, kevn dibe û dirize û mercên wê yên jiyanê namîne. Di gehîneke jorîn de, ev civat cihê xwe ji civata nû re berdide. Di vê pêvajoya guherandinê de, her civat li gor rewşa xwe ya gelêrî ji xwe re bîrdozek çêdike. Li gor vê, bîrdozê civat teher (form) distîne. Civat dorê vê bîr û baweriyê berhev dibe û gora wê dimeşe. Ev bîr û bawerî, di pêşdemê de bandora xwe di jiyana karvanî de diqedîne. Lê belê, di mêjî, çand û zimanê civatê de jiyana xwe demeke dirêj didomîne. Zû bi zû bandora xwe winda nake.

Divê ev jî, bête diyar kirin ku ji destpêkê de heya niha, du curên felsefî hene. Ya yekemîn felsefeya îdealîst e. Ev felsefe, bingeha xwe ji

www.ernkurdi.org

olan(dîn) digre. Bi olî dinihêre dinê, xwezayê, jiyanê û ramanê. Ol, di dermafê van tiştan de çi bibêje, felsefa îdealîst jî wekî wê dipejirîne. Yên ku naxwazin rewşa civatî bê guhertin, ev dozê dipêjrînin û belav dikin.

Di gel vê dîtina dinê û li hemberî wê, felsefa materyalîst heye. Bingeha vê felsefê rastî û zanyarî ye. Ev li ser sedem û encamên bûyeran disekine. Dixwaze rastiya her tiştî bizanibe. Rê û rêzika guherandin a civatan berçav dike. Yên ku rewşa wan a aborî û civatî ne baş e, vê bîrdozê dipejirînîn. Lewma, ev riya guherandinê vedike. Jixwe, di jiyana karvanî de ev dîtin heye. Ev dîtin nebe, di praktîkê de jiyan ne gengaz(mumkun) e.

Di her civatek de her du dîtinên felsefî bi hev re û li hemberî hev cih digrin û dimeşin. Ev herdu dîtin, li gorî rewşa çand, nirx û jiyana aborî ya wê civatê naverok û teher distînin. Ev dîtin, di civatê de nirxên nû diafirînin. Ev nirxên nû di çand û zimanê wê civatê de cih digrin. Lewma, ev bi zimanê wê civatê têtе şirovekirin.

Li gor rê û rêzika guherbariyê, zimanê civatek jî, diguhere. Çawan me got, ziman girêdayî jiyana civakî ye. Çawa ku civat ji rewşeke hêsan ber bi rewşeke tevlîhev û pêşveçûyî ve diçe, nirxên kevin û nekêrhatî davêje û nirxên nû distîne; wisan jî ziman, her dem xwe nû dike; bêje, biwêj û têgeyên kevin davêje û bêje, biwêj û têgeyên nû ava dike, yan jî, naverokên nû distîne. Li gor her pêşveçûn û gihîştinê, ziman jî, pêşve diçe, dewlemend dibe.

Di civatek de nexweşî û pirsgirêkek mezin hebe, divêt bête çareserkirin. Pêwist e ev çareserkirin ji bo berjewendiyên pirraniya civatê be. Ji bo vê, mifteya bingehîn, vêna civatî ye. Vêna civatî, bi bîrdoziyeke rastî û zanistî dinime. Ev bîrdoz, ji ezman ve nayêt û di mêjiyê civatê de li ser lingan ranaweste. Vêna civatî bi bîrdoziyek biyanî çênabe, di navendek de berhev nabe, nakeve lebatê. Ji bo vê qasî, divê mirov bingehek ji bo xebata zanyarî ya felsefî bibîne. Ev bingeh di çand û zimanê civatê de peyda dibe. Ev bingeh ji civatê re ne biyanî ye. Lê belê, pirraniya kesan hêj, jê nîne. Bi lêkolîn û lêgerînê ev derdikeve holê. Yên ku xebatên felsefî dikin, divêt zimanê wê civatê qenc bizanibin ku dîtina dinyayî ya nû li ser bingeheke zexim ava bikin.

Peywireke (wezîfeyeke) girîng a van mirovan jî, ev e ku zimanê civatê di warê felsefî de baş bikarbînin, xurt û dewlemend bikin. Zimanekî jar û xizan nikare vî karî pêk bîne.

Li gorî van nêrînên jorîn, divêt em di warê felsefî de bala xwe bidine netewa Kurd. Netewa Kurd, bi lezî diguhere. Ev guherandin, di her warê jiyanê de ye. Guherînên herî girîng, vêna netewî, azadbûna mêjî û vejîna zimanê Kurdî ne. Heya niha xebatên felsefî di nav çalakiyên partiyên rêzanî de hatine kirin. Kesek an jî, sazgeheke profesyonel di vê warî de çalakiyeke taybetî nekiriye. Pirsgirêk, nexweşî, derd, kul û nakokî di nav civata Kurd de pirr in. Çareserkirina van pirsgirêkan, dayîna têkoşîna rizgariya netewî, avakirina civatek nû û afirandina neteweyeke nûjen, bargiriyên li ser milên me ne. Ji bo çareserkirina van pirsan, vêneke netewî ya bi hêz divêt. Ev jî, hêzbûna nêrîna felsefa zanyarî dixwaze.

Ziman û çanda Kurdî, di binê du bandorên neyînî de ne. Di pêvajoya dîrokî de, nêrînên felsefa îdealîst û kevnare ku di civata Kurd de derketine holê, jiyana xwe di çand û zimanê Kurdî de didomînin. Ya din dagîrkeran nêrînên fermî di Kurdistanê de nimandine û bi cih kirine. Di gel van bandorên neyînî, bingeha nêrîna zanyarî di çand û zimanê Kurdî de heye. Ji ber ku Kurd civateke dîrokî û kevn e. Xebatên zanyarî kirine û şarezayiyên girîng afirandine. Jiyana karvanî nêrîna zanyarî dixwaze.

Dema lêkolîn û lêgerîn li ser zimanê Kurdî bi nêrîna felsefî bête kirin, bingeha felsefa zanyarî, dê bête dîtin. Nêrîna felsefa zanyarî li ser vê bingehê ava, geş û zexim dibe. Vêna netewî jî, girêdayî vê bîrdoziya civatî ye. Jixwe, pêşketina nêrîna felsefî bi çandeke netewî û bi zimaneke netewî gengaz e. Ev, ji hev nayên cuda bûn.

Di felsefê de nirxên gerdûnî û gelemperî hene. Divêt Kurd nirxên xwe yên civatî û nirxên gerdûnî(evrensel) bi hev bigihînin. Bi vî awayî çand û zimanê wî pêşve diçe, digihîje, xurt dibe û nirxên nûjen distîne. Li milê din nirxên gerdûnî, bi alîkariya çand û zimanê civata Kurd, xurt û dewlemend dibe. Lewma, her nirxek li ser rûyê erdê malê mirovahiyê ye.

Du pirsgirêkên girîngtirîn ên netewa Kurd hene. Di demeke nêzîk de çareserkirina van di karvanî de, ne gengaz e. Yê yekemîn, hebûna çar zaravên zimanê Kurdî ye. Yê duyemîn, Kurd û Kurdistan hatine parvekirin û bûne çar perçe. Bingeha çareserkirina van pirsan bi zeximkrina bîrdozeke bihêz têtе avêtin. Xebatên felsefa zanyarî, cuda û cihêbûna navbera zaravan û perçeyan dê roj bi roj kêm bike. Dê hişmendiyeke bihêz biafirîne. Dê çareserkirinan hêsantir bike.

Bi tevayî, nirxên netewî ne di zaravayekî Kurdî de ye. Divêt çand û nirxên netewî bi tevayî bigihîjine hev.

Ji bo afirandina çandeke mezin ya netewî, afirandina zimaneke netewî pêwist e. Bi zimaneke netewî çarçove, guncan (kapasîte) û bergeha ponijandinê fireh û zexim dibe. Ponijandineke azad û bi hêz, bergeha pêşdemê kûr û fireh dike, Çika (qabiliyet) ponijandinê, bi zanyariya felsefî dinime û geş dibe. Çekê mirovan ê herî girîng mêjî ye. Divêt Kurd mêjiyê xwe bi her awayî xurt, sînorên ponijandinê fireh bikin û wî baş bikarbînin.

Mifteya bingehîn ji bo serkeftinê ev e.

DI KURDÎ DE EYLETA BÊJE, BIWÊJ Û ORGANÊN MIROV

Amed TÎGRÎS

Her ziman, qanûn û prensîbên wî yên serbixwe û xas hene. Li gor qanûn, prensîb û taybetiyên zimanê Kurdî, carnan du bêje tên ba hevdu û dibin gotineke nû. Wateya wê jî, tê guhertin û wateke nû derdikeve holê. Carnan jî, bi alikariya pêşpirtik û paşpirtikan, gotinên nû çêdibin.

Ji aliyê bêje çêkirên an jî bêje afirandinê ve, zimanê Kurdî gelek dewlemend e. Ez dixwazim di vê mijarê (babet-konu) de, li ser organên mirov çend mînakên berbiçav (konkret) bidim. Wek dest, çav,poz,ziman, dev, ling, dil, pişt, diran, zik û hwd...

Bila xwedî û profesorên îdeolojiya fermî şerm bikin, ku digotin, "zimanê Kurdî ne ziman e. Ew ji 33 kelîmeyan pêk hatiye." Ka bila baş temaşe bikin, ku çawa ji bêjeyek çend bêjeyên nû hatine afirandin! Zimanê Kurdî di bin qedexe û talana hezar salan de, dîsa çiqas dewlemend û nêja ye!

Min ji derî wateyên bêje û biwêjan (maneyên kelîme û deyîman), hevokên mînak (cumleyên mîsal) di nav neynikê (" ") da bi kar anî. Ez bawer im, ku dê hin baştir wateyên bêje û biwêjan bê fêm kirin.

Ez hêvîdar im, ew kesên ku di peş de, li ser ferhengên Kurdî bixebitin, dê bikaribin fêdeyeke ji van mînakan bibînin.

SER

-1-

Ser: 1) Serê mirov an jî serê tiştekî. 2) car. Wek duser, sêser. " Cotê xwe duser bike ku erd xweş bibe. "Dirûna Sêser zû bi zû naqete."

Serî: 1) Tiştek, hebek. Wek pîvaz, an jî seriyek sîr. 2) Temam, rastkirin." Min armaca xwe bir serî"

Serik: Serikê qelûnê, serikê teşiyê û hwd.

Serberjêr: i) Sûcdar, bêşexsîyet. "Tu teslîmê polîs bûyî û te serê me berjêr kir." 2)berevraz. Bi Tirkî iniş.

Serbidev: Dev û rû. Ber meqlup.

Serbidew: Navê xwarineke Kurdî. Li hinek herêman ji meyirê re dibêjin serbidew.

Serdem: Dema nû, çaxê nû. "Serdema serxwebûn û azadiyê ye."

Sere: Bi emir, bi temen.

Serbene: Jivên ku mêwan lê dipêçin.

Sereke: Herî baş. "Ev gayê min yê herî sereke ye."

Serbirin: Qetilkirin. Serjêkirin.

Seredan: Ziyaret, serîlêdan. "Em, biseredana we gelek keyfxweş bûn!"

Seranser: Hemû tev. "Seranserê Kurdistanê şer e!"

Serêşî: Eşa serî, 2) bela, problem. "Ji me re serêşiyan çênekin lo!"

Serhawa: Strana sibehê, an jî yên bi xemgîn. "Di da-

wetan de, her sibehê pêşî serhawa lê dixin û paşê dest bi govendê dikin."

Serkirdayetî: Birêvebirina herî sereke. Bi Tirkî üst dûzeyde yöneticilik.

Serî ili hevdan: Li hevdu xistin, pevçûn. "Me serek li hev da"

Serîhildan: Raperîn, rabûn desthilanîn. Îsyan.

Serserî: Beredayî, qeşmer, pêxwas.

Serserîtî Karû barê serseriyan. "Serserîtiyan neke, êdî bes e!

Serbajar: Paytext, başkent

Serpiyan: Li ser lingan. "Heta 90 salan li ser piyan mayîn zehmet e."

Ser lingan: Li ser piyan

Serker: 1)Rikok, inatçı. Silo mirovekî serker e. Mirov bibêje-nebêje fêm nake. 2)sermezin. "Serê wî wekê serê ker e."

Serpişt: Li pişt. "Ser pişt li erdê ketim."

Sertac: Taca serî, bi rûmet. Navê lawan e.

Sertenişt: Li ser kêlekê. "Ew li ser tenistê ket erdê."

Serîmizdan: Ji heq derketin, bersivdan. Mal şewitandin. "Me serê wî mizda!"

Serîrakirin: Rabûn, serîhildan. "Kurdan dîsa serîrakir."

Serenav: Navê taybetî, özel isim.

Serîtewandin: Teslîmbûn, bêdeng mayin. "Em ji zordariyê re tûcarî serî natewînin."

Sergerm: Nezan, bê tecrûbe, bi hêrs rabûn û rûniştin. "Tu hê xortî, serê te germ e, tu naxwazî fêm bikî."

Sersar: Bê diqet, bê berpirsiyar. "Tu çi mirovekî sersarî lo! qet bala xwe nadî derdora xwe!

Sersarî: Bê dîqetî, bê berpirsiyarî. "Sersariyê mala me xerab kir."

Serwext: Kesê têgihiştî, zana." Beşikçi di mesela Kurd de kesekî serwext e."

Serwextî: Têgehîştandin, zanabûn.

Serberdan: Bê xwedî, bê dîsîplîn, beredayî. "Zarokên serberdayî dikarin her tiştî bikin."

Sergevaz: Nav û deng. Navdayî.

Serşok: Banyo, cihê serşûştinê.

Sermest: Bi kêf û çoş bûn. "Herçî Licî, bi avê sermest dibin."

Serad: Bêjinga gir

Seraddayîn: Wek genim û ceh di mehên nîsan û gulanê de srî an jî guşî dayîn.

Serevan: Servan. Navekê lawan.

Serhev: Di carekê de, bi hevdu re. "Ez malê xwe li ser hev didim."

Serhevde: Biçûk dîtin, minet lê kirin. "Ji ber gotinên ne baş ên bavê min, serhevdan nede serê min lo.!"

Serekanî: Serê kaniyê, cîhê av jê derdikeve.

Serkêran: Darên biçûkên davêjin ser kêranên xanî

Serbidims: Navê xwarineke Kurdî ye. Ji savarê çêdikin û dimsê lê dikin. Li hinek herêman jê re serzêrîn jî dibêjin.

Serbêjing: Hilbijartî, niqandî, "Ez dê sê olçek-kod genimê serbêjing bidime te."

Serçivîk: 1) Yên ku serên wan biçuk in, 2) Ji bo kesê bê hiş tê gotin." De here lo serçivîkê min, tu ji kû dizanî, ev rast e."

Serberdayî: Bê xwedî, bê dîsîplîn. "Te serê zarokê xwe berdaye, tu nabêjî dê çi li wan bê?"

Serçavî: Serkanî. Cîhê ku av ji wê derdikeve.

Serêş: Bela, problem. "Ji me re serêşiyan dernexe." 2) êşa serî.

Serhed: Navê herêmekê Kurdistanê. Herêma Bakurê Kurdistanê. Wek Erzerom, Qers, Wan, Agirî, Elezîz û hwd.

Serhişk: 1) Rikok, înatker, 2) bê hiş. "Ka li min û li vî serhişkê mala Taco binêrin kuro."

Serinc: Dîqetî, baldarî. "Qisekirina Serok gelek serinca min kişand."

Serîdan: Serî û guşîdana genim û ceh. "Genimê me mezin bûye û serî daye."

Serkurkirin: Por kuşandin, traşbûn.

Serjekirin: Serê heywanan jêkirin. Kuştin.

Serjinik: 1) Ew kesê ku guhdariya jina xwe dike. "Dev ji wî berde, ew serjinik e û ji malê dernakeve." 2) tirsonek.

Serlîstikvan: Yê an ya ku lîstikê dikşîne. Ji mirovê di fîlim an jî, di tiyatroyê de rola herî girîng û sereke dilîze re tê gotin.

Serbazirgan: Serokê bazirgan, serokê tucaran.

Serwehş: Serhişk,înatçi. "Tu çi serwahş î!"

Serkan: Serçavî, bi Tirkî kaynak.

Serkar: Berpirsiyar, rektor, serek. "Serkarê kovara Rewşenê daxuyaniyekê da çapemeniyê ku li ser kovara wan zordestiya dewletê heye."

Serkele: Hesina ku dikin serê heywanan.

Serkêş: Yê ku serî dikşîne."

Serîxwarin: Wendakirin, pêşberê belayek bûn, helkirin. Kuştin. "Te dît çawa xelkê Romanyayê serê çawîş xwarin."

Serok: Reis, lîder, başkan.

Serokkomar: Reîsêcumhur.

Serokwezîr: Serokwekîl, başbakan.

Serokeşîr: Serokê eşîrê.

Serqot: 1)Serî jêkirin. "Serê bizina me jî qot kirine." Kesê ku serê wî vekiriye. Bê kum, bê şewqe, bê melhef. "Ez ne serqot hatim vir, kum li serê min bû."

Serleşker: Serbaz, qumandar.

Sersot: Derê ser şewitî. "Sersotekê agir ket nav kayê û xanî şewitî."

Serkarwan: Serok û berpirsiyarê karwan û bazirganan.

Serşeh: Hiriya bi qelîte. "Min îsal li Serhedê 25 kilo hiriya serşeh kirrî û anî Amedê."

Serbanî: Serê xanî ku mirov havînan li wir radizê. Li hinek herêman dibêjin serxanî.

Serxanî: Serbanî. Li welêt mirov havînan li ser xanî radizê.

Sersindir: Kesên sermezin ên ku serê wan naxebite. Kesên bê hiş. "Ka li vî sersindirê han binêrin, çi dike!

Sersîndir: Mîrkut, destiyê cirnê

Sersêl: Nanê silê yê teze.

Sergovaendger: Yê an ya ku serê govendê dikşîne. "Govendgerê we kî ne, ka bila ji kerema xwe re rabin govendê?

Serşuştî: 1) Kesê ku serê xwe şûştî ye. 2) Kesê paqij ê ku karê xirab nake. "Misto mirovekî dest û serşûştî ye. Ew karê xirab nake."

Serşûştîn: Mirov serê xwe dişo, 2) Ji aliyê bîr û baweriyê ve çewt fikrandin, Xapandin. "Serê te bi Kemalîzmê hatiye şûştin."

Sererast: Têkuz, rastkirî, hevgirtî. "Ez vê nivîsa te sererast dikim û ji te re dişeynim."

Sererastkirin: Têkuz kirin, rast kirin. "Ta ketibûn nav hevdu, min bi zor sererast kir."

Sernav: Sernivîsar,bi Tirkî başlık.

Serpozê axaftin: Ne ji dil û can axaftin. "Min do Mereto dît, bi min re bi ser pozê axaft.

Ser de gav avêtin: 1)Ser de derbasbûn, 2)Ne hesab kirin. "De gava xwe di ser de bavêje û here. Ew kî ye ku tu hesaba wî dikî?"

Sergotar: Gotara sereke, bi Tirkî başyazı.

Serbişûr: Curekê masiyan (kılıçbalığı)

Sernegirtin: Vala, bê encam.

Serûk: Melhêf, çît,laçik.

Serve:Têrker, tümleç.

Serwer: Reîs, serok. "Mirovên serwer divê bi his û giran bin."

Serxwarin: 1)Qeza-bela "Te serê B. Ecevit xwar." 2) Serê tiştek an jî, heywanek xwarin. "Kûçikê me serê bizinê xwar û qedand."

Serzelût: Gurî, keçel. Dazlak.

Seroqûn: Tiştên ku bi ser dev bikeve. "Tasa avê seroqûno bû."

Sernivîsar: Sernivîs.

Servekirî: Ne sergirtî.

Sergirtî: Ne servekirî, pêçandin.

Sertîp: Delaltir, xweştir. Navê lawan.

Serpîl: Bilind, berz. Navê keçan.

Sergul: Seroka gulan. Gula herî baş.Navê keçan.

Serî bi serî: 1) Raste rast. 2)Du kes an jî, heywan dema serên xwe didin hevdu. Li hevdu dixin.

Sernizim: Xwediyê sûc û qebehetan. "Kesê xwefiroş tim sernizm e."

Serçin: Darê çaqulî ku bi serê werîs ve girê didin. Li herêma Licê dibêjin herçin, an jî heçî.

Serîlêdan: Serîdan, ziyaret kirin.

Serîlêxistin: Serîlêdan, ziyaret.

Serîbişkaftin: Destpêkirina vekirna serê tiştek. Pişkaftina serê gore an jî lepikê. 2)Destpêka dîyar û zelalbûna bûyerek. "Bûyera Wedat Aydin pişkifî. Dê hêdî hêdî derkeve meydanê."

Serîketin: Destpêk. "Serî ketine mîhên me, dê yeko yeko bizên."

Serîwarkirin: Serîçimandin, serî xwarkirin.

Serîfirkandin: Kuştin, serî jê kirin.

Serxweş: Ew kesên ku alkohol vexwarine û serxweş bûne.

Serxweşî: 1) Ew kesên ku bûyereke mirinê an jî, belayeke mezin bi serê wan ve tê, mirov dixwaze here û serê wan xweş an jî sax bike. Bi Tirkî başsağlığı. "Em herinserxweşiya hevalê Murad., birayê wî şehîd ketiye." 2) Bûyera ew kesên ku vedixwin û serxweş dibin.

Serkundir: Yên ku serê wan naxebite. "Dev jê berde lo! Ew morovekî serkundir e, tiştekî fêm nake." 2) Ji kesê ser mezin re tê gotin.

Sertûj: Ew kes û tiştên ku serên wan ne gilover be û hinek tûj be.

Sergij: Yên ku porên xwe şeh nakin û porên wan gij e.

Sergêj: Ew kesên ku hinek hişên wan ne li serê wan be. Nîv dîn.

Sergêjî: 1) Problem, asteng, nexweşî. "Sergêjiyên me gelek in. Em kîjan çareser bikin, kîjan nekin." 2) êşa serî.

Serke(f)tin: Qezenc kirin, serfirazî. "Di vê dozê de em dê biserkevin."

Serqerpal: Keç an jina ku serê xwe naşo û şeh nake. Hejik jî dibêjin.

Sersifirne: Ji zarok an xortên ku serê xwe wek qeraxê şewqê kur dikin re dibêjin.

Serîgirêdan: 1)Girêdana şerê tiştek, 2)çareserkirin, helkirin.

Sermiyan: 1)Pere yê ku di dest de heye. 2)Ji kesê mezin ê malbat, êl û eşîrê re dibêjin.

Sermiyandar: Xwediyê peran.

Sermaye: Sermiyan.

Serûpê: Ser û piyên heywanan, kelepaçe.

Serûçav: Dest û rû. "Ser û çavê xwe baş bişo!

Sermil: Ser mile mirov. Li hinek herêman girmil jî dibêjin.

Serata: Pêşin, sereke. "Min li Bedlîsê dibistana sereta (îlkokulê) xwend."

Serbilind: Bi şeref, serfiraz, serberz. "Ez ji ber lawê xwe ve serbilind im."

Serbilindî: Bi rûmetî, bi şerefî. "Ez li her derî bi serbilindî dibêjim, ez Kurd im."

Serberz: Serbilind.

(Bi) ser ve bûn: Dîtin, rast hatin. "Edresa we gelek zehmet e. Ez bi zor bela bi ser mala we ve bûm."

(Bi) ser ve girtin: 1) Teslîm standin. "Polîs bi ser mala me ve girt." 2) Bê agahdarî serî lêdan.

(Bi) ser û ber: Bi rêk û pêk, bi plan. "Huseyîn Denîz mirovekî bi ser û ber bû."

(Bi) serê xwe: 1)Bi tenê, bê qelebalix. 2)Ne bi alîkarî û piştgiriya yekî din. "Min bi serê xwe 5 milyon pere berhev kir."

(Bi) ser û belate ve çûn: Ji binî ve wendabûn. "Du meh in ku çêleka me bi ser û belate ve çû. Em dikin-nakin wê nabînin."

(Bi) serî derketin: Ji bo ew kesên ku yek nikare wan mexlup an jî kotrol bike. "Tû kes nikare bi gotinan bi te re bi serî derbikeve."

(Bi) ser ve girtin: 1) Degîrkirin. "Di şeveke de Saddam bi ser Kuweytê re girt." 2) Ji bo teslîmbûnê der û dor lê girtin. 3) Ji bo gazind û loman dîtin û axaftin . "Bi xwe de me bi ser te ve girtiye û em hatine mala te. Divê tu çend milyon pere bi deyn bidî me."

(Bi) ser re hatin: 1) Bi tesadufî bi ser de hatin. "Haya me bi hatina Diljen tune bû, hema em bi ser re hatin." 2) Dema yek sûcek an jî, karekî xerab bike bi ser re diçin û ew protesto dikin." "Em bi ser te re hatin ka tu ji me re dibêjî çi?"

(Bi) ser û piyan ve wendabûn: Ji binî ve wendabûn. Bi ser û belate ve çûn.

(Bi) serçavan de hatin: Bi xêr hatin.

(Bi) servegirtin: Dagîrkirin, işgal kirin.

Ser ve çûyîn: Bê tirs bi ser yekê an jî, meseleyekê ve çûyîn û derxistina wê.

(Bi) ser de çuyîn: Ji bo îş û karekî mirov zêde dîqet neke tê gotin. Wek, "Zêde wextê xwe nede pê, hema bi ser de here."

(Di bin) serî de derketin: 1)Tişek ku di bin serê mirov de derkerver. Wek di bin balgiya serî wî de çek derket. 2)Plan kirina ku ji aliyê wî kesî ve tê çêkirin. "Ev tiştên ne baş hemû di bin serê Serbest de derdikevin."

(Di) ser û çavên xwe de dan: 1)Tiştekî ku mirov di ser û cavên xwe de dide. Wek boyaxê. 2)Kar herimandin, ji heq nederketin. "Tu û nivîskarî! Te gramer nivîsand? Na... Tew, te di ser û çavê xwe de da û herimand!"

(Li) ser qukna xwe rûniştin: Tobe kirin, poşman bûn. "Ew çû welat û rastiyê dît. Paşê li ser qûna xwe rûnişt."

(Li) ser ziman: Mirov dizane, lê nayê bira mirov. "Navê wê li ser zimanê min e. Em niha li ser zimanê her kesî ne."

(Li) serlingan: Zû, acele, bê wextî. " Zê de wextamin tune bû hema min li ser lingan bi Evînê re qise kir."

(Li) serxwe: Zînde, dinç, sağlıklı.

(Li) serserî gerandin: Gêjbûn. Eşa serî ya giran. "Piştî xwarinê gêja min çû û ez li serserî geriyam. Hindik mabû ku ez bimirim."

(Li) ser danîn: Li ser tiştekî hazir danîn û xwarin. "Ez ji esker hatim û li ser mala xezûr danî."

(Li) ser serê xwe dayîn: 1(Mirov tiştekî dide ser serê xwe. 2) Rûmet girtineke bilind û mezin. "Heger tu bê em dê te li ser serê xwe dayînin."

(Li) ser tiliyan bi rê ve çûn: Qure, qebeday.

Serûçav çêkirin: Lêdan, dan tobe kirin. "Bi Xwedê ez rabim ser xwe, ez dê serê çavê te çêkim ha.!"

Ser li ber: Xaîn, alçax, sînsî. "Tahîr Adiyaman mirovekî ser li ber e."

Serzik: Xwe bi serzik kişandin.

Seriyo qurbana lingan: Ji ber tiştek bazdan. Bi lez û bez bazdan. "Teko dema çav bi me xist, seriyo tu qurbana lingan, bazda û çû."

Serserqot: Serqot. Servekirî. Bê kum û melhêf.

Serserqot ji binê hevdu derketin: Pevçûn, li hevdu xistin. "Bi Xwedê min hêrs neke, dê weha bibe, ku em serserqot ji bin hevdu derkevin ha!"

Ser dide sir nade: Bê kuştin jî, gotin ji dev demakeve.

Sergo: Cihê sergînê li wir kom dikin. Toplik.

Serûgo: Heziriya cil û bergan kirin. "Ez herim bajêr ji zarokên xwe re hinek serûgo bikirim.

Sergoşt: Yên ku serê wan naxebite, kêmhiş. "Sergoştê min, ma tu çi fêm dikî!"

Sero bin (ser û bin): 1. Tevlîhevî, ji serî heta binî, "leşkeran çenteyê min sero bin kirin."

Ser û bin serad kirin: Qul kirin, perçe perçe kirin. "Leşkeran ser û binê çanteyê min wek serad kirin."

Ser û çev neşûştî: Bêşerm, rûgayîş, rûçerm. "Tu mirovekî ser û çav neşûştî yî. Qet şerm nakî!"

Serûbin bûyîn: Devberjêr bûn, sero-quno bûyîn. "Hêzên dewletê, Şirnexê serûbin kirin."

Serû qûno bûyîn: Serûbin bûyîn.

Ser lê gerandin: Teşxele û bela bi ser de hatin. "Te di wextê xwe de perê me neda, bankê serî li me gerand û me da mehkemeyê.

Ser lê werimandin: Aciz kirin, pirrdeng kirin, gêj kirin.

Ser bû kuwara mêşan: Gêjbûn, xîntbûn. "Ma êdî hiş maye... Serê min bû wek kuwara mêşan."

Ser ket ber bûn: Şermkirin, xwe sucdar hesab kirin. "Me gotinên xwe neanî cih û serê me ket ber me."

Ser serî çûn: Ji binî ve wenda kirin, têkçûn. "Ew di mesela polîtîkî de ser serî çûn."

Sermosile: Perçeyeke aletê cotê.

Serşivan: Serokê şivanan.

Serwerîs: Gopelê ku bi serê werîs ve dikin.

Serpale: Serokê paleyan.

Serrez: Dema jêkirina tiriyê. Bi Tirkî "bağbozumu".

Serbêderan: Dema bêderan.

Serêş kirin: Aciz kirin, pitpit kirin. "Bes e, te gellek qise kir, te serê me reş kir, lo!"

Ser di rê de dayîn: Ji bo armanca ku mirov pê bawer e û di vî warî de mal û canê xwe feda dike. "Ezê serê xwe di riya şoreşa Kurdistanê de bidim."

(Ji) serî derketin: Xwe winda kirin, bê edeb...

(Ji) serî derxistin: Ji rê derxistin, bê şexsiyet kirin, xapandin.

(Yek) ser: dîrekt, dosdoğru.

Tarih Bilinci

M. Sait ÜÇLÜ

Bugün emekçi halkımız ve onun yiğit çocukları, tarihin en görkemli eylemlerini gerçekleştiriyorlar. Ülkemiz devrimsel bir süreci yaşıyor. Devrim, insanoğlunun en yüce eylemidir. Geriyi, eskiyi ve çürümüş olanı yıkar; yerine gelişeni, iyiyi, doğruyu, güzeli ve yeniyi kurar. Bu aynı zamanda devrimcilerle, reformistler ve anarşistler arasındaki öz ayrımdır.

Eylem; harekettir. Hareket yaşamın özü, değişim ve gelişimdir. Değişim ve gelişim; az olandan çok olana; alt olandan üst olana; basitten karmaşığa doğru diyalektiksel bir sürekliliktir. Bu açıdan devrimcidir.

Oluşum süreci ve kökeni bakımından eylem, düşünceden önce gelir. Düşünce nesnelin yansımasıdır. Doğru düşünce oluşturmanın yolu, doğru eylemden geçer. Doğru eylem doğru düşüncenin anasıdır. Doğrulandığı oranda eylem; etkileyici, dönüştürücü bir etken olur. Eylemde doğrulanmayan düşünce, eylemin gerçeğinde tutunamaz, toprağın yeşertici gücünden yoksun, rüzgara kapılmış kuru bir dal gibi etkisiz ve güçsüz olur. Toprak, halk veya sınıf gerçekliği oluyor. Bu açıdan kitlelere taşırılamayan, kitlelere mal edilemeyen ideolojiler ölü bir dogmalar yığınından öte bir işlev görmezler. İdeoloji; kitlelere devinimin görkemli eylemlilik sürecine katabildiği oranda doğrulanır, bir anlam ifade eder.

Ama eyleme kılavuzluk eden doğru düşünce olmadan da doğru eylem gelişmez. Teori olmadan pratik olmaz. İkisi bir bütünlük oluşturur.

Sınıfların ve halkların gerçekleştirdikleri eylemler bütünlüğü, tarihi meydana getirir. Tarih bilinci; yükselen tarihsel eylemlerin pirizmasında kırılarak oluşur ve onlarla bir bütünlük içinde gelişir. Tarihsel bilinci, "geçmiş" ve "gelecek" ten koparamayız. "Bugün"; "geçmiş" ve "gelecek"in diyalektik birlikteliğini sağlar, ikisini kendisinde somutlaştırır.

Devrim; Kürt insanını, Kürt halkını değişime uğratmanın dinamosu oluyor. Değişen insan geçmişin köhnemişliğini yıkarak geleceği kuruyor ve yeni bir tarih yazıyor. Tarihimiz kanımızla yazılıyor. Beyinlerimiz, bedenlerde tutuşan Newroz ateşinin ışıltısıyla aydınlanıyor. Aydınlanan tarihsel bilincimiz geleceğin yolunu çiziyor, daha etkili ve güçlü eylemlerin yaratılmasında aktif rol oynuyor.

Bu yolda ilerlemek için, geçmişi eleştiri süzgecinden geçirip, doğru ve yanlışları bilince çıkarmak gerekiyor. Doğruları sahiplenmek, günün kazanımlarını kalıcılaştırmak, zafere emin adımlarla yürümek demektir. Bugünün eylemsel sürecini "dün" ve "yarın" ile doğru bağlantılandırmak, doğru bir tarih bilincine erişmenin biricik yolu oluyor.

Bugün halkımız, bu yolda yürüyor... Böyle bir tarih bilinciyle, serîhildanlar gerçekleştiriyor. Özgürlük savaşçıları son mermiyi, son bombayı düşmanın eline geçmemek için kendinde patlatma kahramanlığını gösteriyor. Özgürlük tutsakları, tüm ümit yollarının kalın beton duvarlarla barikatlandığı Diyarbakır zındanlarında irade ve inancın gücüyle, kurtuluş umudu olup zafer kapılarını aralıyorlar. Zındanların kuytuluğunda 21 Mart'ta Newroz ruhuyla çakılan üç kibrit çöpü; insanoğlunun en yüce iradesini sergileyen Dörtlerin bedeninde tutuşan ateş; düşmanın umudunu dinamitleyen 14 Temmuz Büyük Ölüm Orucunun inanç ve kararlılığı, yeni bir tarih bilinci oluyor. 21 Mart, 17 Mayıs, 14 Temmuz Kürt halkının çağdaş başkaldırı tarihinin anahtarlarıdır. Zekiye ve Rehşan'ların bedeninde tutuşan ateş dörtlerin izdüşümü değil midir? Zindanlardan dağlara, kentlere taşırılan ateş, bin yıllık karanlığımızı aydınlatıyor.

Aydınlanmanın şafağı, karanlığın ve bilinçsizliğin bitimidir. Karanlığın bitiminde tarihimiz gülperili altın tahtını kuruyor. Aydınlanma; köleliğin karanlığına tutsak düşmüş beyinleri zincirlerinden koparıyor. Zincirleri koparan eylemler, beyinleri özgürleştiriyor. Özgürleşen beyinler, ülkeyi, halkı ve işçi sınıfını özgürleştiriyor.

Oluşan yeni tarih bilinci, binleri, onbinleri, yüzbinleri eylem sürecine sokuyor. Kitleselleşen eylem, özgürlük hareketini daha da boyutlandırıyor. Bağımsızlık ve özgürlük; insanlarımızın kan-can bedeli geliştirdikleri eylemlerle kazanılıyor. İleriye atılan her adım, kazanılan her mevzi; diş ile, tırnak ile, düş ile düşmandan sökülüp alınıyor.

Alınanlar, kazanılanlar yeni bir tarih oluşturuyor.

Tarih; sınıflı toplumlar gerçeğinde, özünde, "sınıflar mücadelesi"dir. Temeli ekonomik nedenlere gömülüdür. Ezenle ezilenlerin, sömürenle sömürülenlerin, sömürgeci ile sömürgelerin, işgalci ile işgale uğrayanların mücadele öyküsüdür. Aydınlıkla karanlığın, iyilikle kötülüğün, güzellikle çirkinliğin, tarihsel

areneda, eylemsel, düşünsel, ahlaki, felsefi, siyasi, kültürel ve estetik alanlardaki çatışmasıdır. Bu çatışma kendisiyle birlikte, bir tarih bilincini de oluşturuyor.

Bilimsel tarih bilinci, Marks-Engels tarafından tarihsel materyalizmin oluşturulmasıyla biçimlenmiştir. Tarihsel materyalizm, tarihe doğru bilimsel bir bakış açısını kazandırmış; tarihi, kişilerin keyfi, cesaret ve istemlerinin bir ürünü olduğu anlayışından kurtarmış, onu sınıf mücadelesi gerçekliğine kavuşturmuştur. Tarihsel materyalizm silahı ile, ezilen sömürge halklar ve işçi sınıfı, doğru mücadele yolunu seçme imkanına kavuşmuşlardır.

Dününü bilmeyen halk bugününü yaşatamaz. Bugünü olmayanın yarını da olamaz. Tarih bilinci, bu diyalektik birlik üzerinde biçimlendiği oranda, özgürleşme ve aydınlanmanın bir aracı olacaktır. Bu ögelerden herhangi birinin yokluğu, bir canlının temel uzuvlarından birinin eksikliği gibidir. Tarihsel materyalizm bu sakatlığı gidermiştir. Çünkü tarihsel yasaların varlığını ortaya koymuştur.

Tarihsel yasalar insan bilincinden bağımsızdırlar. Ama insan bu yasaları doğru bir tarzda algılayıp bilince çıkardığı oranda, kendi çıkarları doğrultusunda kullanabilir, üzerinde denetim sağlayabilir. Her ne kadar tarihsel yasalar insan bilincinden bağımsız ise de, insanın olmadığı bir yerde toplumsal-tarihsel yasalar da olmaz.

Toplumsal yasalar kendiliğinden işlemez. Tarihin "yürü kulum" dediği yerde, bir halk ve sınıf bu tarihsel fırsatı iyi değerlendirip yürümesini bilirse, tarihsel yasalar üzerinde denetim kurabilir. Ama, "nasılsa güneş doğacak" mantığıyla, bu evrimci reformist anlayışla, özgürlük mücadelesi için "örgütlenmeye ne gerek var" denilirse, tarihsel yasalar o halkın aleyhine işlemeye başlar. Zira koşullar ne denli elverişli olursa olsun, devrimci bir mücadele tarzı ve tarih bilinci olmaksızın, kendiliğinden kurtuluş sağlanamaz, özgürlük elde edilemez. Çünkü tarihsel yasalar, güneşin doğuşu yasası gibi kendiliğindenci değildir. Burada şu gerçek ortaya çıkıyor. Tarih bilinci, doğru bir tarzda, tarihsel yasaların zorunluluğunun bilincine varmak oluyor. İnsanın iradesi, müdahalesi, insan eylemiyle tarih yasaları ortadan kaldırılamazlar; ama yön değiştirirler. Tarih bilinci, böylesi bir zorunluluk üzerinde oluşuyor. Bu bilinç, halkın, sınıfın kendi kaderini kendi eline alma bilincidir. Bu bilinç, alt-üst oluşum dönemlerinde halkların özgürleşmesinde aktif bir rol oynar. Tarih bilincinin böylesine aktif rol oynamasına tarihin bir çok döneminde rastlanır.

18.Yüzyılın son çeyreğinde oluşan jakoben bilinç, feodalizme karşı yükselen devrimsel sürecin en yüksek ifadesi olan Fransız ihtilalinin çocuğu olarak doğmuştur. Burjuva tarih bilinci kendisini en iyi şekilde Robespierre, Marat vb. önderlerin öncülük ettiği devrimde ortaya koymuştur. Proleter tarih bilinci daha bu dönemde, bir nüve halinde Babeuf'ların eylemsel sürecinde ortaya çıkar. Babövizm daha o dönemde, "Eşitler Cumhuriyeti"nin kurulmasını, sömürü düzeni ve eşitsizliğin yok edilmesini öngörüyordu. Ereklerine ulaşmak için devrimci eylemleri savunuyorlardı. Tarihsel koşullar Babeuf'ün bilimsel sosyalizmi oluşturmasına, tarihsel materyalizmi geliştirmesine olanak tanımadı. Bu görevi tarih, Marks ve Engels'e vermiştir. Babeuf, idealleri için yaşamını bedel olarak verdi. Babeuf, burjuvazinin yükseliş çağında proleteryanın devrimci eyleminin ilk nüvesi, ilk mayası olma onurun elde etti.

20.Yüzyılın şafağında doğan Ekim devriminin yarattığı yeni kişilik, yeni eylem süreciyle birlikte yeni bir tarih bilinci de yaratmıştır. Bu bilinç gelişmeyi, dönüşümü, ilerlemeyi, eylemi, atılganlığı, cesareti, üretkenliği, kahramanlığı ve özgürleşmeyi temsil eder. Simgeleşmiş adıyla Bolşevik'liktir bu. Bolşevik anlayış bakış açısı yorumlayış tarzı ve tarih bilinci, bir halklar hapishanesi olan Çarlık Rusyası'nda egemen olan tarih anlayışı ve bilincini yerle bir etti. Halkları, insanları çarın kulları olarak gören; tarihin oluşumunu Petro'ların, Katerina'ların, Aleksandr'ların kişiliğinde yanılmaz bir kader olarak gören idealist tarih anlayışı yerine; tarih, sınıflar mücadelesidir anlayışını geliştirdi. Bu, halkların ve işçi sınıfının kendi tarihleri kendilerinin yazmaya başlaması demekti.

Bolşevik tarih bilinci Rusya koşullarında işçi sınıfı ve ezilen halkların, Bolşevik kişiliğin öncülüğünde köhnemiş Çarlık düzenine karşı yükselttikleri eylemsel sürecin bir ürünü olarak biçimlenmiştir. Daha da somutlaştırmak gerekir. Bolşevik tarih bilinci, Lenin, Babuşkin, Sverdlov, Stalin ve Kalinin'de somutlaşan önderliğin yarattığı eylemsel sürecin düşünsel ifadesidir.

Bolşevik ruh, Bolşevik militanlık geleneği köhnemiş zulümle örülü Çarlık düzenini yıkma inanç, irade ve kararlılığı Bolşevik tarih bilincinin mayasını oluşturuyor. Bu bilinçle çarlığın yüzyıllar boyunca halklara yönelik baskı mekanizmasının yarattığı sonuçlar ve bunun yıkılması için halkların geliştirdiği mücadele, diyalektik ve tarihsel materyalizm bakış açısıyla yorumlanarak, tarih bilincinin geçmişle bağlantısı doğru tarzda kurulmuştur. "Geçmiş", "bugün"ün "yarın"a varmasında miras haline getirilmiştir. "Dün" "bugün" ve "yarın" birliktelik oluşturmuştur.

Bugün Kürt halkı da içinde bulunduğu devrimsel süreçte, böylesine bilimsel bir tarih bilincine erişiyor. Genelde olduğu gibi ülkemizde de doğru bir tarih bilincinin yolu öncelikli olarak, mevcut toplumsal kuralların doğru çözümlenmesinden geçiyor.

Halkımızın bugünkü tarih bilincinin çıkış noktası, içinde yaşadığı toplumsal koşullardır. Bu kölelikten özgürlüğe varmak, çözümsüzlüğü çözüme kavuşturmak, bunun araç-

larını yaratmak, en geniş ifadeyle dönüşümü sağlamak için gerçekleştirdiği "eylemler" "Kürt Tarih Bilinci"-nin üzerinde şekillendiği nesnellik oluyor.

Ülkemizde bu yeni Tarih bilinci PKK gerçekliğinde somutluk kazanıyor. Yeni "Kürt Tarih Bilinci" halkımızın Bağımsızlık ve Özgürlük mücadelesinin bir yansımasıdır. Ancak, bu salt bir yansıma değildir. Mücadelenin yükseltilip ilerletilmesinde etkin ve aktif bir işleve sahiptir. Tıpkı nesne ile öznenin; öz ile biçimin ; iç ile dışın birbirlerini karşılıklı etkilemesi ve koşullandırması gibi... Özgürlük Hareketi.. Özgürlük şehitleri.. Özgürlük Savaşçıları.. Özgürlük tutsakları.. Bunlar yeni bir tarih bilincinin adıdır. Bu tarih bilinci, halkımızın tarih sahnesinde ve çağdaş halklar arsındaki onurlu yerini alması sürecine müthiş bir etkide bulunmaktadır. Bu devindirici, dönüştürücü bir etkendir.

Yalnız doğru çözümleme ve belirlemeler yetmez. Doğru çözümlemenin yanında halkımızı kölelikten kurtarmak için doğru bir çözüm yolu yaratmak, göstermek de zorunluluk haline dönüşüyor.

Tarih bilinci, bugünün üzerinde geleceğini inşa ediyor. Demek ki, doğru bir bilinçlenmenin yolu, doğru bir geleceğin hedeflenmesiyle mümkün oluyor. Doğru hedef, aydınlığa varmadır. Yanlış hedef köleliğin karanlık deryasıdır. Aydınlık, bağımsızlık ve özgürlük şiarıdır. Bu olmadan, Kürt halkının tarih bilinci yanılgılı olacaktır.

Çünkü "otonomi"yi amaçlayan, "reformist" işbirlikçi, uzlaşıcı yol ve yöntemler çözüm değildir. "Otonomi", ülkemiz koşullarında emperyalizm ve sömürgeciliğe bağımlılık demektir. Zaten yüzyıllardan beri yapılan da bu değil midir? İşbirlikçi teslimiyetçi güçlerin öncülüğünde öngörülen hedefler Kürt halkının tarihi bilincinin yanlış, yanılgılı ve çarpık geliştiriyor. "Otonomi", "kültürel özerklik" vb.hedefleri halkımızın önüne koymak, geleceğe dönük tarihini böyle belirlemek halkın yarınını peşinen karartmaktır. İçinde bulunduğu bataklıktan daha kötü, daha kokuşmuş bir bataklığın içine çekmek ve kendi çıkarları uğruna köleliğin zincirlerine mahkum etmektir. Halkımızın kurtuluş mücadelesi açısından bütün bunları günün koşullarına uygun olarak çok iyi bilince çıkartmak gerekiyor. Bu açıdan günü doğru tahlil; geleceği doğru belirlemek yetmez. Bu günü yıkıp, yarını kurmak için, dünü doğru bir tarzda bilince çıkarmak gerekiyor.

Dün halkımızın başkaldırıları niye başarıya ulaşmadı? Bu başkaldırılara öncülük edenlerin tarih bilinci, sınıf karekterleri neydi? Düşmanla nasıl bir ilişki içine girdiler? Nasıl bir direnme geliştirdiler? Hangi müttefiklerle mücadeleye katıldılar? Kimler direndi? Kimler teslim oldu? Kimler ihanet etti? Bütün bunları geçmiş tarihimizin gerçekliğiyle bilince çıkarmak yaşamsal önemdedir.

Çünkü halkımızın tarihi yüzyıllardan beri tersyüz edilip, kendi karşıtına dönüştürülmüştür. Kötü, iyi; çirkin, güzel; şarlatan, kahraman; teslimiyetçi, direnişçi diye gösterilmiş, işbirlikçilik tek geçer yol olarak ortaya sürülmüştür. Çarpık, yanlış bir tarih bilinci geliştirilmiştir. İşbirlikçiler iyi, direnenler ise "vatan haini" olarak lanse edilmiştir. Bu çarpıklık, sömürgeci güçler ve işbirlikçilerinin çıkarlarının bir ifadesidir.

Günü doğru algılamak, geleceğe tökezlemeden yürümek için geçmişi doğru bir tarzda miras haline getirip ders çıkartmak zorunluluk haline geliyor. Geçmişi doğru değerlendirmek, tarih bilincimizin bir ayağını sağlam oluşturmak demektir.

Görüldüğü gibi tarih bilinci bir çeşit toplumsal bilinçtir. Sınıf veya halkı aydınlatmanın, ayağa kaldırmanın, özgürlüğe yürümenin bir aracıdır. Bu araç doğru bir tarzda algılandığı oranda kendi işlevini görecektir. Doğru-yanlış bilinç gibi doğru-yanlış tarih bilinci de vardı. Yanlış, çarpık tarih bilinci halkı ve sınıfı yanlış bir mücadele yoluna sokar.

Bugün Kürt halkı, PKK'nın öncülüğünde ayağa kalkışı yaşarken, geçmiş ve geleceğini doğru bir tarzda bugünkü mücadeleyle bütünleştirmektedir. Özgürleşmenin önünde ayak bağı olan geçmişin ve sömürgeciliğin radikal bir eleştirisini yapmış / yapmaktadır. Ve tarihsel yasaların bilinciyle ona karşı diğer mücadele biçimlerinin yanında ideolojik mücadeleyi de yürütmektedir. Doğru bir tarih bilinci, çarpık ve yanlış bilincin ortadan kaldırılmasının önkoşulu oluyor.

Doğru bir tarzda Kürdistan Devriminin yolu belirlenmeksizin, Kürtlerin halk olarak tarihteki yerlerini almaları da mümkün değildir. Köle bir halk, ölü bir halktır. Ölü bir halk olmaktan kurtulmanın öncelikli yolu, doğru bir teorik kavrayışa, doğru bir tarih bilincine ulaşmaktan geçiyor.

Kürt halkı bugün böylesine doğru bir tarih bilinciyle, serîhildanlar gerçekleştiriyor, ayağa kalkışı yaşıyor. Eylemsel süreçte oluşan tarihsel bilinç yeniden daha üst tarzda bir eylem sürecinin yaratılmasında rol oynuyor.

Sömürgecilik yüzyıllar boyu halkımızın tarihsel bilincini, kömür karası uçurumlarda karartmış, halkımız bu kömür karası uçurumlarda kurtuluş yolunu yitirmiştir.

Halkımızın tarihsel bilincinin çarpıtılması, kurtuluş yolunu yitirmesi tarihinin ters-yüz edilmesi sadece günümüzde oluşan bir olgu değildir. Nasıl ki yurt tutma ve halklaşma tarihsel bir sürecin ürünüyse, tarih bilincinin oluşumu da buna bağlı olarak gelişen toplumsal-tarihsel bir sürecin sonucudur. Onu geçmişinden koparamayız. Her ne kadar genel anlamda, "bilimsel tarih bilinci" 1850'lerde Marx ve Engels'le gerçekliğine kavuşuyorsa da, bu bilimselliğin dayandığı tarihsel kökenler vardır. Her halkın belleğine kazılan tarihlerin bir yansımasıdır.

Kürt halkının da tarih bilincinin

çarpık oluşması veya doğru bir tarzda oluşmasının temelinde tarihsel nedenler bulunmaktadır.

Yurt tutma, halklaşma aynı zamanda kendisiyle birlikte, nesnel koşulların bir yansıması olarak, kendiliğindenci bir "tarih bilinci"ni geliştirir. Bu bilinç, yurtlaşma, halklaşma ve bunların yarattığı motivler üzerinde biçimlenir. Genel anlamda ideolojik şekillenmenin bir parçasıdır.

Med hareketi, Kürtlerin yurt tutma ve halklaşma bilincidir. "Media Bilinci", Zerdüşt'ün geliştirdiği dinsel-felsefi ideoloji üzerinde biçimlenir. "Güneş, Toprak, Su ve Ateş toprağa yerleşmenin, onu yurt edinmenin bu temel üzerinde halklaşmanın ögelerini oluştururlar.

Mezopotamya, "iki ırmak ülkesi"dir. Suyun ve nehirlerin kutsallığı, burada yaşamla ilintili olarak ortaya çıkar. Güneş, toprak su ve ateşin birlikteliği Med'lerde bir yaşam biçimi ve bilincini oluşturur. Bu bilinç, onların toprağa bağlanmasını, toprağı sahiplenmesinin temellerini oluşturur.

Zerdüşt bilinci üzerinde Media doğmuştur. Zerdüşt bir anlamda Asur köleciliğinin zulmüne son veren, Med Devriminin rönesansıdır. Onun ideolojik oluşum sürecidir. Bu bilinç, kendi döneminin çağdaş örgütlülüğün, köleliğe karşı bağımsız ve özgürce yaşamak için direnme gereğinin bilincidir. Bu bilinç kendi döneminin toplumsal koşullarının bir yansımasıdır.

"...Asurlar, Yukarı Asya'yı beşyüzyirmi yıldan beri, egemenlikleri altında tutuyorlardı; ilk olarak Med'ler ayrıldılar, bağımsızlıkları için, Asurlara karşı savaşarak yiğitlik kazandılar; kölelikten kurtulup özgürlüğü elde ettiler."(1)

Burada kölelikten kurtulmak ve özgürleşmek için, Asurlara karşı savaşım gerekiyor. Bu ise bir bilinçlenmeyi öngörüyor. Burada da bilinç, yaşanılan kölelik koşullarının bir sonucu olarak ortaya çıkıyor. O dönemde, Medlerin en büyük tarihsel-toplumsal sorunu, özgürleşmedir. Özgürleşme; yurtlaşma ve halklaşmanın anahtarı oluyor. Bunun için de öncü gerekiyor. Bu, Medleri bir çatı altında toparlayacak bir önderlik sorununu ortaya çıkartıyor.

Medler arasında Phraortes oğlu Dewokes adında becerikli bir adam vardı... O, haklının haksıza doğuştan düşman olduğuna inanıyor. Ve böyle bir ortam içinde çalışıyordu... Yargılarındaki doğruluk dillere destan olmuştur... Dewokes'in adamları şöyle bir dil kullanmış: "Madem ki bugünkü düzenimiz ülkeyi yönetmeye yetmiyor, o halde başımıza bir kral geçirelim; o zaman ülkemize iyi yasalar gelir, biz de kendi işimize gücümüze bakarız, karışıklıklar yüzünden yerimizden yurdumuzdan olmayız"..."(2)

Burada bir yurt edinme bilinci sözkonusudur. Yaşadıkları toprak üzerinde özgürce yaşama istemi var. İçinde bulundukları kötü koşullardan kurtuluş ve daha iyisini yaratma istemi oluşmuş, mevcut düzenlerin sorunlarına yanıt vermediğini pratik olarak biliyorlar. Medya toplumu bir kargaşalık ve dağınıklık içindedir. Burda kurtuluş için, çözüm gücü ve önder olarak kendilerine Dewokes'i seçiyorlar. Dewokes, dönemin koşullarında en iyiyi, en doğruyu temsil eden insan tipi oluyor. Neden? Çünkü Medyalılara daha iyi, daha ileri bir düzen getirmeyi vaadediyor. En doğru adeleti temsil ediyor. Toplumu kargaşalıktan kurtarıcı rolü oynuyor. Bu yapılanmanın üstünde bir tarih bilinci oluşuyor. Bu aynı zamanda kendi tarihlerini kendilerinin yazması anlamına geliyor.

Dewokes, etrafı surlarla çevrili bir kent devleti kurar. Aşiretlerin birliğini sağlar. Dönemin koşullarında sağlanan birlik güç demektir. Daha sonra sömürgeci Asur İmparatorluğunu yıkıp Ortadoğu halklarının özgürleşmesinde öncü rolü oynayan Med'ler; bu temel ve bu birlik üzerinde biçimlenirler. Burada oluşan bilinç özgürleşmeyi yaratmıştır. Bu bilinci çağdaşlaştırarak günümüze taşımak gerekir. Ortadoğu halklarını Asur zulmünden kurtaran bilinci, Türk - Arap - Fars sömürgeciliğini yıkma bilincine dönüştürmek gerekiyor.

Bir de Media'nın yıkılışındaki duruma bakalım:

"Tutsak Astyages'in karşısına Harpagos dikildi, içindeki sevinci ve hıncı boşalttı... Dün kralken, bugün köle olmak nasılmış diye sordu. Astyages de gözlerini ona doğru kaldırıp sordu, Kyros'ın yaptığı işi kendisine mi maledivor, diye. Harpagos 'evet', dedi, zira bunu Kyros'a kendisi yazmıştı ve bu işi haklı olarak kendisi yapmış sayıyordu. Ama Astyages ona, 'sen insanların en budalası ve en haksızsın', dedi. 'En budalası, çünkü, madem ki bu işi sen kendin yapabilecektin, tacı da kendi başına koyabilirdin, oysa şimdi bu gücün ancak üçte biri elindedir. Ve en haksızı, çünkü, şölenin öcü Media'yı köleliğe sürüklemiştir. Eğer krallığı kendisi alacak yerde ille de bir başkasına vermesi gerekiyorduysa, bunun bir Pers yerine, bir Media'lı olması daha doğru olurdu; oysa tersine, bu işte hiç bir suçu olmayan Media'lılar efendiyken, köle oldular ve Persler Medyalıların dünkü köleleri, bugün onun efendisi oldular." (3)

Burada iki ayrı düşünüş tarzı ortaya çıkıyor. Astyages'in yurt ve halk bilinci... Buna karşı Harpagos'un ihanet düşüncesi... Harpagos, Kürtlerin tarih bilincinin ilk saptırılmasıdır. İşbirlikçiliğin, ihanetçiliğin ilk temelini atmıştır; içteki ihanet Pers uygulamalarıyla bütünleşerek, çarpıklığın oluşmasını daha da hızlandırmıştır.

Buradaki çarpıklık giderek Kürtlerin tarihinde iki kalın çizgi haline gelmiştir. Birincisi; Dewokes, Keyaksar ve Astyages'ten çıkış yaparak, Demirci Kawa ve Rüstemzé Zal'da mitolojik bir karaktere bürünerek Babek, Alişer, Bese ve bu gibilerle devam eden, günümüzde çağdaşlaşarak özgürlük kahramanlarında ifadelerini bulan, direnen Kürt halkını

temsil eder. Bağımsızlık ve özgürlüğü isteyen Kürt halkı sürekli dağları mekan seçerek direnişi esas alan tarih bilincini teşkil eder.

İkincisi ise, Harpagos'la başlayıp İdris-i Bitlisi, Rayber vb. işbirlikçi, teslimiyetçi ve ihanetçi kişiliklerde somutluk kazanan, saptırılmış tarih bilincidir.

Kawa, sömürgeciliğe karşı başkaldırı tarihinin bilincidir. Newroz, yeniden dirilmenin, özgürleşmenin tarihsel bilincidir. Kawa ve Newroz, direnme bilincini sembolize eder. Bunu bilince çıkarmak, çağdaşlaştırmak gerekir.

Perslerin egemenliğinde Medlerin bu bilinci, Zerdüşt ideolojisiyle birlikte revize edilmiş, içi boşaltılmıştır.

Medler, Perslerin egemenliği altına girdikten sonra, ikinci derecede halk olarak yaşamlarını sürdürmüşlerdir. Pers ordusunun, Pers devletinin en önemli komutanları, en önemli yöneticileri Medlerden oluşuyor. Öyle ki Heredot, Perslerin düzenledikleri seferleri Med komutanlarının adıyla anar. Bunları da doğru bir tarzda tarih bilincimize katmak lazım. Ne denli "iyi komutan" "iyi yönetici" olursa olsunlar, Kürt halkının özgürlük mücadelesine karşıt bir rol oynamışlardır. Bunların günümüzdeki ifadesi sömürgeci devlet mekanizmasında en üst düzeyde yer alan ve kendilerini zoraki "Türk" sayan hain Kürtler oluyor. Bunları, en büyük Kürt düşmanı olarak bilmek, tanımak gerekiyor.

Babek ismi geçmiş tarihimizde 20 yıllık kesintisiz bir başkaldırıyı simgeliyor. Özgürlük yürüyüşünde uzun soluklu olmak için Babek'i sevmeli ve öğrenmeliyiz. Başkaldırı, Kızıllar, Kızıl Bayraklar adıyla bilinmektedir. Çünku kan rengi onların sembolüdür ve onlar özgürlük adına kendini kurban etmeye hazır kişiliklerdir. O halde "özgürlük adına kendini kurban etmeye hazır kişilikler"i bilincimize kazımak zorunluluk oluyor.

Babek harekatı "özde, Arap hanedanlığına karşı, köylülerin başkaldırısı olan harekete; halkın çeşitli katmanları katılmıştır."

"Halkın çeşitli katmanlarının" katılımı, günümüzde, çağdaş ulusal birliği maddi güce dönüştürme bilinci olmalıdır. Babek isyanı özde işgale, sömürgeleştirmeye karşı direnme bilincidir. Babek ve sosyal adeletsizlik işgalde somutlaşıyor. İşgal karanlığı temsil ediyor. Bu, aynı zamanda halkın tarih bilincininde karartılmasıdır. Karanlıkta kötülükler biter. Kötülüklerin boyverdiği karanlık Arap işgalini ifade ediyor.

Bu karanlığa, bu kötülüğe karşı direnme aydınlığın adı oluyor. Aydınlık Babek'in isyanında, Babek'in kişiliğinde ifadesini buluyor.

Aydınlığa kavuşmak için karanlığı da tanımak gerekiyor. Aydınlığın yolu, karanlığa galebe çalmaktan geçiyor. Ve Babek, tarihimizin sahiplenilmesi gereken bir parçasını teşkil ediyor. Tarih bilincimizin inancında Babek'i bugünleştirmeliyiz.

Feqiyé Teyran, Ehmedé Xanî tarihsel bilincimizin estetik yönünü oluşturuyorlar.

"Feqiyé Teyran" "Kuşların Feqi"si anlamına geliyor. Kuşlar, özgür ve bağımsızca yaşamın adı oluyor. "Feqi" belli bir olgunluğa erişmiş, bilgilenme sürecini tamamlamış öğrenci demektir. "Feqiyé Teyran"ı, "Kuşların öğrencisi" olarak algılamak gerekir. Burada özgürlüğe sevdalanmışlığın yanında büyük bir estetik zevk ve alçak gönüllülük de sözkonusudur.

Feqi, Kürt şiirine, Kürt müziğine olan sevgisini, kendisini kuşların "aile"sine dahil etmekle dile getiriyor.

Estetik ve özgürlük bütünleşmiş. Kuşların göklerin sonsuz maviliğinde kanat çırpma güzelliği, özgürleşmenin de istemi oluyor. Bu güzellik ve özgürlük bilinci, aradan yüzyıllar geçmesine rağmen Feqi'nin dizelerini çağdaş kılıyor. Ve dizeleri, Kürt insanının estetik bilincinin yatağında ölümsüzleşiyor.

Ehmedê Xanî Dünya edebiyatının burcuna Kürt edebiyat bayrağını dikme onurunu taşıyor. Mem û Zîn, Kürt tarih bilincinin estetik yönünün nakışlandığı ulusal bir destan niteliğini taşıyor. Estetik bilinci güçlü bir özgürlük ve bağımsızlık istemiyle bütünleşiyor Ehmedé Xanî.

"Kılıcı konsun gücümüzün
Bilinsin kadri kalemimizin"

demekle bilimselliği ve gerçekliği ifade ediyor. Bilimselliği ve gerçekliği, onu hiç eskitmeden günümüze taşıyor. "Kılıç", özgürleşmek için, halkın devrimci zorunun ifadesidir. "Kalem" ise bilimselliğin... ve her ikisi de günümüzde Kürt halkının en önemli sorunu olarak duruyor. Yine Exmedé Xanî,

Her ne kadar uyrukluğu utançtır
O utanç ünlü şanlı kişilere aittir.

Egemenlere ve canilere mahsustur
Fakirlere ve şairlere ne ceremedir

dizeleriyle dönemin sınıf gerçekliğini ve bilincini dile getiriyor. Köleliğin utanç olduğunu, ama bu utancın sorumlusunun Kürt egemen sınıfları olduğunu ortaya koyuyor. Bu gerçek günümüzde de tüm yakıcılığıyla karşımızda duruyor. Bu, tarih bilincimizin özümsenmesi gereken en önemli noktasıdır.

Cegerxwîn'i unutmamak gerekir. Kürt şiirini, kendi kişiliğinde, dünya şairler ailesine taşımıştır. Çağımızın en büyük şairlerinden biridir Cigerxwîn. Feqî ve Ehmedé Xanî'nin bir devamı oluyor.

Tarih bilincinin estetik yanını özümsemek gerekiyor. Estetik bilincin yokluğu, tarihsel bilincin eksik algılanması olacaktır. Feqî'yi, Xanî'yi, Cegerxwîn'i yalnız estetik yönüyle sevmek değil, tarihsel açıdan bilince çıkarmak gerekiyor. Özde toplumcu gerçekçi, biçimde ulusal estetik bilincimizin mayası yapıp güçlendirmek, geliştirmek ve özgürlük mücadelesi ile doğru bir tarzda

bütünleştirmek zorunluluk oluyor.

19. Yüzyılda yaygın isyanlar yaşanmıştır. Buradaki isyanların direnme ve başkaldırı bilincini almak, özümsemek gerekiyor.

"Kürtlerdeki büyük özgürlük aşkı ile üstün karekter gücünü bu savaşçı ruha bağlamak gerekir. 1837'de Hafız Paşa seferi sırasında esir edilen çok yakışıklı 30 yaşında bir bey, ayaklanan soydaşlarının kendisine vaadedilen bütün avantaj ve bahşetmeleri ikirciklenmeksizin rededi yordu. Bütün bu baştan çıkarıcı tekliflere gururla 'bir Kürt beyi olarak ben, başka insanlara esir olmayı asla kabul etmem' diye cevap veriyordu. İki gün boyunca çektiği bütün acılara rağmen soydaşlarına ihanet etmedi. Üzerine inen sopalar altında bile sakin sakin çubuğunu tüttürüyordu. Üçüncü gün paşa onu kaynar suyla dolu bir kazana attırdı. Ama yiğit Kürt ölene dek direncini yitirmedi..." (4)

Burada ihanete, teslimiyete, boyun eğişe karşı bir direnme ve bilinç sözkonusudur. Bu bilinç, özünde Dewokes'in temelini attığı bilincin devamıdır. Yüzyıllar boyunca halkın pratik yaşamda sömürgeciliğe karşı kendiliğinden edindiği deney ve tecrübelerin toplamından oluşan tarih bilincinin devamı ve ifadesidir.

Bu direnme bilinci kendisini Dersim direnişinde Alişer'de, Bese'de somutlaştırır. Bese'nin, düşmanın eline sağ geçmemek için kendisini uçurumdan atması özgürleşmeyi amaçlayan ve köleliği rededen bir Kürt kadınının tarihsel bilincinin temsili oluyor. Kürt kadının mücadelesinde Bese'yi çağdaşlaştırmak ve günümüze taşımak gerekiyor.

Ama buna karşı Harpagos'un temelini attığı çarpık, saptırılmış, özüne karşı düşman hale getirilmiş tarih bilinci de, güçlenerek gelişmiş ve Kürt halkının özgürleşme bilincini kirletmiştir. Bu kirliliği görmemek, ondan gerekli dersler çıkarıp özümsememek, özgürlük ve kurtuluş bilincinin yeniden kirletilmesinin yolunu açık bırakmak olacaktır.

Sömürgeci güçler Kürt halkının elinden ayağa kalkış, direniş ve özgürleşme için ne varsa ya gasp etmiş, ya özünden boşaltmış, ya da yadsımışlardır. TC'nin yaptıkları ihanetlerle bütünleşince müthiş bir bilinç çarpıklığı oluşuyor.

Özellikle Türk sömurgecileri, son 70 yılda Kürt halkının bütün tarihsel kültürel değerlerini büyük bir pervasızlık ve sahtekarlıkla yağmalamışlardır. Özgürlüğe, direnişe yarayacak her şey özünden saptırılmıştır.

Newroz geleneğine sahiplenerek onu "bahar bayramı", "kırlara çıkma günü" olarak lanse etmeye başladılar. "Bu geleneğin Orta Asya'da Turan geleneği olduğu, kırlara çıkma günü olduğu..." biçiminde yoğun bir propaganda faaliyeti yürütmektedirler. Bu büyük bir saptırmadır. Newroz, Kürt halkının sömürgeciliğe karşı başkaldırı ve isyan ateşini yakma ruhu ve bilincidir. Bu silahı ve değeri sömürgeciliğin insafına bırakmak, bilincimizi saptırmaya izin vermek oluyor.

Kürt kültürü aynı akibete uğramaktadır. Tarih ters yüz ediliyor. Bunlarla kalmıyor, Kürt tarihinin kendisi de saptırılıyor. Kürtlerin Türk soyundan geldiği sahte bilim adamları aracılığıyla sahte gözboyacı belgelerle ortaya atılıyor. Tarih çarpıtılıyor.

1970'li yıllara gelindiğinde Kürdistan'da gerçek anlamda "bu ülke benimdir", "ülkenin şu zenginlikleri benimdir" diyebilecek tek bir insan yoktur. Tüm değerler gaspedilmiştir. Zaten insanların hiç bir yaşama güvencesi olmadığı bir ortamda "bu benimdir" diyebilme koşullarının da olmadığı açıktır. Bu ülke benimdir, diyenler belki vardır. Ancak ülkeye sahiplenme bilinci, sömürgeciliğin yüzyıllar boyu yarattığı tahribattan dolayı çarpıtılmıştır. Gerçek tarih bilinci, gerçek ülke bilinci, gerçek özgürleşme bilinci ya çarpık, ya da yetmez durumdadır. Dolayısıyla hiç biri kurtuluş umudu olacak nitelikte değildir. Çünkü doğru bir tarih bilinci yoktur. Bir halk doğru bir tarih bilincine sahip olmayınca doğru bir ayağa kalkışı yaşayamaz.

Dikkat edilirse, bu döneme kadar Kürdistan'da doğru yeterli ve çağdaş anlamda bir ayağa kalkış, bir önderlik yaşanmamıştır. Tüm başkaldırılar kendi tarih bilincinin, kendi yetmezliklerinin, iç ihanetlerinin kurbanı olarak esas darbeyi içten yemişlerdir.

Şunu vurgulamak gerekir: Bu yanlış, yanılgılı, çarpık bilinç, bugün de halkımızın özgürleşmesi önünde en büyük handikaplarından birini oluşturuyor. Bir yandan özgürlük için tarihin en onurlu ve yüce kahramanlıkları sergilenirken, özgürlük ağacı kan ile büyütülürken; diğer yandan düşmanla bütünleşen, işbirliği yapan, özgürlüğün yolunu tıkayan teslimiyetçi, hain, işbirlikçi kişi ve yapılanmalar arenaya çıkmaktadır.

İlkel milliyetçi güçler, halkımızın kurtuluşunu Türk sömürgeciliğinin, Arap sömürgeciliğinin veya emperyalizmin paslı zincirlerine bağlanmakta görüyorlar. Emperyalizmin istemi doğrultusunda Güney Kürdistan'ı da TC'nin sınırlarına katma planları yapıyorlar. Kuzeyde ve güneyde kurtuluşu Türk sömürgeciliğine yamanmakta görüyorlar. Tek çözümün sömürgeciliğe boyun eğmek olduğunu öğretiyorlar.

Kurtuluş için, özgürleşmek için bunları iyi tanımak gerekiyor. Bunların halka gösterdikleri yol teslimiyet ve ihanetin kirli yoludur. Yüzyıllarca halkımızın bilincini körelten, köleliğe mahkum eden bir yoldur. Besbelli ki bunlar Harpagos'un, İdris-i Bitlisi'nin, Rayber'in ayak izlerinde adım adım yürüyen işbirlikçilerdir. Halkımızın özgürleşmesini durdurmak için içte kullanılan piyonlardır. Her seferinde halka direnme ve özgürleşme yerine, kaçışı, teslimiyet ve boyun eğişi aşılayan aşiret reisleridirler. Ulusal tarih bilinci yerine, ailesel, aşiretsel ilişki, çıkar ve bilinci temel alan, artık fosilleşmiş düşün-

celerin temsilcileridirler.

Yine bu teslimiyetçi ve işbirlikçilerin bir başka tayfası ise, yıllardan beri binlerce devrimci, yurtsever bağımsızlık ve özgürlük için yaşamını verirken, Avrupa'da mülteciliğin kokuşmuş bataklığında sefil bir yaşam biçimini seçen, her fırsatta devrimci direnişi karalayan, işbirlikçi politikayı marifet sayan, halkımızın tarih bilincini sömürgeci güçlerin yasallığı içine çeken Kürt küçük-burjuva teslimiyetçileridirler. Bunlar, her zaman, KUKM'ye karşı kullanılmak üzere egemen güçlerin ellerinde hazır bulundurduğu yedek güçlerdir.

Bugün bağımsızlık ve özgürlük mücadelesini utkuyla taçlandırmanın yolu, tarihin bize verdiği tecrübe ve deneyimle, kahramanla şarlatanı, direnişçiyle teslimiyetçiyi, iyiyle kötüyü, işbirlikçiyle bağımsızlıkçıyı birbirinden çok iyi ayırmak ve ona göre mücadeleyi yürütmektir. Tarihsel ve güncel mirasımızın ışığında bu güçleri değerlendirdiğimizde, bunları sonuç itibarıyla sömürgecilikten, onun işbirlikçileri olmaktan ayrı tutamayız . Çünkü sınıf çıkarları bunu öngörüyor.

O halde şunu söyleyebiliriz. Geçmişten günümüze dek gelen direniş hareketleri belli yönleriyle doğruyu içermesine rağmen yine de eksiktirler. Pratik olarak başarısızlıklarının nedeni de bu eksiklik ve yetmezlikleridir. Bu direnişe önderlik edenler tarihsel yasaların bilincinde değillerdi. Tarihsel-toplumsal yasaları bilinçli bir tarzda halkımızın özgürleşmesi için kullanamamışlardır. Veya bu yönde denetim sağlama çabaları yoktur. Bu açıdan bilimsellikten yoksundurlar. Onların tarihsel bilinci daha çok kendiliğindenci ve "pratik bir bilinç"tir.

Bu şunu gösterir: PKK gerçekliği ilk kez Kürt halkı açısından çağdaş anlamda bir tarih bilincinin miladı oluyor. Kürt halkı miladını bilmek zorundadır. "Kendini arayan Kürtler" özgürlük hareketinin yarattığı tarihsel bilinçle kendilerini buldular. Suyu arayan Kürt, özgürlük hareketinin gerçekliğinde, dağların doruğundaki berrek kaynağa kavuştu. Artık yüzyıllar boyu köleliğin kızgın çöllerinin ortasında özgürlüğe susayan Kürt halkı; şimdi özgürlük bilincinin berrak pınarlarının billur renkli sularına kavuşmuştur. Suyun bulunuşu tarih bilincine kavuşmadır. Özgürleşme, ayağa kalkış ve yaşamdır. Kürt halkı artık kendi gerçek tarihsel bilinciyle bütünleşmiştir.

Daha önceki tarih bilinci, bilimsel bir nitelikten yoksun, yanlış ve yanılgılıdır. Kör karanlığın ortasında el yordamıyla yolunu bulmaya çalışan insan gibidir.

Tarih bilinci olmayan bir halk, özgürlük ve bağımsızlık yolunda ilerleyemez. Ya köle olmaya, ya da yok olmaya aday bir halktır.

Bugün halkımız yeniden kendi tarihinin bilincine varıyor. Bu bilinç tarihsel toplumsal açıdan müthiş bir ilerleyiştir. Kürtlerin tarihinde ileriye dönük nitel bir dönüşümdür. Bu ilerleyiş, aynı zamanda eşitsizliği, haksızlığı ve köleliği aşmada bir kilometre taşıdır.

Çünkü KUKM ile, sömürgeciliğin halkımızın yokoluşu temelinde oluşturduğu derin eşitsizlik, haksızlık ve sömürü anaforu ve bu anaforun yarattığı tüm kurumlar yıkılıyor ve yerine Kürt halkına ait olanlar kuruluyor. Tarihsel açıdan, haksızlık haklılığa; eşitsizlik eşitliğe; kölelik özgürlüğe dönüşüyor. Devrimimiz Kürdistan ve Ortadoğu halkları tarihinin dinamosu oluyor. Yaratılan eşitlik, özgürlük doğru bir tarih bilincini oluşturuyor.

Neden bugüne kadar halkımızın tarih bilinci hep çarpıtılmıştır? Çünkü, "zor" olgusunu doğru kavrama, tarih bilincinin temel ögesidir. Sömürgeciler, ülkemizi, at sırtında, elinde "kılıç kalkan", zor temelinde işgal edip, halkımızı kölelik boyunduruğuna vurdular. Zaten başka türlü olamazdı. Dünyada "zor" dışında hiç bir halkın kendi istemiyle köleliği kabul ettiği görülmemiştir.

Bugün politikacılar, sahte demogojilerle ne kadar "kardeşlikten", Kürtlerin Türk olduğundan,"Kürt adının karda yürürken 'kart-kurt' diye çıkan seslerden türediğinden bahsederlerse etsinler.

Bunlar tarihe yapılan iftiralardır. Tüm bunlar Kürt halkının tarih bilincini saptırmaya yönelik korkunç bir demogoji furyasıdır.

Halkımızın köle oluşunun temelinde "zor" vardır. Halkımızın Türk sömürgeciliğinin boyunduruğunda olmasının kendisine hiç bir yararı yoktur. Sömürgeciler, halkımıza acı, açlık, göz yaşı, kölelik ve katliamdan başka bir şey vermemişlerdir.

O halde tek çare bu illetten kurtulmak ve bunun için de doğru bir tarih bilincine ulaşmaktır.

"Bir millet için en büyük felaket, tarihlerinin düşmanları tarafından yazılmasıdır". Halkımız yüzyıllar boyunca bu en büyük felaketi yaşadı. Ama bugün kendi tarihini kendisi yazmaya başlamıştır. Kendi tarihini yazan halk, kaderini kendi eline almış demektir. Burada halk, aynı zamanda doğru bir tarih bilincine kavuşuyor.

KILAME SER CAFERÎ

Jû gul bî kêwe kowanê Qoçgirî ra
Xorî yo, xorî yo, kûlê tu xorî yo
Roşniya tu da çar hetê Kurdistanî
Bira Cafer, heval Cafer,
kulê tu xorî yo
Tu biya pûkeleka bajarê metropolî
Xorî yo, xorî yo, kûlê tu xorî yo

Sewe tarî ya,
hevalî kewtê şerê giranî
Xorî yo, xorî yo, kûlê tu xorî yo
Dormê tu gureto bi kûtkan û maran
Bira Cafer, heval Cafer,
kûlê tu xorî yo
Tu qirawa tu va ez nêmiren
Xorî yo, xorî yo, kûlê tu xorî yo
Ez kêwiya kowanê Qoçgirî biyenê

Besê

ŞEXÊ ŞEHÎD

(1865-1925)



A. DURRE

Xwendevanên delal,

Niyeta me ew bû ku di vê nivîsara xwe de jîna Hecî Qadirê Koyî û çend helbestên wî yên dilpezir me ji we re pêşkêş bikira. Lê mixabin, min ew keys û fersend nedît. Ev bû nêzîkê du mehan ku ez bi roj û bi şev li ser berhema xwe ya bi navê "Dengê Kurdistanê" dixebitim û min beşa wê ya seretayî (ewilî) ji weşandinê re amade kir. Hêvîdar im ku di nêzîk de bête weşandin.

Belê, di destê min de qesîdeya ku min ji bo "Şeva Bîranîna Şêx Seîdê Şehîd" amade kiribû, hazir hebû. Ez fikirim ku madem zorbeyan destûra wê şeva pîroz nedan, divê ku em wê qesîdeyê bidin belav kirin. Lewra bi baweriya min ew qesîdekî hêja ye.

Li ser vê yekê, min biryar da ku ez ji bo we xwendevanên hêja ev qesîdeyê di vê deqa (nusxe) Rewşenê de bidim weşandin. Lêkolîna ser Hacî Qedir jî, di deqa bê de pêşkêş bikim. Hêvîdar im ku hûn, min bibexşînin û ev qesîde jî, li we xweş bê.

Murşîd û pîrê terîqet, serwerê Kurdan î to
Rehberê dîn û şerîet, leşkerê îman î to

Şoreşa Kurdan şehîd î, lê ku pîran bû Uhud
Hemze yî, yan Şêx Seîd î, şêrê Kurdistan î to

Rehber î, pîrê şehîda, qehremanê şoreşê
Pir şerefdar î ji wî da, hem şeref hem şan î to

Hem tu şêx û hem mela bû, hem şehîdê kerbela
Rêberê koma gela bû, daw û doza wan î to

Serwerê Kurdan Selaheddînê Eyyûbî heyî
Pêncî û heft sal e vir da rêberê ruhan î to

Kî, ji bo heqê xwe bimre, dîn dibêje: Ew şehîd
Lê, tewaf û Hec û Umre, ferz e ku j'Pîran î to

Namirî, her tim ne mir tê, nav me da dê her bijî
Vê demê teşrîf li vir tê, ser ser' û çavan î to

Mêze kin, ew rûhê pîroz, va li ber çavê me ye
Ev xuroş û coş û Newroz, lê şeref mêvan î to

Hem şehîd î, hem Seîd î, rêber î, şoreşker î
Hem ji dozê ra umîd î, murşîdê reban î to

Xalid û Yusif Ziya û Extî hemdozê te ne
Qutb û xews û ewliya û murşîd û rêzan î to

Pirr seîd bûne şehîdê daw û doza Kurd û dîn
Wek melê meşhur, Seîdê Kurdî, lê serkan î to

Kaniya ava heyatê tê ji xwîna lê we rêt
Dicle û Zap û Firatê alema rûhan î to

Serwerê koma şehîda, rehberê îman û dîn
Dengê azadî ji wî da, tê guhên lawan î to

Dîn û îman û şerîet, şoreş û ceng û şer e
Murşid û pîrê terîqet şêxê şoreşvan î to

Hatî mêvan î tu îro, ser ser û çavan werî
Şahê rûh û can î mîro! textê dil sultan î to

Ez çi bêm medh û senayê ku b'zimanan naqedin
Bes! bibêjim, pêşewayê Kurd û Kurdistan î to

Dujminê qellaş û qeşmer, sed hezar lênet be lê
Sed hezar rehmet jî ku l'ser, wî muqedes canî to

ŞANIKA KOLE

Betal QERAMAN

Çi biyo, çi çinebiyo. (Ju biyo, ju çînebiyo). Qulê heqî zaf biyê. Waxto verende de, nezdiyê ju dewe de, ju luye biya. Luyade zaf baqil, zaf bi feresetî biya. Na luye, herge roce sona dewe, eke kêfê xwe çi wast, yî (eyî) dewe ra tirena, cena wena. Pîzê xwe kena mird. Aye ra tepiya cerena ra yena lewe havalanê xwe (embazanê xwe). Çalim erzena ser. Xu goynena, vana;

"Ewru mi bi mirdiya xwe werd. Hawo ke zêde ame, mi verde mend, mi cadeverda. Teyrî tûrî amayî, yînon kî bi mirdiya xwe werd. Wonca kî nêqediya. Ewru kêf kêfê min o, meştiya kî Heq comerd o. Hona ke (hondeke) nî dewiciye axmaxî estê, mi re na dîna de merdene çîna. Şima, bi na hal, îta veşan - teşan bizîbê. Mi ra gore taba çîno. Ma ez se bikêrî, qeydê şiman boman biwoncî?"

Bi na hal, luye bi kêf û şadimanî de rocanê xwe viyarnena ra. Embazê na luye ke hayî ra xezebenî kenê, zoftan danê piro. Vanê, "ma na çi luyade baqil a, kes bese nêkeno ke (nîşkînoke) nayî pêcero û nayî re xirabî bikero. Xazîbê nayî!... Keşkî ma kî ze hayî baqil û bi firaset bîme. Hama, çi çare! ma dest ra taba nîno. Ma bê lom o bê guman werte de mendîme. Qa, rocê ha ke dim fîna destê dewiciyan wuçax ma halê haye vîneme."

Bi na hal, rocî rocan dima vêrenê ra. Key ke kêfê luye waşt, şona dewe, eke zera xwe çi wast, canê xwe çi wont, wu tirt, bi yi pîze xwe kerd mird. Rocê kerg, rocê leyrê kergan, rocê sit, yon kî sersitî... Kêfê luye re qe vatene çînebî. Endî ke çi amabî luye vîrî, eke luya ma bi çi qayîl bî.

Rocî rocan dima şî, waxt veriya ra, luye tomasiya çe ju pîre. Pîra bê kes a bê wayîr. Pîrade neway serre. Pîrade bê teqet. Pîra ke destbera xwe taba nêna. Teyna ju biza na pîre biya. Biza kole. Pîre her roc biza xwe ya kole doşena, bi şitê bize rocanê xwe viyarnena ra. Ama çiyo xirab kî, luye tomasiya şitê biza kole.

Luye xwe bi xwe vana, "na pîra vizikine nîşkîna ke mi re taba bikero. Na, mi gore lokmewa nerm a. Ha serba mi gurîna. Ez çinarê xwe tenganî kerî. Çi waxt ke sarrê mi bî teng, ez şerî çeyê na pîre."

Hetê bîn ra kî, nu hal canê pîre teqeno. Pîre luyera bêzar bena. Vana "ma deha endî bes o. Ez nî serranê xwe ra tepiya nêşkîno ke na luya ritkine ra bigurî. Ma qa kamê mi esto ke qaytê mi kero. Ez bê çar mendo; ez mecbur naka xwe bi xwe cirakerî."

Pîre naha vana û sona dariya xwe wa kana kerin, a ke çond serrî yo dest nênayîbî pa, hayî cena kena tuj, bereqnena û şanena pey çeberî, raya luye peyena. Ju het ra kî hesabnena. Vana, eke ez na luye bîkîsî, şito ke haye hata ewru werdo luye re maneno. Ez hînî bikerî ke şito ke luye werdo yî şitî pirnika (firna) luye ra biyarî.

Pîre qerarê xwe dana. Vana ez hem na luye milamet kerî, va meşîkiyo ke ruye şarî de şerkero, hem kî xofode hene zerre luye fî ke, va reyna çîwode nanen mekero. Ez dimê na luye cirakerî, luye qol biverdî, hela wu çax halê nayî se beno.

Bi na qerar pîre kemaniya xwe vênena, xwe kena hadar û raa luye peynena.

A roce şonde ke muxwerbe kotî de, luye bi kef kuna raa dewe. Hetê ra raa xwe ra şona, hete ra kî kêfan ra kilaman vana.

Vana:

"Pîre, pîre
Tu wonca kotiya mi vîrî.
Ez nawo yeno,
Şite tu tom kerî."

Hetê bîn ra kî, pîre bê sabr pîyena. Zere xwe, xwe zere de canêbeno. Vana naray ez hesabê luye ceno. Xwe zere de kî kilama xwe vana.

Vana:

"Luye luye,
Ez raa tu bipeyî,
Naray ke tu ama,
Ez dimê tu cirakerî."

Bi na hesab luye kuna zere. Zêke bi destê xwe no ro, şona serê biroşê şitî bi kêfê xwe şit şimena. Waxto ke racero şero, pîre hih kena, bi darî dana piro, dimê luye cirakena cena. Luye tersanê xwe ver xwe erzena teber û kena kaze-kaz û kuza-kuz, berbena, zîbena; cerena pîre ver, cerêna ser. Pîre qe goş nêdana. Vana,

"Luyê luyê,
Dimê tu kevda muyî
Ez yî bixemelnî dardekerî
Tenê kî ez biwuyî.

Luye ser kena ke "çerme vay o" Pîrê dim nedanaci vana;

Pîre, Pîre, Pîra delale, Rindeka ze awa zelale, Mi kerd, tu meke. Ez reyna xirabîa nanên nikeno. Mi bibexişne, dime mi mi de. Ez şerî cawo de bîn de çalp çulpê xwe bikêrî.

Nayî ser ra pîre vana, "ma ez çira tu bibexişnî? Şito ke tu heta êwru werd, şu mi ra biya. Ayre tepiya ez dimê tu dano tu. Zobîna ez qe tu goşnêdano.

Luye qanat kerd ke bi na raye nêşkîna ke dimê xwe raxelesno, wurzêna ra sona lewê biza kole. Vana, "bizê bizê, tenê şit bide mi. Ez şit berî Pîre dî. Pîre dimê mi bido mi. Ez şerî çalp-çulpê xwe bikerî."

Bizi luye ra vana, "waya luye, çi vaxto ke ez veşan o. Qe guwanê mi de şit nêmendo, guwanê mi bîyê zuwa, şu mi re tene (tay) velg biya. Ez pîzê xwe mird kerî, şit bêro guwanê mi. Ez şit to dî. Tu şit bere Pîre de. Pîre dimê tu to do. Tu kî şu çalp-çulpê xwe bike."

Luye wurzene ra, şona lewê dara mozenî. Vana: "darê darê, tenê velg bide mi. Ez velg berî bize dî. Bize şit bido mi. Ez şit berî pîre dî. Pîre dimê mi bido mi. Ez şerî çalp-çulpê xwe bikerî."

Dara mozenî vana: "luyê luyê, çi waxto ke dilopa awe nêkotiya kokê mi. Purtê mi pêro biyê huşk. Şu mi re tenê awe biya. Awe bide mi. Ez velg to dî. Ti velg bere bize de. Bize şit to do. Tu şit bere Pîre de. Pîre dimê tu to do. Tu kî şu çalp-çulpê xwe bike."

Luye şona serê hînî. Hînî ra awe wazena. Vana, "hînî hînî, tenê awe bide mi. Ez awe berî, dare dî. Dare velg bido mi. Ez velg berî bize dî. Bize şit bido mi. Ez şit berî pîre dî. Pîre dimê mi bido mi. Ez şerî çalp-çulpê xwe bikerî." Hînî vano, "luyê luyê, çi waxt o ke çimê mi bîyo zuwa. Taba mi de awe nêmenda. Şu çena paşay ra vace, çenanê dewe arekero, bêrê serê mi de bireqeşiyw. Tenê awe to dî. Tu awe dare de. Dare velg to do. Tu velg bere bize de. Bize şit to do. Şit bere Pîre de. Pîre dimê tu to do. Tu şu çalp-çulpê xwe bike."

Luye şona lewê çena paşayî, vana, "çena paşay, çena paşay, bi xêrê xwe bê serê nî hînî de bireqêsî. Hînî awe bido mi. Ez awe berî dare dî. Dare velg bido mi. Ez velg berî bize dî. Bize şit bido mi. Ez şit berî Pîre dî. Pîre dimê mi bido mi. Ez şerî çalp-çulpê xwe bikerî."

Çena paşay vana, "luyê luyê, hawo çi waxt o ke, kundrê mi biyê kan. Ez bi nî kundran nîşkîno ke bireqeşî. Şu mi re citê kundranê newan biya. Ez çenanê dewe arekerî şerî serê hînî de bireqeşî. Hînî awe to do. Tu awe bere dare de. Dare velg to do. Tu velg bere bize de. Bize şit to do. Ti şit bere Pîre de. Pîre dimê tu to do. To şu çalp-çulpê xwe bike."

Luye wurzena ra şona lewê goşkarî, vana, "goşkar goşkar, serba mi citê kundranê neweyan biderze. Ez kundiran berî çena paşay dî. Çena paşayî bêro serê hînî de bireqeşiyo, hînî awe bido mi. Ez awe dare dî. Dare velg bido mi. Ez velgî berî bize dî. Bize şit bido mi. Ez şit berî Pîre dî. Pîre dimê mi mi do, ez şerî çalp çulpê xwe bikerî."

Goşkar vano, "waya luye, ez gestê merdo. Şu mira de hakan biya. Ez hakan borî, pîze xwe mird kerî, ay ra tepiya to re citê kundran biderzî. Tu kundran bere çena paşay de. Çena paşay şero serê hînî de bireqeşiyo, hînî awe to do. Tu awe bere dare de. Dare velg todo. Tu velg bere bize de. Bize şit to do. Ti şit bere Pîre de. Pîre dimê tu to do. Tu şu çalp-çulpê xwe bike."

Luye wurzena ra şona lewê kerge. Vana, "kergê kergê, di hakan bide mi. Ez berî goşkarî dî. Goşkar citê kundran mi re biderzo. Ez kundran çena paşay dî. Çena paşayî şero serê hînî de bireqeşiyo. Hînî awe bido mi. Ez awe berî dare dî. Dare velg bido mi. Ez velgî berî bize dî. Bize şit bido mi. Ez şit berî Pîre dî. Pîre dimê mi bido mi. Ez dimê xwe bicerî. Şerî çalp-çulpê xwe bikerî."

Kerge vana, "luyê luyê, ez çi waxto ke vêşan o. Şu mi re tenê qut biya. Ez qut borî, to re de hakan bikerî. Tu hakan bere goşkarî de. Goşkar kunderan to do. Tu kundiran bere çena paşay de. Çena paşayî şero serê hînî de bireqeşiyo. Hînî awe to do. Tu awe bere dare de. Dare velg to do. Tu velg bere bize de. Bize şit to do. To şit bere Pîre de. Pîre dimê tu to do. Tu kî şu çalp-çulpê xwe bike."

Luye wuca ra wurzena ra şona mereke. Mereke ra vana; "merek merek, tenê qut bide mi. Ez qut berî kerge dî. Kerge hak bido mi. Ez hakan berî goşkarî dî. Goşkar kundran bido mi. Ez kundran berî çena paşayî dî. Çena paşayî şero serê hînî de bireqeşiyo. Hînî awe bido mi. Ez awe berî dare dî. Dare velg bido mi. Ez velg berî bize dî. Bize şit bido mi. Ez şit berî Pîre dî. Pîre dimê mi mi do. Ez şerî çalp-çulpê xwe bikerî."

Mereke vana, "luyê luyê, çi waxto ke kesayî serê mi lox nêkerdo. Serê mi time-tim dilop keno. Tu veyra serê mi loxke. Va serê mi dilop mekero. Ez qut dano tu. Tu qutî bere kerge de, kerge hakan to do. Tu hakan bere goşkarî de. Goşkar kundran to do. Tu kundran bere çena paşayî de. Çena paşayî şero serê hînî de bireqeşiyo. Hînî awe to do. Tu awe bere dare de. Dare velg to do, tu velg bere bize de. Bize şit to do, tu şit bere Pîre de,Pire dimê to to do, tu ke şu bi kefê xwe çalp-çulpê xwe bike."

Luye veycîna serê bonê mereke. Serê bonî de meredîna ra, xwe ze loxe nata-bota gevizdana (gindir kena), serê bonî lox kena. Hata ke dilopî birîyayî, yena cer ke mereke dilop nêkena. Mereke qut dana luye. Luye qut bena dana kerge. Kerge hakan dana luye. Luye hakan bena dana goşkarî. Goşkar citê kundreyê rindek dano luye. Luye kundran bena dana çena paşayî. Çena paşayî havalanê xwe dana arê şona serê hînî de reqeşîna, hînî awe dano luye. Luye awe dana dara mozênî. Dare velg dana luye, luye velg bena dana biza kole. Bize şit dana luye. Luye şit bena dana Pîre. Pîre dimê luye dana ci, luye dimê xwe kena xwe ra ke çi bivîno? Pîre dim xemelno, bi gocegan, bi morekan. Kerdo dimode henen ke, qe kesîde nêno diyayine. Luye xwe bi xwe vana, "mi hondê zamet wont. Hama gina ci. Dimode naha rindek kotî amo diyayine. Ay ra tepiya vozena şona bi kêf çalp-çulpê xwe kena.

NIŞTIMANA XWE BINASE

QERS

S. MIHOTULÎ

Qers, li rojaveyê başûr ê Qafqasyayê û li bakurê Kurdistanê cih digire. Li vê deverê gelek çiyayên bilind, deşt û zozan hene. Bi taybetî jî, deşta îdirê pirr bi zêdahî (bereket) û mezin e. Li vê deştê pembû tê çandin. Deşt û zozanên li vê deverê, ji bo xwedîkirina pez û dewaran gellek musaid e. Çiyayê mezintirîn ê li vir çiyayê Eleka ye û bilindahiya wî 3134 metro ye.

Riya Qersê, li ser Erziromê û Bazîde derbasî Rojhilatanavîn , li ser Artvînê jî, derbasî Deryaya Reş dibe. Riya hesin ji Anadoluyê tê û di nav Qersê de derbas dibe ta diçe Rusyayê.



Li gorî lêkolînên arkeolojîkî, 8 hezar sal berî zayinê mirov li vir bicih bûne û xanî ava kirine. Em vî agahdariyê, ji lêkolînên ku li navçeyên Cilawiz, Çildir û Kaxizman hatine kirin, digirin. Em ji van bermayên ku li van şikeftan hatine bi dest xistin têdigihêjin ku ev bermaye yên Ariya ne û ji van bermayan li Adiyaman, Hatay, Hekarî, Musil û Hemedan jî hatine dîtin. Qers, navekî Kurdî ye, têgiha (mana) wî jî hişk, Cemidî ye. Bajarê Qersê ev navê ji zivistana xwe ya hişk, tund û serma girtiye.

Qiraliyeta Mîtanî-Hurrî (B.Z. 16-13) sînorên xwe yên siyasî ta Qafqasyayê fireh kiribûn. Piştî roxandina Mîtaniyan qiraliyeta Urartu (Bz.900)dest pê dike û ev dever jî, di nav sînorên Urartu de dimîne. Di sedsaliya 7'an de (B.Z.) Ji Qafqasyayê êrîşên Kimmriyan dest pê dike, ev êrîşên han dibin sedemên gelek tehrîbatan, paşî Îskîtî êrîş dibin ser gelê vê herêmê, ew jî, gelek tehrîbat çêdikin.

Piştî van êrîşên hov, gelê Ariya (Kurd) xwe bi rêk dixe û dewleteke xurt (Med) dadimezirîn e. Dewleta Mediyan ji aliyek ve li hemberî êrîşên Îskîtan radiweste ji aliyek ve jî êrîş dibe ser Asuriyan û dewleta wan ji holê radike. Medî bi vî awahî jî, Sînorên xwe fireh dikin. Di vê demê de Qers jî, di nav sînorên Mediyan de ye. Lê piştî ku Împeretoriya Mediya hildiweşe, Qers dikeve bin hakimiyeta Persan. Lê di demeke kin de qiralê Mekedonya Îskenderê Mezin dawî dide Împeratoriya Persan (B.Z.333) di vê demê de li herêmê Qiraliyeta Araks - Armeniya (B.Z.190) tê ava kirin. Qers jî, di nav sînorên vê qiraliyetê de dimîne. Serdestiya Qiraliyeta Araks 383 sal dajo. Piştî demekê li herêmê tevlîhevî û valahiyek çêdibe. Qers jî, di nav sînorên qiraliyeta Qeorgîya--Gurcistan- de dimîne.

Di sedsaliya 7'î de Erebên misilman êrîş tînin ser vê herêmê. Di sedsaliya 11'an de Tirkmen û di sedsaliya 13'an de jî, Moxolî ev herêmê îstila û talan dikin. Di sedsaliya 16'an de Qers, ji hêla Osmaniyan ve tê dagîr (îşgal) kirin. Ev ba-

www.arsivakurdi.org

jar paşî dikeve destê Rusiyan. Bajarê Qersê ta 1921'î gelek caran dest diguherîne, ji vê salî de ta niha, Qers di nav sînorên Tirkiyê de ye. Lê ji destpêkê ta niha, tiştek heye ku qet neguheriye, pirraniya runiştvanê (nifus) Qersê tim Kurd bûne. Bermayên kevin ên pêşiya îslamiyetê gelek hindik mane. Ji lewre Qers pirr caran hatiye îstila û talan kirin.

Keleha Qersê: Li bakurê bajêr li ser gireke bilind hatiye ava kirin. Dîroka avakirina vê kelehê bi vebirî (qetî) ne diyare. Di kelehê de 220 birc û sê derî hene.

Dêra Hewariyan: Di sedsaliya 10'î de hatiye avakirin. Dîwarên wî yên derve bi awayekî dewlemend hatiye xemilinandin. Ev dêr hêjayê dîtinê ye.

Mizgefta Yusuf Paşa Di sala 1664'an de hatiye avakirin. Berê minareya vê mizgeftê ji darê bûye, paşî ji nû ve û ji kevirê hatiye çêkirin. Bajarê Qersê bixwe jî, li ser girikek û xaniyên tê de jî, ji kevirên seqî hatine ava kirin.

Dêra Honeçê: Di sedsala 11'an de ji hêla Gurciyan ve hatiye ava kirin. Bi tenê qubeke vê dêrê heye. Ev dêr, niha xirbe ye.

Dêra Şîrlî: Ev dêr jî, di sedsala 13'an de. Ji hêla Tîgran ve û bi mîmariya Gurciyan hatiye ava kirin.

Dêra Kesmerkan: Di 922'an de ji aliyê Ermeniyan ve hatiye ava kirin. Dêr niha xirbe ye, lê dîwarên wê hîna li ser xwe ye. Li ser dîwarên dêrê motîfên mirovên kevin cih digirin.

Katedral: Ji hêla Sembatê diwemîn û Gagîkê yekemîn ve di 987-1010 î de hatiye ava kirin. Ev Katedral di 1319' an de ji aliyê mîmar Terdat ve hatiye nûjen kirin û pêlek jî, ev katedral wek mizgeftê hatiye bikaranîn.

Qesra Senato: Di sedsala 10'î de ji aliyê Gagîke yekemîn ve ji bo kar û barên meclisê hatiye ava kirin.

Kervansaray: Mêjuya (tarîx) çêkirina wê nayê zanîn, lê dîwarên wê yên derve bi motîfên rangîn hatine xemilandin.

Dêra Kevokî: Li nêzîkê navçeya Arpaçayê ye. Ev dêr di sedsala 12-13'an de hatiye ava kirin.

Perestgeha Rojê: Li nav gola Çildirê û li ser girava Akçakale hatiye ava kirin. Di vê Perestgehê de gellek bermayên kevnare hene. Çanda Ariya, li vî perestgehê berhev bûye. Ev perestgeh hêjayê dîtinê ye.

Gola Kraderê: Ev gol li zozanê Karveren û li başûrê rojavayê navçeya Ardexanê ye. Di golê de gellek çûk û masiyên cûrbecûr dijîn. Li dorhêla golê daristaneke pirr geş ku ji darên mazî, çam, gurgen û narewan (kayın) pêk tên heye.

Li Qaxizmanê li ser zinarekî mezin wêneyên pezkûvî û bizin ku 12 hezar sal Berî Zayînê hatiye neqişkirin, hatiye dîtin. Li Qaxizmanê kelehek û çend germav hene.



Heft navçeyên Qersê hene: Digor, Gole, Selim, Sarîqamîş, Qaxizman, Arpaçay û Çildir.

Sarîqamîş: Ev navçeya me tev daristan e. Li vir bi navê başkale kelehek heye. Ji bo sporên zivistanê ev navçe, navçeyek bijhare ye. Li vir gellek navgînên sporê yên zivistanî hene. Bajarê Qersê, ji aliyê folklorê ve jî, gellek dewlemend e. Leystikên Qersê, bi timî taybetiyên Aryayî werdigirin.

Piştî raperîna Tebaxê ya 84 î gerîlayên leheng li Qersê jî, têkoşîna serxwebûn û azadiyê bilind kirin. Niha gelê Qersê bi gerîlayên xwe re, bi şêweyeke xurt û tûnd li doza xwe xwedî derdikevin, berxwe didin û di nav serîhildanên mezin de ne. Têkoşîna rizgariya neteweyî, her diçe li vê deverê Kurdistanê berfireh û xurt dibe.

www.arsivakurdi.org

KURTEJÎNENÎGERIYA ŞEHÎDÊ NEMIR A APÊ MUSA (1918 - ...)

Apê Musa di sala 1918'an de li Nisêbînê, nihiya Stêlî, li gundê Zivingê hate dinê. Di wê demê de li gundê Zivingê û Stêlî dibistan tunebû, ji ber vê yekê Apê Musa li Kercewê di sala 1927'an de diçe dibistana destpêkê. Xwendina xwe ya destpêkê li bajarê Mêrdînê didomîne û diqedîne. Li bajarê Edenê diçe dibistana navîn, paşî dîsa li vî bajêr diçe xwendegeha lîseyê.



Lê di wan salên ku ew li Edenê dixwîne, li Kurdistanê gellek bûyerên girîng dertên. Di wan rojan de Apê Musa hîna xort û zahf ciwan e, lê dîsa li ser van bûyeran radiweste û wan dinirxîne. Serîhildana Dersîmê, li ser Apê Musa bandorê xwe yê mezin dihêle. Bi baldariyeke gellek mezin Apê Musa vê serîhildanê dişopîne. Bi dilekî germ di nav hevalên xwe de bangêşiya (propoganda) vê serîhildanê dike. Ev helwesta (tavır) Apê Musa bala birêvebirina (îdare) xwendegehê û hêzên deweletê yên li Edenê dikişîne. Ew digirin davêjin hundir. Piştî panzdeh rojan tê berdan. Bîr û baweriya neteweyî di Apê Musa de xurt dibe.

Apê Musa, hîna di lîseyê de filozofên wek Comte, Rousseau, Bergson, Feurbach nas dike, li ser bîr û nêrîna wan li gorî mercên xwe lêkolîn dike. Romanên Victor Hugo, Puşkîn û Gorkî dixwîne. Zanîn û lêgerîn, ji bo Apê Musa dibe mereqeke mezin.

Di sala 1941' î de, li Stanbol di zanîngeha Stanbol de, dest bi hînkariya felsefeyê dike. Li vir gellek xortên welatparêz yên Kurdîstanî di-

www.arsivekurdi.org

nase. Bi van xortan re li ser bingeheke welatparêzî têkiliyeke xurt datîne. Apê Musa li ser daxwaza hevalên xwe, dev ji beşê felsefeyê berdide û li beşê dadmendiyê xwendina xwe didomîne.

Apê Musa di sala 1944'an de bi dota Abdurrahmanê Zapsu Ayşe xatûn re dizewice. Di 1950'î de ew, êdî xwediyê sê zarokan e: Anter, Reşê û Dicle.

Apê Musa li Stanbol ji aliyek ve hînkariya xwe ya dadmendiyê didomîne û ji aliyek din ve jî, xwendekarên Kurdistanê li dora xwe berhev dike. Ew li Stanbolê ji bo xwendekaran êwirgehek (yurt) vedike. Di hem demî de bingeha rêxistineke (Komela rizgarkirina Kurdan) veşartî davêje. Komele dest bi xebatê dike û bi navê jêdera Dicle (1948) rojnameyeke hefteyî derdixe.

Ji bilî vê rojnameyê, Apê Musa, di hin rojname û kovarên din de nivîskarî dike. Di weşandina kovar û rojnameyên wek "şark postası", "İleri Yurt", "Deng", "Barış Dünyası" û hwd. roleke mezin dilîze.

Apê Musa, di 17 î Kanûna 1959'an de, bi 49 rewşenbîrên Kurd ve tête girtin. Ew 80 roj, di hucreyên mirinê de dimînın. Li Tirkiyê, di sala 1960 î de, efuya giştî derket, girtî tev hatin berdan, lê Apê Musa, tevî 49 hevalên xwe, ta 1962'an di zindanê de man.

Apê Musa, di 1962'an de ji zindanê derket, lê di navbera 1964 û 1970'an de gellek caran hat girtin û berdan. Apê Musa, sala 1970 î dîsa hat girtin û 3 sal di zindanên Kemalîstan de raza.

Apê Musa, di navbera salên 1974 û 1986'an de li gundê xwe jiyaneke xwer û bê deng diborîne. Ew piştî îlona 1980 î ji bo demeke kin ji hela cunta faşist ve tê girtin, gellek tadayî û şikence dibîne, lê di dawî de tê berdan. Dema şerê çekdarî yê rizgariya neteweyî ya gelê Kurdistanê (1984) destpêdike, dilê Apê Musa pê re lê dide. Dilê wî, bi vê berxwedana bi rûmet gellek xweş e û pê serbilind e, lê hîna dûdil e û mejiyê wî ne zelal e. Ji ber ku ew di jiyana xwe de, gellek serîhildan û berxwedanaên neteweyî dîti bû, lê yek ji wan jî, bi ser neketi bû, tev têkçûbûn.

Lê serîhildana çekdarî ya 1984 î,ne wek ên din bû. Ev serîhildan, vê rastiyê di demeke kin de ispat kir. Ev serîhildan roj-biroj xurt dibû û li her aliyê Kurdistanê belav dibû. Ev serîhildan, gelê Kurdistanê rakir ser piyan û li dora xwe berhev kir. Ev serîhildan, mejiyê gellek rewşenbîran zelal kir, hêz da wan û ji wan re riya serfiraziyê vekir.

Apê Musa, di van mercan de vê domanê (süreç) dinirxîne (hêzandin) û dest davêje çekê xwe derdikeve qada şerê. Çekê wî penûsa wî ye. Apê Musa dîsa pênûsa xwe û mejiyê xwe ji bo mirovahiyê, ji bo azadî û rizgariya gelê Kurd xebitand. Apê Musa, ji aliyek ve ji rojnameya Yeni Ülke, Welat û Özgür Gündem re gotaran dinivîsiya, ji aliyek ve jî, serokatiya Enstîtuya Kurdî ya li Stenbol dikir. Ew di hem demê de damezirenêrê Weqfa Kurdî bû.

Apê Musa, bi penûs û mejiyê xwe û bi têkoşina xwe ve, ji bo rewşenbîrên Kurd, wek mînakek bû. Ew di riya serxwebûn û azadiyê de, rêwiyeke serfiraz û bê tirs bû. Ew di şerê ronahîkirinê de têkoşîreke w - rek û leheng bû. Ew bi van taybetiyên xwe ve bala dijminê gelê Kurd -dewleta Tirk- kişand. Dewleta Tirk, ji bo ku çavên rewşenbîrên Kurd ên welatparêz bitirsîne, ew da kuştin.

Apê Musa, bi bîr û baweriyeke xurt, bi têkoşîna rizgariya neteweyî ya gelê Kurdistanê ve giradayî bû. Ew, çiqas alîgirê serxwebûn û azadiyê bû, werqas jî, dijî otonomî û kevneperestiyê bû.

Berhemên Apê Musa, yên ku hatine weşandin ev in: Birîna Reş (tiyatro li zindanê di sala 1959'an de hatiye nivîsandin û di 1965'an de hat çap kirin.) Ferhenga Kurdî-Tirkî, Kimil, Xatiratên min û Vaqayînname.

Apê Musa, li Amedê di 18'ê Îlona 1992'an de bi şehîdbûna xwe dest bi jiyaneke nû dike.

KA APÊ MIN?

Me ew date, bi dilekî xweş
Tê da kuştin, bi destê zikreş
Dil ciwanbû wek gûleke geş
Bêje **AMED**, ka **Apê** min?

Ew musa bû Musê Kurdî
Gotin digot, bi serbilindî
Ji bo dozê xweşî nedî
Bêje **AMED**, ka **Apê** m.in?

Nivîskarê birîna reş
Bîstê îlon rojek nexweş
Em sewî man Kurdên bextreş
Bêje **AMED**, ka **Apê** min?

Ji dîrokê por sipî bû
Ew gundî û ew torî bû
Nexweşî û zilmî pirr ew dîbû
Bêje **AMED**, ka **Apê** min?

Heta kengî zilm û zorî
Wê kengî bê çerxa dorî
Hêvî dikim **AMED** negrî
Bêje **AMED**, ka **Apê** min?

Gelî Kurdno bes e rabin
Yek bi yek em wenda dibin
Çekê Musa em bilind kin
Bêje **AMED**, ka **Apê** min?

Kanî Musa ka canê min
Ka dilovanê **Apê** min
Kanî xalo, ka kalê min
Bêje **AMED**, ka **Apê** min?

Mehmet İMİŞÇİ

www.kurdishstudies.org

ADIYÊ TIM BEŞ

Çîrokbêj: Husê M. Omerîkî
Berhevkar: M. Xelîl

Hebû Tunebû, li welatê bav û kalan, di demeke pirr dûr de, ji malbata Adiyan, pêxemberek hebû. Jê re digotin, Adiyê tim beş.

Ew her roj, berî roj hilata, derdiket nav gelê xwe, kol bi kol, kuçe bi kuçe, cade bi cade digerî û gel ji xew şiyar dikir, bi dengê xwe yî nerm û nazik dilorand û bang dikir:

Xêr kunî ji bo xwe kunî
Şer kunî ji bo xwe kunî
De rabin me teva kar kunî
me teva kar kunî

Rojekê ji rojên Xwedê, ew di ber qesr û qonaxa key (qral) re derbas dibe. Key bi dengê wî yê xweş ji xew radibe. Dengê Adî, lê gellek xweş tê. Ferman dide ku Adê bînin dîvana wî.

Adê digirin û tînin dîwana qral. Key, li Adiyê tim beş dinêre û jê pirs dike:

–Çima tu mirovan ji xewa sibê radikî?

Adê weha bersîva wî dide:

Armanca min ev e, ez dixwazim ku gel ji xew rabe, herkes rabe ji bo karê xwe. Ji karê derdikeve kar û karê bê kar, ne tu kar e.

Qral pirseke din jê dike.

–Piştî ji xewrabûna wan tu çdikî?

–Ez rêberî û rênasiya gel dikim, nan û xwarina xwe jî, ji karê dartraşiyê (xeratî) derdixim. Her roj nanek têra min dike.

Paşî qral jê re dibêje:

–Her roj riya xwe bi aliyê mala me ve bixe, bila dengê te yî zîz were guhê min, ta ku ez pê payî bim (şiyar bim), ji bo vê ez dê her roj du nan û zêrekî bidim te.

Keyê, ew roj du nan û zêrek dide destê wî.

Adiyê Tim Beş, xatirê xwe ji keyî dixwaze û bi rê dikeve. Li aliyê rê, li ser rêsîvê (rêxera) rastê parsevanekî kor tê, zêrê ku ji keyê stendibû û nanekî dide wî korê parseker.

Ev rewşa han mehek dom dike.

Rojekê, parsevanê kor dest davêje cil û kincê Adê û sipasiya xwe jê re diyar dike, gellek pesnê wî dide û jê dipirse ka çi kes e? Adê, çiroka xwe û keyê, jê re qise dike. Paşî ji parsevanê kor re weha dibêje:

–Her xêrek ji bo Xwediyê xwe ye, ew ser heft destan re derbas bibe jî, ew xêr, xêra Xwediyê xwe ye. Anku ev xêr, xêra keyî ye. Ew xêra ku qral dide min, ez para xwe jê digrim û yên ji ber mayî didim te.

Adê Tim Beş, xatirê xwe jê dixwaze û bi riya xwe de diçe.

Parsevanê kor difikire û xwe-bi-xwe dibêje: Beyanî (sibehî) berî Adê ezê di ber qesra keyê re derbas bim û gotinên Adê bêjim. Ezê du nan û zêrekî keyê ji bistînim û li dawiyê para xwe ji Adê jî, weka her caran, bistînim, wê ez îro bibim xwediyê zêr û sê nanan.

Wek pîlanê ku ji xwe re çêdike, korê me, di ber qesr û qonaxa keyê re derbas dibe û dike qîrîn, te digot qey zirîna keran e. Key, ji xewê vediciniqe, ji ber ew dengê nexweş. Key ferman dide ku ew bigrin, bi kutan û lêdanê bînin malê. Di bin lêdanê de, korê me dest bi fêlbaziya xwe dike û dibêje:

–Hûn nan û zêr didine wî kesî bi çav û taqet, ew jî, dibe dide meyxanan û kerxanan. Ji ber ku ez mirovekî belangaz im, bê çav û bê qewet im, para min kotek û lêdan e, dadmendiya keya jî, diyar e ku ev e!

Qral dibêje, "dev jê berdin, bila here û tu caran qîre-qîra wî neyê guhê min."

Weka her carî, Adiyê Tim Beş di wê demê de tê û dest bi gotinê xwe dike.

Xêr kunî, ji bo xwe kunî
Şer kunî, ji bo xwe kunî
De rabin me teva kar kunî...

Lê belê, keyê ferman nivîsîbû û dabû leşkerê ber dergehê qesrê, gotibû ku eger Adê Tim Beş hat, bila ev ferman bigre û here para xwe ji nanpêjxaneyê (firunê) bistîne.

Adê fermana xwe digire û bi rê dikeve. Lê korê me jî, li benda Adê ye. Dema Adê digihîje ciyê korî, jê re dibêje:

–Bibore, îro keyê fermanek daye min, divê ku ez xista (para) xwe ji firunê bistînim. Ger ez ji firunê nan bistînim, ezê nanek bidim te.

Korê parseker, li ber xwe nade gotina Adê dibire û dibêje:

–Fermannameya ku qral daye te, tu ew bide min, ha ji te re nanek, tu zehmet nekişîne, ezê biçime nanpêjxaneyê.

Adê dike û nake nikare xwe jê xelas bike. Korê parseker fermannameyê ji destê wî digire. Bi lez û nîv bez, çiwalê (turê) parsê dide ser milê xwe û ber bi firunê ve diçe. Bi dengekî berz (bilind), dibêje: Rê bidine min, ev fermana keyê ye.

Dema nanpêj, fermana keyê dibîne ew digire maçî dike û datîne

ser serê xwe û dest bi xwendina wê dike.

Di dawiya xwendina fermanê de dest davêje korê parsek û ew dixe hundirî firunê, kor dike qîrîn, lê kes guh nade wî. Laşê wî dibe agir û dişewite.

Key, di fermana xwe de gotibû ku ew kesî vê fermanê bide te, bavêje firunê, maf û sezayê (ceza) wî sotin e.

Dîsan di dew û kata xwe de, roja din Adê Tim Beş, tê ber qesrê û weka her carî dilore û dibêje:

Xêr kunî ji bo xwe kunî
Şer kunî ji bo xwe kunî
De rabin me teva kar kunî...

Key dikeve nêv bîreke (melhezeke) kûr û dirêj. Paşî ferman dide xulaman:

–Zu bînin wî mirovî, çawa fermana min cihê xwe nediye?

Çaxa Adiyê Tim Beş tê dîndara (huzura) wî, key jê dipirse: "Ka ew fermana duh, çi pê hat?"

Te para xwe ji firunê stand? Adê, çîroka xwe û korê parsek jê re hewal dide.

Key pê kêfxweş dibe û bi devekî ken dibêje:

–Lêdan ciyê xwe dît...

Paşî naveroka fermanê ji Adê re eşkere dike û weha dibêje:

–Diyar e ku tu yek ji kesên Xwedayî yî. Ez dixwazim ku tu li ba min bibî keyyar(vezir).

Adê lê vedigerîne û dibêje:

–Ew keyê ku bê pirs, bê lêkolîn, bê sehdar (şahit) biryara xwe bide, ez ji wî keyî re nabim keyyar.

Keyê me, bihna xwe teng dike û destê xwe radike ku lê bide, lê dinêre ku destê wî li banî hişk bû.

Bi poşmanî û bergerî, ji Adê dixwaze ku lê bibore.

Adê destên xwe radike jor û bang li Xwedê dike:

Ey Xwedayê min î li banî
Serî bide, gelê min î nezanî

Bi vê daxwazê re destê key dilebite û dadikeve jêr wek berê. Adê, ji keyê re dibêje:

–Fermana te şaş hate avêtin, lê Xwedê ew rast kir, tu Xwediyê gunehên şaşî yên xwe yî.

Adê ji keyî vediqete û diçe ser karê xwe û heta dawiya temenê (emrê) xwe, jiyaneke xweş diborîne. Key jî, heta gorê, di nêv poşmanî û kesera şaşiya xwe de dimîne.

***

Ev çîrok, di nav gelê me de, bi taybetî jî, di nav Kurdên Ezidî de tête zanîn. Di nav antîke û bermayên Sumerî û Babiliyan de, li ser kevirên ku ji bin axa Mezopotamyayê derketine, tê xuyan ku Adî, navê Xwediyê gemiya lêmişt a mezin, ku di îslamê de navê wî Nuh (silavên Xwedê li ser be) e.

SIYA BER ROJAVA

Rojekê, mirovekî bejnkin, berê xwe da rojava,
li siya xwe mêze kir û di ber xwe de got:
"Xelq çiqas xêrnexwaz û bê wijdan e! Siya min çiqas dirêj e,
ez dibêjim wek bejna min e. Ji bo çi xelk ji min re dibêje:
"dirêjan tû û kinikan jî gû xwar." Ez ê tû yê me.
Mêrik di nêv xeyal û endîşan de bi xwe re mijul dibû û dipeyivî.
Bi ser xwe ve hat û li rojê nêrî ku roj çûye ava.
Li dor xwe nêrî, dît ku siya wî nema.
Ji dûr ve dengek hate guhê wî.
Ew deng digot:
Kino were malê bes e, êdî roj çû, êvar hat.
Vêca divê mirov baş bizane ku tu caran mirov bi siya ber bi rojava ve bejndirêj nabe
û bi vî siya dirêj jî, serî nayê hildan.
Ewê ku siya xwe li aliyê rojhilat, ji xwe dirêjtir bibîne,
bila zanibe, ku nîşana paşhatin û nêzîkbûna rojavaya wî ye.
Wisa dixuyê ku serekwezîrê Tirkiyê S.Demirel jî, bi siya xwe xapiye.
S.Demirel çend roj berê digot ku:
"Siya me Tirkan ji derya Romê dest pê dike ta derya Çînê."
Bes ji bîra wî diçe ku dem ne dema Tirkên wek wî ku li ber rojava ne.
Çiyayên Kurdistanê pirr bilind bûne.
Ew nikarin pişta çiyayên Kurdistanê bibînin.
Agirê
Newrozê
yê Kawayê hemdem
Mezlumê nemir,
li ber deriyên wan
pêt
û
alav
dide.

M. Xelîl



Bahoz û Baran çek li milê wan, bi roj li çiyan digeriyan, gava dibetilîn, ya li binê daran yan jî, li ser kaniyan xwe rehet dikirin û piştre gera xwe dom dikirin, diçûn gund, li gund digeriyan, ji wan re behsa welêt û welatparêziyê dikirin, dîsa ew di berbanga sibê de vedigeriyan cihê xwe.

Karê wan ev bû ku di nava gelê xwe de xebateke baş û rind bikin. Dîsa rojekê Bahoz û Baran derketin ser rê û berê xwe dan gundan. Qederekê çûn, hatin ber gundekî, xwe dan ber warekî, hêlma xwe vedan, lê ew der ji Bahoz re xerîb hat, wî digot, qey riya xwe şaş kirine û got:

-Baran, em ji cihê xwe gelekî dûr ketine û vêderê ji min re xerîb hat.

Baran lê vegerand.

-Rast e, Bahoz, tu hîn nû tê van deran, berî te ez û hin hevalên din gelek caran hatine vir, em bi gundiyan re diaxifîn û gelek caran jî, li vir radizan.

Bahoz:

-Emê îşev li vir bimînin.

-Erê, dema bibe êvar, tarî bikeve erdê, emê herin mala Qasim.

-Qasim kî ye? Heval e, an dost e?

-Dostekî zahf hêja û qenc e.

Bû êvar, tarî kete erdê, Bahoz da pêşiyê, Baran da pê, çekê xwe girtin destê xwe û berê xwe dan mala Qasim û meşiyan, li biniya gund nexweşxanek hebû, lê di nexweşxanê de tu, pijîjk (diktor) an kesekî din tunebû.

Lê dîsa dema ku ew ber nexweşxanê re derbas bûn, bi tedbîr û bi awayekî dizî, lingên xwe hêdî hêdî davêtin, bi vî awayî xwe gihandin mala Qasim, li derî xistin, yê ku derî vekir, Qasim bû.

-Ooo, hûn bi xêr û xweşî hatine, hûn li ser çavê min hatine. Kerem kin, kerem kin.

Derbasî hundir bûn, Qasim dîsa destê wan girt û halê hev pirsîn. Qasim gazî jina xwe kir û got:

-Ji kerema xwe re pariyekî lez bike, niha mêvanên me gellek birçî bûne.

Ew jî, çû çay da ser êgir, piştî xwarinê, çaya xwe jî vexwarin û dest bi sohbeteke germ kirin.

Dema wan sohbeta xwe qedandin, Bahoz navê çend gundiyan da Qasim û got:

-Here bangî wan jî bike, bila ew jî bên, em ji xwe re hinek sohbet bikin.

Qasim jî, wan gundiyan nas dikir. Ew kes ne mirovên xerab bûn, ji ber vê, Qasim hema çû banî wan kir. Piştî qederekê gundî jî hatin, hal û wextên hev pirsîn, li ser kar û barên dinê, li ser zilm û zordariya dijmin, li ser bêkariyê ji xwe re dûr û dirêj qise kirin. Dîna ku dîtin derî deng da, hemû şaş bûn, li hev mêze kirin weke bibêjin ku "gelo kî ye, ji bo çi ye?" Qasim hêdî rabû çû li ber derî sekinî û got:

-Ew kî ye?

-Ez im, kurê min, pîra diya te.

Diya Qasim ji mala kurê xwe yê mezin dihat, dema Qasim derî vekir û diya wî bi çavê xewîn, li hundir mêze kir ku waye çend gundî û di nava gundiyan de jî Bahoz, hema li Bahoz nêrî û got:

-Kurê min tu li ku bûyî, îro çend roj in, çavên min, li riya te bû, tu za-

www.arsivakurd.org

nî ku ez gelekî ji te hez dikim.

Bahoz û diya Qasim ji zûde ve hevdu nas dikirin, her ku Bahoz dihat mala wan, diya Qasim qedr û qîmeteke mezin dida wî. Bahoz, ji cihê xwe rabû, çû bi destê wê girt û ew anî li ba xwe da rûniştandin. Jê re got:

-Belê dayê, ez jî dizanim ku tu ji min hez dikî, ez zûde nehatime, lê weke tu jî dizanî ku karê me gelek e, pêwist e ku em pir xebat bikin ku rojek zûtir welatê xwe ji bin zordariya dijminê xwînmij derxin.

Diya Qasim ew mêvanên xwe yeko yeko di ber çavê xwe de derbas kir, li Baran mêze kir, ew nas nekir, li Bahoz zivirî û got:

-Bahozê min, ev xort kî ye, min ew nas nekir?

-Dayê ew jî hevalekî me ye, ew cara yekem e ku tê vir, lê ji îro pê de êdî hûnê baş hevdu nasbikin.

Dilê wê baş rehet nebû. Wê dîsa li Baran mêze kir û got:

-Niha tu wî baş nas dikî.

Bahoz dîsa bi nermî bersîva wê da:

-Belê dayê, hûn çawa min nas dikin, ez jî wî wisa dinasim.

Bahoz got:

-Dayê, hela tu dev ji vê berde, ji me re behsa meselên berê bike.

Diya Qasim, jineke pîr bû, wê di ciwantiya xwe de şerê Şêx Seîd jî dîtibû, wê baş dîti bû ku ew dijminê xwînxwar çi anîbû serê Kurdan. Ji ber vê jî, wê behsa wî şerê û berxwedana Kurdan dikir. Dema diket nava van meselan, xwe wenda dikir û te digot qey, ew niha di nava şer de ye, wisa digot ku dilê me, ji cih derdiket, kerba wî radibû, kîna wî ya li hemberî leşkerê Romê zêde dibû. Devê wê zuha bû bû, av xwest, ava wê hat, vexwar û axînek kişand û got:

-Lawo, lawo we hîn tiştek nedîtiye, min her tişt bi van çavên xwe dîtiye. Çawa mêr dikuştin, çawa gund dişewitandin, wek filmê sinemayê yekû yek tên ber çavê min, binêrin ezê ji we re behsa tiştekî din bikim.

Yek hebû navê wî Îsivê Temo bû. Piştî têkçûna şerê Şex Seîd, ew bû bû mehkum û bi sêre çiya keti bû. Ew her gav dihat gund, me jî xwarin û vexwerina wî didayê. Rojekê dîsa ew hat mala me, yekî din jî pê re bû, min jê re got: -Îsiv ev kî ye lawo? Wî got nepirse nasekî min e. Dû re bihîstina ku me bihîst ewê ku bi Îsif re bû, zilamê ordiya Romê bû. Dema ku ji cem me diherin, Îsif dide girtin. Leşker li serê çiyê birçî dimînin, nanê wan diqede, Îsif ji wan re dibêje ku eger hûn min tenê bişînine gund, ezê herim ji we re nan bînim. Ger hûn jî, bi min re bên wê demê kes nan nade. Leşker jî, ev pêşniyara Îsif qebûl dikin.

Di vê navberê de diya Qasim hebekî sekinî, li Bahoz mêze kir, weke jê re bibêje ku

-Te fam kir, min ji bo ew xortê bi te re pirsî.

Gundî baş tênegihiştibûn, lê Bahoz baş zanibû ku ew çi dibêje, Bahoz berê xwe da gundiyan û got:

-Diya Qasim însaneke welê ye ku gelek bûyer di serê wê de derbas bûne, ji ber vê jî, gelek tiştan ji tecrûbên xwe dizane, ew dixwaze ku van tecrûban bide me jî.

Piştî şevbihorandinê herkes çû mala xwe, Qasim jî, cihê Bahoz û Baran danî, Bahoz û Baran jî, ji xwe re hebekî axifîn û razan.

Serî sibê, Bahoz û Baran rabûn, cilê xwe li xwe kirin, nêrîn ku vaye Qasim jî rabûye. Ji Qasim re gotin:

-Heval, emê nan bixwin û bi riya xwe de herin.

Qasim got:

-Na çênabe, qet nabe, divê hûn îşev jî, li ba me bin. Siba ne, dusiba herin.

-Na, nabe, em aciz nekin. Ji xwe em du şevan li cihekî namînin.

Piştî hinek minaqeşe, Bahoz û Baran li wir man, derbasî oda rûniştandinê bûn, dîtin ku waye pîreka Qasim zarokê xwe kireye dergûşê û dergûşê dihejîne. Zarok carna digrî, carna disekine, Bahoz mêze kir ku pîreka Qasim him dergûşê dihejîne, him jî, hûrik digrî, Bahoz çû li ba wê rûniştû got:

-Tu çima digrî xuşka min, çi derdê te heye?

Jinikê got:

-Welle lawê min sorik derxistiye, ez ji mirina wî ditirsim, ji ber vê yekê ez digrîm.

Dema jinikê wisa got, hema bi xelasbûna gotina wê re, madê Bahoz hate guherandin, kûr kûr fikirî, ew birayên wî yên ku bi sorikan mirîbûn hatin bîra wî. Sorik nexweşiyeke wisa ye ku divê herkes pê bikeve, kesî ku xwe jê xelas bike tuneye. Hinek di biçûkbûna xwe de derdixin, hinek jî, di mezinbûnê de. Nexweşiya sorikan nexweşiyeke zor û giran e. Gava ku mirov sorik derdixe, canê mirov hemû bi pizikên sor tijî dibe û canê mirov weke êgir sor dibe. Sorik ji ber xwe ve derdikevin û didin der, carna jî didin hundir, dema ku bidin hundir, rewş nebaş dibe, gelek mirov bi vî awayî dimrin.

Qasim jî kete hundir, Bahoz jê rê got:

-Kurê te sorik derxistine, ma li nexweşxana gund pijîşk an kesê ku ji nexweşiyê fam bike tune ye.

-Na, welle niha kes tuneye. Yek jinik hebû ew çûye gundê cîran wê êvarê vegere.

-Sorik nexweşiyeke nebaş e, dixwazî em zarokê te bibin bajêr.

-Na, tu fêde tê de tune, diktor jî, nikarin rehet bikin. Lazim e ku em hefteyek bisekinin, piştre wê çi bibe, ne diyar e, hêvî dikim ku wê baş be.

Evar piştî ku xwarina xwe xwarin, Bahoz ji Qasim re got:

-Hele here nexweşxanê binêr bê hemşîre nehat, ger hatibe, bîne, bila li vî zarokî binêre.

Qasim got:

-Nabe, hûn li vir in, ez sibê herim wê bînim.

-Tiştek nabe, gava ku ew hat, bêje ev mêvnên min in, ji bajêr hatine.

Qasim ji mal derket û çû banî hemşîre kir, hemşîre li pêş û Qasim li paş hatin malê, Bahoz û Baran jî,

rabûn destê wê girtin, xêrhatin danê. Hemşîre yekser çû ser lawik, lê mêze kir, destê xwe da eniya wî û vegeriya cîhê xwe. Di wê navberê de Bahoz xwe negirt û got:

-Xûşka min, gelo ji vê re çareyek heye? Gelo tu derziyek lê bixî wê baş nebe.

-Na, çênabe, wî sorik derxistine derve, loma jî, nabe ku ez derziyê lê xim, êşbirrînê bidimê.

Navê hemşîre Meral bû, ew ji Kurdên Konyayê bû. Meral keçeke delal û gelekî baş bû, nava wê zirav, porê wê dirêj bû, nerm û hûrik hûrik diaxifî û qet şerm nedikir. Meral, Qasim, Bahoz û Baran heta paşiya şevê bi hev re axifîn. Behsa hemû çem û kaniyan û behsa hemû tiştan kirin, Bahoz ji axiftina Meral derxist ku ew jî, miroveke pêşverû û şoreşger e.

Meral behsa karbidestên (memur) ku tayîna wan derdikeve Kurdistanê , lê ew naxwazin werin, dikir. Lê ew digot li vir gellekî kêfxweş bûye, ew digot qet nebe, dê ji gelê xwe re pariyekî xizmet bike. Axaftina xwe weha girêda: "Masî bê av najî, em jî bêyî gelê xwe nikarin bijîn."

Bahoz û Baran wê şevê jî li vir razan, serê sibê rabûn û gotin:

-Havalê Qasim, pèwîst e em êdî herin. Karê me yî din jî heye, divê em wan biqedînin.

-Ser serê min û ser çavê min, gelo hûn dê kengî bên, ger hûn çûn û hatina xwe ya li vir bidomînin wê gelek baş be.

Ezê hefteyeke din bêm û pirsa xwarziyê xwe bikim.

Xatir ji hev xwestin û ketin rê, riya wan di ber nexweşxanê de derbas dibû. Dema ku wan bala xwe dayê ku waye Meral di hundir de rûniştiye û pirtûkekê dixwîne, lê wan nedixwest ku Meral wan bibîne. Lê Meralê ew dîtin û şibakê (pencere) vekir û bi dengekî nerm bangî wan kir.

-Hêvalên hêja, hay ji xwe hebin, xwe baş pibarêzin, bila tiştek bi we nebe, hêviya me hûn in.

Bahoz xwe nêzikê şibakê kir û got:

-Xûşka delal pirr spas, tu her bijî, heta ev çek li milê me be, kes nikare nêzî me bibe. Tu jî hay ji xwe hebe, tu ji me bêtir lazim î. Em carna serî li te jî xin.

Wan xwe dabûn zinarekî da ku heta bibe êvar û bi riya xwe de herin. Baran nêrî ku waye gundî bêr û tevrên xwe girtine û ber bi tirban (gor) ve diherin.

-Gelo kurê Qasim nebe?

Dengê gazî, qêrîn û girînê ji nava gund dihat. Dema Bahoz baş guhdarî kir ku ew deng ji alî mala Qasim ve tê, wî gelek meraq kir û ji hevalê xwe re got.

-Ez wer bawer im ku lawê Qasim miriye, divê ez jî herim.

Hevalê wî got:

-Gelek çek bi me re hene, emê çawa herin wir?

Qederekî din man, nerîn ku waye Meralê rahişt termekî xist nava paçekî spî, wê û gundiyan berê xwe dan goristanê. Bahoz û hevalên xwe jî ketin rê ber bi goristanê ve çûn, dema xwe gihandin wir silav dan, fatihek jî xwendin. Piştî ku lawik defin kirin, Bahoz rabû ser xwe, hilkişiya cihekî bilind û ji gundiyan re got:

-Min bibexşînin, ez dixwazim çend gotinan ji we re bêjim. Hûn hemû dizanin ku rewşa îroyîn ya Tirkiyê û Kurdistanê di çi halî de ye, zordestiya cunta faşist li ser karker û gundiyan bi awayekî bê hempa dom dike. Li alîkî birçîbûn, li alîkî lêdan û îşkence hêj dom dike. Li girtîgehan girtiyên me serî hildidin. Di demeke kurt de wê cunta faşist here, rojekê wê bê , gelê me jî wê bigihîje azadiye xwe. Eger em Kurdistaneke azad û serbixwe nebînin jî, divê zarok an torinên me bibînin. Ji bo vê jî, divê em xebatê bikin.

Bahoz bi dûr û dirêj behsa her tiştî ji wan re kir, dû re çû ba Qasim, destê wî girt û got:

-Bila serê miletê me sax be!

Çekê xwe girtin û berê xwe dan çiyan.

Gerra Di Xewnê de

Ez bibim berf li Avromanê
Ji ewrekî bibarim
Lê bireşim hurik hurik
Li ser çemê Mêrîbanê

Li buharê baranê bim
Tevî çemê Elwendê bim
Xezal vexwin ji ava min
Honakiya serdeştê bim

Ez bim gola Zerîbarê
Koçer ji konan vegerin
Şalûl û bilbil bifirin
Pervaz bikin li jorî min

Li Rewandûzê çîrokek bim
Ji çîrokên şevên dirêj
Ez Babil û Kurdîvan bim
Min bibêjin ji zarokan re
Çîrokvan û hemû dengbêj

Werime deşta Surucê
Rojekê ez bi mêvanî
Binêr zîncîrên dora xwe
Bêjim baxçên gulan kanîn

Dakevim nav Bîracîkê
Ez bigerim bax û banî
Bêjim Ferat çi dimeşî
Hêstirên çavê Kurdistanê

Salihê HESEN

www.anakurdi.org

"ZAZALAR" KÜRTTÜR!

Abdurrahman ALÎ

Kadim Kürtçe'nin en bozulmamış, eski biçimini en çok korumuş lehçesi olan Dimilî lehçesi konusunda, "bilim" anlayışları neredeyse Türk Milli İstihbarat Teşkilatı'nın politikasıyla aynı olan kimi yazarlarca, yükselen Kürt özgürlük hareketini parçalamak ve zayıflatmak amacında olan temelsiz spekülasyonların yapıldığına ve yapılmakta olduğuna hepimiz tanık oluyoruz. Gerçekte, bir bilim adamı değil, sıradan bir algılayıcı bile, eğer biraz sentez gücüne sahipse, bu tür spekülasyonların saçmalığını ve neyi amaçladığını anlayabilir. Ancak, az da olsa, kimilerinin bu tür dayanaksız iddialar karşısında bilinçleri bulanabilir. Bu nedenle konunun üzerinde eleştirel bir yaklaşımla yeniden duran ve H. Şelıc adlı MIT albayının "Zaza Gerçeği" adlı kitabının eleştirisini yapma gereği duyan Abdurrahman Ali'nin henüz yayınlanmamış kitapçığından bir bölüm aktarıyoruz.

REWŞEN

(...)

H. Şelıc, kitabının "Dil Bakımından Zazalar" adlı bölümünde; Kürt aydınlarının "Zazalar"ı Kürtler içinde asimile etme politikası güttüklerini, bu politika gereği "Zazalar"ı Kürt, "Zazaca"yı da Kürtçenin bir lehçesi olarak kabul ettiklerini ve bunun doğru olmadığını vb. iddia etmekte ve "Zazaca"nın Kurmancî'den farklı bir dil olduğunu ekleyerek, bu iddialarını birçok Türk ve yabancı yazarın konuya ilişkin kitaplarından alıntılarıyla desteklemeye çalışmaktadır.

H. Şelıc, demagoji yapmaktadır. Öncelikle belirtelim ki, hiçbir Kürt aydınının "Zazalar"ı Kürtlerin içinde asimile etme gibi bir düşüncesi olamaz. Çünkü, Kürt aydınlarına göre "Zazalar" zaten Kürttür. Kürdün Kürdü asimile etmesi diye bir saçmalıktan da bahsedilemez. Yeniden belirtelim. H, Şelıc'ın iddiasının aksine, Kürtler yalnızca Kurmancî lehçesini konuşanlar değildir, Kürtçe de yalnızca Kurmancî lehçesi değildir. (H. Şelıc, yalnızca Kurmancî konuşanların Kürt olduğunu, Kürtçe'nin de yalnızca Kurmancî olduğunu iddia etmektedir.) Kürt adı, Kurmancî, Soranî, Dimilî vb. birkaç lehçeyi konuşan bir toplumun genel adıdır. Kürtçe ise, bu grupların tümüne verilen genel bir addır. Bu grupların dilleri tek tek incelendiğinde, bu lehçelerin tek bir ana dilden geldikleri sonucuna varıldığı için de, bu lehçelerin tümüne birden Kürtçe adı verilmiştir. Bu, bilimsel verilerle ispatlanmış bir durumdur. Sanıldığı gibi, hiç kimse, "Zazaca"nın Kurmancî'nin bir lehçesi olduğunu iddia etmemiştir. Biz ve bilimsel düşünme yöntemine sahip tüm Kürt aydınları, "Zazakî"nin, yani Dimilî'nin ve Kurmancî'nin, Kürtçe'nin bir lehçesi olduğunu iddia ediyoruz ve doğru, bilimsel olan da budur. H. Şelıc'ın bu konuda ileri sürdükleri, Kürt aydınlarını karalamaktan öte anlamlar taşımaktadır. H. Şelıc'ın bu yazdıkları, Kürtler üzerinde 1940'lardan sonra uygulamaya konulan "beyaz katliam"ın bir parçasıdır.

Gerçek şu ki, "Zazalar", kendilerine hiç bir zaman "Zaza" dememişlerdir. Aksine, Zaza adını ilkellik anlamında ve hakaret olarak kabul etmişlerdir. Kaldı ki, gerçek de böyledir. "Zazalar", kendilerine "Kird"(Diyarbakır çevresi) ya da "Kirman" (Dersim çevresi), dillerine de Dimilî (Diyarbakır çevresi) ya da Kirmancî (Dersim çevresi) demişlerdir ve demektedirler. Bu Kürt toplulukları, Kurmancî lehçesini konuşanlarla olan farklarını belirtmek için de bunlar için Kirdasî adlandırmasını kullanmaktadırlar. Dersim'de "Zazaca" konuşan bir Kürde milliyetini sorduğunuzda, "Ez Kirmanc ne", daha güneyde ise "Ez Kird a" cevabını alırsınız. Geçmişte de böyle denmiştir. Bu gerçeği H. Şelıc gibileri değiştiremez.

Kurmancî'nin ve "Zazaca"nın bir dilin iki ayrı lehçesi olmayıp ayrı ayrı diller olduğu, dolayısıyla bu iki lehçeyi konuşan grupların birbirlerinin dillerinden anlamadığı tezi de gerçeği yansıtmıyor. Bu tezin gerçekdışılığının en iyi kanıtı da bu satırların yazarıdır. Bu satırların yazarı ancak gençlik çağında Kurmancî ile karşılaşmıştır ve hiç bir zaman da Kurmancî konuşmaları anlama konusunda güçlük çekmemiştir. Kurmancî ile Dimilî arasındaki farklılıklar da dil farklılıkları olmayıp, telaffuz ve ifade farklılıkları ile coğrafi bölünmüşlüğün neden olduğu farklılıklardır. Bu iki lehçe üzerinde dilbilgisi kuralları ve kelimelerin etimolojik yapıları bakımından bir inceleme yapıldığında, bunların birbirinden farklı diller olmadığı, iki lehçenin de temel dilbilgisi kuralları ve kelimelerin kökeni itibarıyla birbirinin aynı olduğu, temel bir dilin (Kürtçenin) değişik lehçeleri olduğu kolayca anlaşılır. Bunun en iyi ispatı da, aşağıda H. Şelıc'in iki lehçe arasında farklılıklar olarak iddia ettiği örneklerin

eleştirisinde görülecektir.

ZAZACA, KÜRTÇEDİR

H. Şelıc, kitabının "Zazacayı Kürtçeden Ayıran Özellikler" başlıklı kışmında; yine aynı hatayı işlemekte ve Kürtçeyi sadece Kurmancî kabul ederek, sözde "Zazaca"yı Kurmancî'den ayıran özellikleri gösterir(!) örnekler sunmaktadır. H. Şelıc, bu konudaki bilimdışı yöntemi ve yaklaşımı ile de "Zazalık" konusundaki samimiyetsizliğini sergiliyor. Gerçekten de, eğer samimi olsaydı, karşılaştırmayı yalnızca iki lehçe arasında değil, Kürt dilinin diğer lehçeleri arasında da yapardı. Eğer mukayese yolu ile "Zazaca" ile Kürtçe arasında bir ayrılık ortaya konacaksa, "Zazaca" ile bu lehçeler arasındaki ayrılıkların da ortaya konması gerekirdi. Zira, Kürtçe, sadece Kurmancî değildir.

Bilindiği gibi Kürdistan bölünmüş bir ülkedir. Kürdistan'ı bölen ve Kürt halkını zorla yöneten yerel gerici devletlerin şiddet, baskı va asimilasyona dayalı politikaları nedeniyla, Kurt dili ve kültürünün gelişip güçlenmesi sürekli engellenmiş, bu konuda derli toplu araştırmalar yapılmasına izin verilmemiştir. Üzülerek belirtelim ki, bu nedenle bugüne kadar henüz tam olarak Kürt dili incelenememiş, bu dilin dilbilgisi kuralları tam olarak ortaya konmamıştır. Keza bu dilin tüm lehçelerini kapsar şekilda bir sözlük de yazılmamıştır. Etimolojik sözlüğü yazılmamıştır. Bu konularda yapılan çalışmaların hemen hemen tümü, Kürt aydınlarının tek tek kendi çabaları ile ortaya koyduğu çalışmalardır. Kişilerin tek başlarına ortaya koyduğu çalışmaların da her zaman eksik ve hatalı olabileceği bir gerçektir. Kürtçenin tüm lehçelerini kapsar bir sözlüğün çıkarılması, dilbilgisi kurallarının ortaya çıkarılması, kelimelerin etimolojik kökenlerinin çıkarılması da tek tek kişilerin başarabileceği bir iş değildir. Bu, resmi akademik bir kurul ya da topluluğun işidir.

Navê Yarê

Rêzan DILOCAN

Siba te bixêr lê lê yarê,
Kiras ji kesk-sora biharê.
Te agir berda dilê min,
Weke Newroza Adarê.

Porê te zer, çavên belek,
Biruyên qelem, biskên xelek,
Te ji min cûda kir felek,
Nava dilê'm anî xwarê.

Bê te nabe ey hevalê,
Dîlbera rind û delalê
Paqij wek ava zelalê,
Dizê ji kanî û rûbarê.

Yara'm gulê gula bibîn,
Pel, kesk û sor û zer û şîn,
Wê av didim herdem bi xwîn,
Sibê û nîvroj û êvarê.

Bi hesreta bejna zirav,
Dixwazim bibînim her gav,
Dilê'm qut bû ji nan û av,
Pelê min weşya ji darê.

Çiqas bêjim yar şîrîn e,
Eşq û şahî û evîn e,
Ez bûme Mem, ew jî Zîn e,
Ziman şêrîn hingiv zarê.

Yar ketye destê neyara,
Dijî li nav mişk û mara,
Pê şa dibin bi hezara,
Her yekî wek gurê har e,

Gewrê, canê karxezalê,
Mistek av wek bûka salê,
Xwezî ez bimram li balê,
Tirsim nebînim vê carê.

Sing spiyê gerden gaz e
Dilêm ji can te dixwaze,
Kêlîkê wer ba min raze,
Bi destê xwe bibir marê.

Meş ordekê çilkeziyê,
Fistan bi xwêr li paniyê,
Kulîlka serê kaniyê,
Te xwîn û av tevd' vexwarê.

Ji dil û can hezdikim ez,
Dibûhurî bi lez û bez,
Hisreta wê helandim ez,
Birîna min pirr xedarê.

Ew e birîna vî dilî,
Derd berdaye şax û gulî
Bê gulîstan vî bilbilî,
Bi gilî û gazin û hewarê.

Tebat û sebra min nayê,
Bê wê çib'kim ji dinyayê,
Qelen pirr giranbûhayê,
Ziv û zêr bînim bi barê.

Her gav bo wê bi hêvî me,
Ger ew rê be ez rêwî me,
Ew çiya be ez devî me,
Xwe didim bin siya darê.

Nêrgiz, sosin û beybûnê,
Reş û şîn û gewr û cûne,
Dilê'm kokela îtûnê,
Agir û pêtî lê bû harê.

Awirê wan her dû çavan,
Têne min wek tîra kevan,
Dixwazim lê bibim mêvan,
Ger bide min tasek jarê.

Dinale bo te dilê min,
Keserê kûr û kûlê min,
Bûn kanî her dû çavê min,
Hêstrê bi xwîn jê dibarê.

Dipirsin: "Yara te kî ye?
Qîz e bûk e jinebî ye?
Gelo ka navê wê çî ye?
Te dîn kiriye bicarê."

Ez ne dîn û ne bêheş im,
Li dû yara xwe dimeşim,
Xwestyê çavê wêy reş im,
Xelas kim ji destê neyarê.

Reng ji sorgula Gulanê,
Bejnrihan Xec'a Sîpanê,
Navê yaram Kurdistanê,
Bona wê diçim sêdarê.

ÎŞEV ŞEVA BERFÊ YE

Berhevkar: Cemîla CELÎL



Îşev şeva berfê ye, wey, wey, wey, wey, wey li min,
Îro roja berfê ye, wê ça bive halê min.

Govend gerya kelxê ye, wey, wey, wey, wey, wey li min
Govend gerya kelxê ye, wê ça bive halê min.

Ketime destê Zelxê ye, wey, wey, wey, wey, wey li min
Ketime destê Zelxê ye, wê ça bive halê min.

Îşev şeva baran e, wey, wey, wey, wey, wey li min
Îro roja baran e, wê ça bive halê min.

Govend gerya li eywanê, wey, wey, wey, wey, wey li min
Govend gerya li eywanê, wê ça bive halê min.

Ketime destê Xanê, wey, wey, wey, wey, wey li min
Ketime destê Xanê, wê ça bive halê min.

www.arsivakurdi.org

NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN

Rewşen'in son sayısını biraz okudum. Özellikle Melayê Cizîrî' yi konu alan makale dikkatimi çekti.

Mela veya Şeyh Ahmedê Cizîrî Hazretlerinin divanını tercüme etmiş bulunmaktayım.

Melayê Cizîrî ile ilgili derginizde çıkan "Îro Mela Serap e" başlıklı beytin aslı ve tercümesini size gönderiyorum. Aynı zamanda "EM KÎ NE" adlı şiirimi de gönderiyorum. Belki imkan bulsam bu tercümenin basılması için bir hafta içinde inşallah sizleri ziyaret edeceğim ve görüşürüz. Selamlarımla.

EM KÎ NE

Hezretê Nûh li Cudî
Gemî li wê der cî dî,
Nav bi lîsanê Kurdî,
Binivîse ey Rewşen.

Heştan gundê ewwil e,
Heştêbûn ehlê dil e,
Dilê me ji zû de kul e
Bineqşîne ey Rewşen.

Hezretî Îbrahîm'e,
Yanê yê birahîm e,
Pêşî ye ew serê me,
Em serî ne ey Rewşen.

Qral Asûr bû Nemrut,
Yanî digot namirit,
Zeman tê û dimirit,
Ev jî birîn e Rewşen.

Ewwil bajar Nînewa,
Li dinyayî ku ava,
Yanî dorê bi ava,
Kelam bi cî ne Rewşen.

Sumerî ne sê sêr in,
Jê hatî weke şêr in,
Yanî Kurdî bi kêr in,
Zor û çetîn e Rewşen.

Hamo rabî qanunî,
Wî çêkir û zanî,
Berî herkes, zemanî,
Ev lîsanî ey Rewşen.

Dibên Mezopotamya
Yanî Mezra Bota ya
Cihê me bav kala ya
Wek van çendî ne Rewşen

Em ev in pirr bi kok in
Çav reş û çav belek in
Divê em bi ya hevûdû kin
Çare tinîne Rewşen

13.08.92

Mehmet EKMEN / FARQÎN

Sayın Rewşen emekçileri,

Ben 1972 Mardin dargeçit doğumluyum. Şu anda üniversite öğrencisiyim. Rewşen gibi kaliteli bir dergiyi çıkarmanız çok sevindirici bir olay. Böylece, her ulusal değeri bir metaya dönüştürmekten çekinmeyen ihanetçi güruha karşı önemli bir set oluşturdunuz.

Şimdi asıl soruna gelelim. Şimdiye kadar Kürtçe olarak yazdığım yaklaşık 60 şiirim var. Bunları size göndermek istiyorum. Karşılığında ise hiç bir maddi beklentim yok. Eğer onları kitap şeklinde yayınlarsanız, gelirini MKM'ye transfer edebilirsiniz.

Bunun dışında topladığım yaklaşık 120 tane Kürtçe atasözü var. Bir kaç tane halk masalını da yazılı hale getirdim. Bana yol gösterirseniz sevinirim. Çalışmalarınızda başarılar dilerim.

Aziz ÇİÇEK

Merhaba,

Bizler Malatya E Tipi Cezaevinde bulunan ve siyasi davalardan yargılanan devrimci tutsaklarız.

Devletin Kürt ulusunun kültürünü, dilini, gelenek ve göreneklerini yok etmeye çalışmasının karşısında, sizlerin bu kültürü yaşatma, bir ulus nezdinde bütünleştirme ve yayma çalışmalarınızı coşkuyla karşılıyor ve tebrik ediyoruz.

Yaşadığımız süreçte Kürt kültürünü ve dilini öğrenmek bir zorunluluk ve hatta bir yükümlülük oldu. Bu nedenle Kürt dilini öğrenmek istiyoruz. Arkadaşlarımız arasında kürt olanların olmasına karşın, Kürt dilini öğretme yöntemini ve yolunu bilmemeleri ve hatta konuştukları Kürtçenin farklı olması nedeniyle bizlere öğretememekteler. Bu konuda sizlerin bizlere yardımcı olabileceğinizi düşündük. Kürt dilini öğrenmeye yönelik kitap ve kasetlerinizin olduğunu duyduk. Bu imkanlarınızdan bizleri de yararlandırırsanız çok memnun olacağız.

Bu konuda ilginizi bekliyoruz. Çalışmalarınızda üstün başarılar diliyor ve sizleri devrimci duygularımızla selamlıyoruz.

Malatya E Tipi Cezaevinden
Bir Grup Devrimci Tutsak Adına
Serdar DEMİREL

Ez silavên xwe yên germ ji malbata kovara Rewşenê re rêdikim û zor sipasî we dikim, ji bo derxistina hejmara pêncan. Hejmara 5'an a kovara Rewşenê gihîşte min. Kovara we û karê we, ciyê serbilindiyê ye. Kurdên ku li vî welatî dijîn, bi xebata we ya ji bo çanda Kurdî pirr kêfxweş in, em hêvîdar in ku hûn dê vê xebatê bikin û biser kevin. Ez ji we re çend helbestên xwe yên ku ji bo şehîdên nemir hatine nivîdin, dişînim.

Ger hûn biweşînin ez dê kêfxweş

bibim.

M. XELÎL DUBAÎ

Xebatkarên birêz

Ez li Farqîne rûdinim û ji destpêkê ta niha xwendevanekî Rewşenê me. Zaroyên min jî, nivîsarên Rewşenê bi dilşadî dixwînin û pirr şad dibin.

Daxwaza min ji we ev e ku ev helbesta min di Rewşenê de bê weşandin. Bi silavên germîn...

Nîvê Sibatê zivistan har e
Şev gellek tarî, gellek sar e
Gur dikin livîn, ax zare-zar e
Gummînê bombe dîsa hewar e

Dayik û hem bav, hem kal û zarok,
Tev ketin erdê tê berf û teyrok,
Tazî reviyan ji nava çiya,
Van qîzên delal û bukên şermok.

Beden yek pare, sed serî li ser,
Her dem ji gur re maye şevêder
Kaf li hev dixin, dikin ringe-ring,
Meydana gur e laş hişt bê ling.

Van fenê mezin, me kir perîşan,
Ji ber nîfaqê me da gellek can
Kengê yekîtî bikeve Kurdistan
Wê demê welat nabe xana wan.

Nuri AYDIN

Dost û birayên hêja,

Piştî gellek silavan, şadî û xweşiya we ji Yezdanê dixwazim. Çend roj berê, xebatkarên kovara Rewşenê ji Elmanya, hejmara Rewşenê ya şeşemîn ji min re şandin. Ez pê hesiyam ku we li wê derê Enstîtuya Kurdî çê kiriye. Ez ji vê deng û basê pirr bi dilşad bûm û we pîroz dikim û ji Yezdanê Mezin dixwazim ku Enstîtuya Kurdî wê bikare xizmeta ziman û çanda Kurdî bike.

Dostên delal,

Navenda kovara Rewşenê li Elmanya, hemû hejmarên Rewşenê yên beriyê ji min re şandin. Lê hejmarên ku li Stenbolê hatin weşandin, ji wana tenê ya şeşemîn gihîşte destê min. Eger hûn dikarin, hemû hejmarên Rewşenê ji min re bişînin. Ez dixwazim çend kitêbên Kurdî û Farisî ji we re bişînim. Eger ez van kitêban bi navnîşana Stenbolê bişînim, dikare bigîhîje destê we? Yan jî ezê bi navnîşana Elmaniya bişînim?

Birayên delal,

Kurmancînivîsîna min zor baş nîne, ji ber ku ez bi xwe Kurdê Soranî me û Kurmancî û nivîsîna Latînî ji kitêb û kovaran hîn û fêr bûm.

Ez li benda we me ku hûn ji min re hemû hejmarên Rewşenê bişînin. Ez jî, dê ji we re kitebên Kurdî bişînim. Her kitebên Kurdî yan jî Farisî ku hûn dixwazin, ji min re binivîsin ku ez ji we re bişînim.

Her bijîn.

Ehmed ŞERÎFÎ
Ji Rojhilatê Kurdistanê

Birayên delal û qenc,

Silavên şoreşvanî ji we hemûyan re.

Bi vebûna Navenda Çanda Mezopotamiya ez pirr kêfxweş û dilşad bûm, ev bûyer jo bo gelê Kurdistanê tev, buyereke pirr girîng e.

Birayên delal, ez Kurdekî xelkê Kurdistana Rojhilat (a Îranê) im. Ez piştî çend mehan Kurdiya bakûr fêr bûm. Niha, bi silametiya we, ez dikarim Kurdî bixwînim. Min di rojnameya Welatê de navê pirtûka Celîlê Celîl xwend û pirr kêfxweş bûm. Ez ji we dixwazim ku wê pirtûkê bê zehmet ji min re bişînin. Ji kerema xwe re mercê pirtûkê çiqas be ji min re binivîsin, ta ku ez jî bişînim.

Faqîr MAMEDÎ

Ji Dezgeha Rewşenê re,

Ez, endamekî Navenda Çanda Amed im. Ji we re helbesteke xwe dişînim û dixwazim ku ev helbest di kovara Rewşenê de bê weşandin.

Di derbarê helbestê de, ez nêrînên we hêvî dikim.

Ez xortê Kurd im, nexweş im
Ez keç im, keça bextreş im
Bav im, bavekî dilreş im
Ez dayik im, di ser termê şehîdê xwe re dimeşim

Ez gul im, gulnaz im
Kulîlka belengaz im
Govenda bê saz im
Li serê çiya serfiraz im
Ez îro wesiyeta Cegerxwîn ji we Kurda dixwazim

Ez gul im, gula bilbil im
Di nava dilan de bi kul im
Bûka mala bê dil im
Doh bindest bûm îro çek li mil im

Ez bûk im, bûka bê xelat im
Zava me, zavayekî bê dawet im
Kurd im vêca bê welat im
Mazlum im têkoşîna azadiyê bernadim

Ez çemê Hêzil im zelal im
Li Gabarê li Bagokê jiyan im
Li Amedê li Cizîrê serîhildan im
Piştî panzdehê Tebaxê nema dinalim
Ez im, ez im, ez Kurdistan im
Ez im, ez delal im

ROJHILAT

Hêz da ser xwe
Rabû ser piyan
Bi giranî giranî
Weke şêrê dev bi xwîn
Singê xwe vekir
Çû ser dijmin
Ajote kozikê wan
Bi mêranî mêranî
Rojhilatî
Hezkirin
Hevaltî
Gişt ji bo welatî
Ne bindestî
Ne xwinmejî
Gişt ji bo xelkê me
Sal hezar û nehsed û nod û yek
Roj, hîv şehadê me
vegerin tune
Li wê riyê heta mirinê
Sonda qesemê
Her tişt ji bo welatê me.

A. ÇANDDAR

www.arakurd.org

FERHENG

afirandêr : yaratıcı
ajik : yabani badem
ajo : sürücü
alav : alev
alûs : nazik, zarif
arzêl : iğreti ağaç dallarına yapılmış yuva
berketin : üzüntü duymak
bêdad : gaddar, zalim, adaletsiz
bêdawî : sonsuz, ebedi
bêdil : isteksiz, gönülsüz
bêgav : imkansız, çaresiz
bêgef : atılgan
bêkes : öksüz, kimsesiz
bêlîte : oyun türküsü
bêpêjn : sakin, sessiz
bêrikbir : yankesici
carcaran : bazı bazı, arasıra
carû : sıva
catir : kekik otu
celeb : tür, çeşit
cergebez : cümbüş, kadın erkek karışımı halay
cirin : dibek, havan
çekbend : yelek
çekçemêjok : vampir
çeleng : yakışıklı, çevik
çilp : şapırtı
çembil : kulp
çerixîn : çarketmek
dagerîn : dönüş, kivrılma
danasîn : tanıtım, tanıştırma
daweşandin : darbelemek
degme : seyrek, nadir
delew : kova burcu
dengdan : oylama, oylamak
duxistin : geriletmek
engiz : tahrik
erênî : olumlu, pozitif
erjeng : korkunç, berbat
ezeb : ergen, baliğ
ferxî : bir cins kuş üzümü
fewikîn : bir işin elden çıkması
fer : tek, çift olmayan
fêr : öğrenim, etüd etme
fincik : ani sıçrama
firgeh : uçuş yeri
firnik : burun deliği
gadêr : sığırtmaç
gagêre : döven
gagol : mayıs böceği
gerew : rehin; teminat
hej : çırpı
hejale : pejmürde
hejar : sefil, zavallı
herêm : yöre, bölge

www.arsivakurdi.org

FERHENG

hilbijêr : seçmen
hêlm : nefes, soluk
încane : saksı
jeng : küf
jale : gül fidesi
jêza : köken
jimêrker : sayaç
kadiz : saman yolu
kakût : iskelet
kamir : kamış, saz
komav : su birinkitisi
lava : yalvarma
lavlavok : sürekli sürekli yalvaran kimse
lawaz : zayıf, cılız
lebat : hareket
lebatî : hareketli
lebitîn : debelenmek
lec : münakaşa
mazûvan : ev sahibi
nexirî : ailede doğan ilk çocuk
nûber : turfanda
nûn : molekül
niwêner : temsilci
oflaz : mağrur
palepal : sereserpe
peyarê : kaldırım, yaya yolu
qalik : kabuk
qaje-qaj : çığlık, ciyak ciyak
qeb : güreş
qebale : götürü
rabûrî : mazi, geçmiş zaman
raçav : dikiz
rakêşan : çekim
ran : but
raperîn : atılım, hamle
sêkevir : üç taş oyunu
sêlxan : kumsal
sênc : çit, set
sêtêlik : çatal
sifir : bakır
şembelot : kestane
şembelûlk : çemen otu
şeng : neşeli, keyifli, şakrak
tebat : durma, sabır,tahammül
tebatî : pasif
vebijartin : ayıklamak
wesp : elverişlilik
wêl : sürüden ayrılmış hayvan
xalxalok : uğur böceği
xawên : onur, şeref
xwerû : doğrudan, dolayısız
xweser : tek başına, yalnız
xunav : serum
zaxur : taşlık yer
zerengî : kapasite
zîq : inat, direnme

www.arsivakurdi.org



"Li Kurdistanê
pirsa wêjeya şoreşgerî, pirsa şerê şoreşgerî ye"

Hêviya Şoreşa Oktobrê
li Kurdistanê aj (fîlîz) dide

www.sivan.org



Buha: 12.000 TL

www.kitaplarakurdi.org